Arşîva Bîra Kurdan: Ji Christiane More gotara bi serenavê "Lêgerîna kurdan ji bo stratejîyeke nû" (1988) ▶ R. 12

LE MONDE diplomatique kurdî

Îlon 2011 - Hejmar 22 · www.lemonde-kurdi.com · info@lemonde-kurdi.com · 24 Rûpel

Meron Rapoport
"Me li Xezayê operasyonek pêk dianî. Zarokek, ber bi me ve dihat. Min ew da ber guleyan. Dema min qala vê bûyerê ji malbat û hevalên xwe re kir, ew xweşhal bûn; lê wijdana min…"
▶ R. 6

Tony Wood
Gorbaçov wek "*xetaya herî serkevtî ya dîrokê,*" Yeltsîn "*qehremanê leng*" û Medvedev jî wek "*dûblor*" têne bi nav kirin. Ya Pûtîn? Piştî rûxîna sovyetê, dîroka siyasî ya bîst salên dawî.
▶ R. 8

F. X. Devetter - F. Horn
Endonezya, Srî Lanka û Filîpîn di "îxrackirina" qerwaşên ku xizmeta malê dikin de bûne bispor. Gelo ev xizmetkar li welatên ewrûpî çi karên din dikin û çi zehmetîyan dikşînin?
▶ R. 14

Julien Brygo
Leonora Santos Tores, qerwaşeke ku li Hongkongê weke piranîya hevpîşeyên xwe, di odeyeke ji 5 metrekareyan piçûktir de dijî û bi şev û roj ji bo rehetîya patronên xwe, xwe diwestîne…
▶ R. 16

Gérard Mordillat
Nezelalî, ango zelûlî di sînemayê de weke ji dîn derketinê ye. Lê belê gelo mirov dikare piştrast be ku ev helwest ya herî baş e ji bo radestkirina heqîqeta cîhana reel?
▶ R. 21

Vegera dema bihurî

Di navbera tirk û kurdan de bilindbûna şidetê, hewldanên netêr jî, yên ji bo çareserîya pirsa kurdî dixe xeterê

BIRGIT CERHA *

Ew dê ji hîç xîretekê xwe bi paş ve negire ku li Rojhilatê Navîn û derveyî wê jî, alîkarîya bicîkirina "edalet û payebilindîya edaletê… azadî û demokrasî"yê bike. "Eger pêwîst be ku Tirkîye di navbera rejîm û xelkê wê de biryarekê bide, dê biryara wê herdem ji bo gel be." Bi şopandina vê qaîdeyê û berpêşkirina welatê xwe wek "modela demokrasîyê" li dijî tevlîhevîyên dramatîk a herêma êşkêşên jêrdest ên dîktatorîyan, serokwezîrê Tirkîyeyê Erdogan piştgirîya xwe ji tevgera dijraber a Surîyeyê re ji bo "têkoşîna azadîyê" li dijî Beşar el Esedê dîktator dîyar dike. Û bi rêya wezîrê xwe yê derva vê yekê dide zelal kirin: *"Pêwîstîya herêma me bi pêvajoyeke cidî ya reformê heye. Daxwazên mirovên vê herêmê normal, rast û rewa ne. Bicîanîna daxwazên wan dê herêma me ber bi zêdetir îstikrarê, hîn bêtir demokrasî û refahê ve"* bibe.

Şansê Erdogan û ekîba wî heye. Hîn bazîlûsa[bakterîyeke zirav] "bihara erebî" ji sînorên Tirkîyeyê derbasî hundir nebûye. Hîn ne pêwîst e ku serokwezîr bawermendîya van îkazên xwe yên hember kesên din rasterast bixe bin çavdêrîyê. Yanî hîn li pêş bîrûraya giştî, hêzên navnetewî yên hîn dilxwaz in ku "modela tirkan" ji bo Rojhilatê Navîn, îslameke hişmend a ku xwe bi nirxên demokrasîyê ve wêzifedar dike û xwe girêdayî Rojava hîs dike, bawer bikin. Hîn koma gel a etnîk herî mezin li Tirkîyeyê, yanî kurd, mînaka rêhevalên hevêşên xwe ên li Surîye, Lîbya û Misirê yan jî Yemenê negirtîye. Lê dîsa li Tirkîyeyê jî îşaretên bahozê hene. Wisa dixuyê, hêvîya ku Erdogan û partîya wî AKP *"Partîya Edalet û Geşepêdanê"* li ser *"serdema nû ya ahengsaz"* di navbera tirk û kurdan, di nav sînorên Komara Atatürkî de ku ji hebûna kurdan, mafên wan ên şexsî û komelgehî bi cûrbicûr qanûnên dewletî ji sala 1924ê ve heta îro înkar dike, belawela bûye. Hîn jî ev rewş didome.

"Kesên ku azadîya xwe winda kirine, ji ber ku neparastine winda kirine"

"Kesên ku azadîya xwe winda kirine, winda kirine ji ber ku neparastine." Bi van peyvên îkazbar ên Voltaire, parêzger û çalakvanê mafê mirovan Muharem Erbey nameyekê ji girtîgeheke Tirkîyeyê ji hembirayên xwe re dişîne. Ew di sala 2009ê de ji ber sedemên dijderketina binpêkirina mafên mirovan li Tirkîyeyê hatiye girtin; mînakek e ji gelek kesên din ku li dijî zextên dewleta tirk ên hîn jî li dijî kurdan didomin û ew bi zexta-YE (EU), bi reforman xwe demokratîk dike.

Erdogan berîya du salan hêvîyên ku hîç serokwezîrekî berîya wî nedabû da. Wî navê plana xwe danîbû *"vebûna demokratîk"* beramber kurdan, medyaya tirk peyva *"pêngava dîrokî"* bi kar dianî, gava hikumetê yekem car hin azadîyên çandî ji bo gelê bindest berepêş kiribû. Lê dîsa bi carekî ve tengijînên berê bi paş ve vegerîyan, şidetê dest pê kir, îkaz û tehdît, xwîn û kuştin hewaya xudêgiravî ahengsaz jahrî kir. Şidet û dijşidet ji nû ve ber bi jor ve hildikişin. Gerîlayên *"Partîya Karkerên Kurdistan"(PKK)* êrişî leşkerên tirk dikin, artêş baregehên PKKê yên li Bakûrê Îraqê bombebaran dike, li gundan dixe, sivîlan pêwîstî rev û mirinê (hîn di vî warî de piştrastîya serbixwe tuneye) dike. Pêşketin, motîv û sedemên berzebûna xirecirê mirovî şaşwaz dikin. Zelalî ew e ku zimanê şer bi paş ve vegeriyaye. *"Êdî tolerans nabe. Dê bihayê vê yekê ji bo wan (PKK)*

▶ R. 3

Almanya: 4,50 €
Awûstûrya, Belçîka, Fransa, Holanda: 5,00 €
Brîtanya: 4 £, **Danîmarka:** 40 DKK, **Norweç:** 40 NOK,
Swêd: 50 SEK, **Swîsre:** 6,50 CHF, **Tirkiye:** 7 TL

Di bin sîya çekan de li aştîyê gerîn

KURTULUŞ TAYIZ *

Di warê pirsgirêka kurdî de atmosfera nisbî ya aştîyê, ji ber pêla şideta ku piştî hilbijartinan zêde bû, nema. Herçende encamên hilbijartinên 12ê hezîranê derfetek xistibû him destê hikûmetê û him jî muxalefeta kurd ku meseleyê bi rêbazên demokratîk çareser bikin. Bi rêjeya dora 50 dersedî ya dengan hikûmeta AKPyê piranîya siyasî bi dest xist ku bikaribe pirsgirêka herî girîng a Tirkîyeyê an ku pirsa kurd çareser bike. Hevdem, muxalefeta kurd jî, her çend bi dezavantajên qanûnên hilbijartinan re rûbirû ma jî, di encamê de karî 36 wekîlan bişîne meclisê û bi vî awayî jî pesend kir ku ew navnîşana meşrû ya çareserîyê ye. Lê belê, berî ku pirsgirêka kurd li meclisê derfeta nîqaşkirinê bibîne, pêrgî çekan hat. Êrişên PKKyê ku li dû hev hatin, bû sedem ku hikûmet, ku jixwe ji bo çareserîyeke demokratîk lava nedikirin, êrişên dijber pêk bîne. Bombebarana ***Qendîl***ê û amadehîyên hereketeke bejahî bûn sedem ku derfeta çareserkirina pirsgirêka kurd careke din were talox kirin. Niha pirsa ku herkes serê xwe pê diêşîne ev e: *Gelo ev derfeta aştîyê bû qurbana kîjan hesab û mebestan?* Heger rastîyê bibêjim, tu hincet nîne ku wan alîyan, ku çareserîyê di şer de dibînin, biheq derxe. Li vê derê hewldaneke berhewa ye ku bibêjin ka kê şidet bilind kir, yan kî bi zorê bo nav şidetê hat kişandin, ji ber ku hewldaneke weha ji bilî meşrû nîşandana şer pê ve bi kêrî tiştekî nayê. Lê belê sedemên aşkere -nepenî yên li pişt vê tora şidetê ku em ketinê, bên dîyar kirin.

RÊDÎ SEÎD TOPRAK: **Xwezaya pang**, li ser tuwalê teknîka tevlîhev, 100 x 140 cm

Roja 14ê tîrmehê girîng e

Em roja 14ê tîrmehê li vê derê not bikin. Ev roj di dahatûya nêzîk de ji bo Tirkîyeyê dê wekî fetilokeke girîng were nirxandin. Wekî ku tê zanîn roja 14ê tîrmehê li Dîyarbekirê di encama êrişeke PKKyê de 13 leşker hatin kuştin. Di heman rojê de yek ji rêxistinên banî yên siyaseta kurd *Kongreya Civaka Demokratîk* (DTK) bi awayekî yekalî 'xweserî' ragihand.

Van her du bûyeran rê li encamên girîng ên siyasî vekirin:

1. Derfeta pirsgirêka kurd ku di parlamentoyê de were nîqaş kirin, hat paş de avêtin.

2. Dewletê berê xwe da konsepteke ewlekarîyê ku di encamê de di warê pirsgirêka kurd de lêgerînên ji bo çareserîyeke demokratîk hatin hilanîn.

3. Daxuyanîyên serokê PKKyê **Abdullah Ocalan** ku tê de dîyar dikir, li Îmralîyê digel rayedarên dewletê li hev kiriye ku 'Konseya Aştîyê' ava bikin, hatin paşguh kirin, nehat bihîstin.

Lê belê ev encamên ku me li jorê rêz kirin, têrê nakin ku bi giştî dîyar bikin ka Tîrkîye bo nav toreke çawa ya şidetê hat kaş kirin. Amadehîyên şidetê, ku îro li ser dikê cihê xwe girtiye, digihîjin dema berîya hilbijartinan. PKKyê, ku îro asta şidetê her ku diçe bilindtir dike, tê dîtin ku bi ragihandinên agirbest yan bêçalakîyên berfanbara 2008ê, nîsana 2009ê, tebax, îlon û sermaweza 2010ê bi awayekî îstîqrar hewl da ku siyaseteke 'aştîyê' bimeşîne. Her çend car caran pevçûn û mirin rûdabin jî di warê pirsgirêka kurd de ev pêvajo divê wekî 'serdemeke nisbî ya aştîyê' were nirxandin.

Xuya dike ku di nav rêveberên gêrîlayên rêxistinê, ku li çîyayê ***Qendîl***ê bi cih in, heta demeke nêzîk meyla çareserîyeke siyasî serdest bû. Di vê yekê de bandora hevdîtinên nepenî yên digel dewletê hebû, ku 2006ê de dest pê kiribûn û herweha vebûna demokratîk a sala 2009ê, ku encama van hevdîtinan bû. Îro bi daxuyanîyên her du alîyan derdikeve holê ku biryara projeya bi navê ***'Ji Xabûrê vegera malê'*** di hevdîtinên navbera Ocalan û rayedarên dewletê de hatine stendin.

Her sê protokol, dewlet, Ocalan û Qendîl

Sedema wê yekê ku PKKyê heta demeke nêzîk dest neavêtibû çekan, bazara navbera Ocalan û dewletê bû, her çend car caran qut dibû jî. Di vê bazarê de, heta roja ku gulle hatin berdan, nîqaşên li ser protokoleke sê madeyî dihatin meşandin. Raya giştî ji detayên van nîqaşan ji hevpeyvîna **Hasan Cemal** a digel Serokê Desteya Rêveber a KCKyê **Murat Karayılan** agahdar bû. Di hevpeyvînê de, ku di 26ê hezîranê de di rojnameya ***Milliyet***ê de hat weşandin, derbarê protokolan de Karayılan ev agahî dabûn: *Serok Apo, di nav sê mehan de sê protokolên kurt û watedar pêşnîyarî dewletê kirin.*

▶ R. 4

Li neynikan bifikirin

XAVIER MONTHÉARD

Şidet kengî rewa dibe? Ev pirs li nivîskar-rojnamevan **William T. Vollmann**, bisporê başûrêrojava yê Asyayê bû rik. Wî heta ku mimkun bû ew di hevpeyvînên xwe de ji her kesî pirsî. (1) Ev, Vollmann jî mirovekî seyr e. Mirovekî wiha ye ku, gava serekekî *Yakuza* (tevgereke kriminal a Japonyayê) yê nîvtehdîdkar û nîvdesthilatdar **Zenî** bi dilfirehî jê dipirse: *"Hûn di jîyanê de dixwazin çi bikin";* bi mêranî bersivê dide: *"Ez dixwazim mirovekî baş bim. Ez dixwazim qencîyê bikim"*. Her bi vî awayî, *"di şeveke xunavî ku serma wê dev li canê mirovî dike û xeter li vî alî û wî alî weke stirîyên tûj yên liçiyeke lerzok dilewizîn de"* ji bo keçikeke di kerxaneyên taylandî de zindankirî rizgar bike, rîskên mezin digire. Tiştekî wiha bi rastî jî hêja ye. Lê, ji alîyekî din ve, pesinandina xweparastinê digel fikrên ewinde qebe yên weke: *"Dibe ku laşfiroşên bidilê xwe (...) ji pîşeyê xwe hez nekin; divê ji bo piranîya dergevanan, gelaşavêjan û daktîlonivîsan jî wiha be"* tên dîtin, mirov ji xwe re dibêje ku ev zilam belkî hêjayê dîplomayeke birûmetbûnê jî nebe. Ev fikra takekesayetîyê ya nezelal xwe dispêre kîjan sîstema nirxan?

Vollmann pirsê ji kirdar an jî ji qurbanê/a zordarîyan dike (ew bi şideta ku mirov li hemberî xwe bixwe bikar tîne eleqedar nabe, weke xwekujî yan tawanbarîyê) di cudabûna wan bixwe de jî. Ev tişt dibe sedema ku ew (kirdar û qurban) ji mirovên ku qedera wan a danûstandinê ya bêhtir weke mirovên ku hertiştî qebûl dikin bên dîtin.

Wê gavê şaş têgihîştin ango bişaşî yek li şûna yê din bi kar anîn an şaş lihevkirin serdestî şirovekirinê dibe. Ku mirov bixwaze heqê kiyarekê bidiyê, çi bi şîdet û çi bê şîdet, gelo em dikarin bibêjin ku mirov vê şîdetê fam dike? *"Di derheqê zext û zorê de agahdarbûn û dîtina delîlên wê pir hêsan e, weke ku gelek kesên seredana Phnom Penhê kirine qoqên serîyan li ser refan dîtine û heta ji wan tirsiyane, lê ev nayê maneya ku ew di vê zulm û şidetê gihîştine."* Ji bo bikeve navê (psîkolojiya şîdetê), Vollmann jidervebûna biyaniyan (kesên ku hatine serdanê) bi kar tîne. Ev yek destûrê dide ku mirov eynikeke rastiyê biguhere, li her deverê bigerîne û dema nîqaşkirinê bide sekinandin.

Vollmann bi hêzeke mezin Asyaya Başûrê rojhilat bi hemû pirsgirêkên xwe ve rave dike –ya kujerên sondxwarî yan nexwarî, bi totemên xwe yên weke **Pol Pot** û qralê afyonê yê bîrmanî **Khun S**a ve– bi bêşermîya nivîseke ku navbera rastîbêjî û komîk de ye (di derbarê malulên li Kamboçyayê de: *"Ku hemî piyên plastîkî dixwazin; ji ber ku yên darînî pir ava zevîyên birincê hiltînin")*. Vollmann naxwaze bersivan ji pirsên xwe re bibîne *"ji bo mirovekî xwedî mejîyekî fireh, hemû pirs vekirî / bê bersiv dimînin"*. lê ew dixwaze bigihîje kîjan bersivê?

RÊDÎ SEÎD TOPRAK: **Xanîyên xirbe**, li ser tuwalê teknîka tevlîhev, 27 x 43 cm

Lêpirsîna di derbarê şidetê de her wiha di pirtûka hosteyê li xwe mukir hatinê de jî heye ku tê de **Douche**, serekê îşkencekerê ***Kimerên Sor*** dike. Ew portreya cidî û bêhevta, bi rengê belgeyeke dîrokî hatiye nivîsîn; pê re mirovê durist ku dilê wî bi komkujîyan diêşe, wê fêrî pir tiştan jî bibe. Lê belê nivîsa klînîk a rojnamevan **Thierry Cruvellier** (2), bisporê hiqûqa cezayî ya navneteweyî, li ser nezelalbûna Douche disekine. Nivîskar ku rasyonalîstekî mezin e, li paş camên naşikên dadgeha Phnom Penhê bicîhbûyî û li paş perdeya mêjî ve ku wî ji dinyayê diqetîne, dinivîse.

Li alîyekî din jî, di heman herêma erdnîgarîyê de, siyasetmedar **Eric Frécon**, analîzeke ciddî çêkir ku ji ber bikarneanîna giranîya zanistî bûye berhemeke sivik li ser rêbirên Îndonezyayê (3) û wiha dibêje: (*"Silav li te pîreboko, silav li te darayîyo, silav li we jî gîyanên pîroz û hemî şevgêrîyên şevê")*. Gelo çi dibe sedem ku xeyala me ya ewinde rojavayî bi dilê xwe bi nêçîrvanîyên serfirên re tevbigere? *"Ne terorîst, ne gerîla, ne mafyayîyên bazirganîya herêmî bixin bin xeterê, ne gernasê herêmî yê bi hêzeke nexwezayî, rêbirê revok ê peravên giravên hindî (...) gemara globalbûnê ya ku di bin pencereyên wî re diherike radike û diavêje"*. Destûrdayina encameke wiha ber bi dîmenên siyasî ve berfireh dibe, ku balkişandina ser fîgurê bîyanî dikare bi awayekî paradoksî wê bide ji bîr kirin. Gelo, ramanên hinekan li ser jîyana hinên din, di navbera nekûr û kûrahîyê de, birastî berpirsîyarîyan sist nake? Divê em ji Vollmann bipirsin: Ji Odysseysên wiha, gelo mirov baştir vedigerin?

1 William T. Vollmann, Le Roi de l'opium et autres enquêtes en Asie du Sud-Est (Qralê afyonê û lêkolînên din ên li başûrê rojhilat ê Asyayê), Tristram, Auch, 2011, 400 rûpel, 24 euro

2 Thierry Cruvellier, Le Maître des aveux (Hosteyê îtirafan), dê di îlona 2011yê de di nav weşanên Gallimardê (Paris) de derkeve

3 Eric Frécon, Chez les pirates d'Indonésie (Li bal rêbirên Endonezyayî), Fayard, Paris, 2011, 384 rûpel, 20 euro

Wergera ji fransî: Yaqûb Karademîr

JI ÇAPEMENÎYÊ

Îstîfakirina serfermandarên artêşa tirk

Dest ji kar kişandina komî ya serfermandarên artêşa tirk di çapemenîya cîhanê de bi awayekî berfireh deng veda. Di 30ê tîrmehê de kovara hefteyî ya almanî *Der Spiegel* ev îstîfa bi serenavê ***"Artêş li hember Erdoğan teslîm bû"*** ragihand. Di gotara **Jürgen Gottschlich** de her weha tê şirove kirin ku ev îstîfa dê destê serokwezîr Erdoğan hêzdartir bike.

Kovara almanî wekî din nivîsand ku ev bûyerên dawî nîşan didin ku li Tirkîyeyê êdî serdemek bi dawî hatîye û serdemeke nû dest pê kirîye. *Der Spiegel* weha dirêjahî pê da:

"Erdoğan pişta artêşê şikand. Artêşê xwe radestî AKPyê kir. Piştî şeva înê êdî rewşa artêşê wekî sed salên berê nîne. Erdoğan piştî ku cara sêyem hat hilbijartin, hin ji serfermandarên artêşê jî şkandin û bi vî awayî gihîşt asta herî bilind a hêza xwe. Lê belê dê di demên pêş de dîyar bibe ka demokrasî bi ser ketiye yan na."

Kovareke din a almanî *Focus* jî îstafayên serfermandaran bi "Şansê mezin a Erdoğan" ragihand. Kovarê dîyar kir ku êdî derfet ketiye destê Erdoğan ku fermandarên nêzî xwe bîne ser postên bilind.

Rojnameya *Berliner Zeitung* jî sebaret bi îstîfayan dîtinên peyvdarê komîsyona karên derve ya *CDU-CSU* **Philipp Missfelder** ragihand. Missfelder dibêje ji ber ku Erdoğan di têkoşîna xwe ya digel artêşê de bi ser ketîye, lê ev yek nayê wê wateyê ku li Tirkîyeyê demokrasî bi ser ketîye. Lê belê rojname dibêje ev îstîfa di warê pêşxistina demokrasî û endametîya Yekîtîya Ewropî de dikarin bibin derfetek.

Di 5ê tebaxê de kovara *Financial Times* îstîfa wekî *"Erdoğan baskên artêşê qusandin"* şirove kir. Di gotara **David Gardner** de herweha tê îdîa kirin ku ev yek ne dawîya şerê navbera artêş û hikûmetê de ye û artêş dê di warê pirsgirêka kurd û kêşeya Qibrisê de hewlê bide ku bandora xwe li ser hikûmetê bike. Gotar wekî din balê dikişîne ser şirketa OYAKê ku artêşa tirk bi riya wê di çendîn qadên sanayîyê de xwedî bandor e.

Financial Times di dirêjahîya gotarê de dinivîsîne ku bi saya Erdoğan çîna naverast a oldar hêzdar bûye û êdî dikare li hember kemalîzmê li ber xwe bide û herweha rewşa cîhanê jî alîkarîya Erdoğan dike ku piştî şerê sar, duyemîn mezintirîn artêşa NATOyê û berevana Deryaya Spî û Qafqasan girîngîya xwe wenda kiriye.

Di 4ê tebaxê de rojnameya amerîkî *The New York Times* jî îstîfa wekî destpêka serdemeke nû ya li Tirkîyeyê nirxand. Gotar herweha civîna Şûraya Bilind a Leşkerî şirove dike û dibêje ku di civîna dawîyê de Erdoğan bi tena serê xwe serokatîya rûniştinê kir û ev yek nîşaneya serdestîya hikûmeta sivîl nîşan dide.

Di 1ê tebaxê de jî *Ajansa Nûçeyan a Firatê* derbarê îstîfayên serfermandaran de daxuyanîya *Koma Civakên Kurdistanê (KCK)* belav kir. Di daxuyanîye de weha tê gotin: *"Qelsbûna wesayeta leşkerî helbet girîng e û dikare ji bo demokratîkbûnê mercên bingehîn ava bike. Lê belê, zîhnîyeta dîktayê ya sivîl ku şûna wesayeta leşkerî bigire nikare pêşî li demokratîkbûnê veke. Jixwe, bûyerên dawî nîşan didin ku desthilatdarî dest diguherîne... Heger niha artêşa li pêşîya çareserîyê ne astengek be, êdî tu hinceta AKPyê nemaye "ku çima çareserî pêk nayê". AKP divê vîna xwe ya çareserîyê ragihîne raya giştî."* Daxuyanîya KCKê herweha dibêje heger AKP çareserîyê pêk neyne û di şûna Ergenekonê de Ergenekona Kesk bi cih bike, ev yek dê xizmeta pêşxistina demokrasîya Tirkîyeyê neke.

Bombebarana artêşa tirk a li dij Başûrê Kurdistanê

Bazara DYA û Tirkîyeyê li ser Sûrîye û PKKyê

Di 22ê tebaxê de edîtorê *Ajansa Nûçeyan a Kurdistanê* (Aknews) **Rêber Ezîz** gotarek li ser êrişên asmanî yên artêşa tirk weşand. Di gotara bi serenavê "Sûrîye bi PKKê: Bazara tirk û amerîkî" de birêz Ezîz rexne li karbidestên îraqî, him kurd him ereb, digire û dibêje di encama bombebaranan de bi kêmî şeş kesên sivîl hatine kuştin û bi dehan gund hatine wêran kirin û bi sedan gundî jî hatine aware kirin, lê belê karbidestên îraqî bi tenê êriş şermezar kirine û bang li PKK û PJAKê kirine ku ji bo êrişên xwe yên li dij welatên cîran, axa Îraqê bi kar neynin.

Gotara edîtorê AK News weha berdewam dike: *"Hikûmeta herêma Kurdistanê û hikûmeta Îraqê gelek qels in ku li hember êrişên tirkan ên li dij herêma Kurdistanê helwêsteke tund nîşan bidin. Civaka navneteweyî jî li hember van êrişan kerr û lal bûye. Hin kes bawer dikin ku Erdoğan di dema hilbijartinan de soz dabû ku êrişî baregehên îdîakirî yên PKKyê yên li Bakurê Îraqê bike. Ez jî bawer im ku Tirkîye her tim dixwest êrişî Bakurê Îraqê bike, lê belê amerîkîyan nedihişt ev êriş pêk werin. Jixwe, ev êriş bi çend rojan piştî îcazeta amerîkîyan pêk hatin û ev yek parçeyekî bazara amerîkî û tirkan bû: Sûriye bi PKKê ".*

Rêber Ezîz di gotara xwe de herweha dibêje: Dîyar dibû ku Tirkîye hewl dida ku Surîyeyê îqna bike da ku hin reforman pêk bîne, ji ber ku wê nedixwest hevalbendeke xwe ya demdirêj wenda bike, yan na Sûrîyeyê dikaribû derîyên xwe ji serhilderên kurdan re veke. Gotar weha dewam dike: *"Tirkîye li dij mueyyîdeyên amerîkî yên li ser Sûrîyeyê derdiket. Roja 18ê tebaxê, di heman rojê de ku serokê amerîkî* ***Obama****,* ***Beşar Esad*** *bi îşkence û kuştina welatîyên xwe tewanbar kir û jê xwest ku dest ji kar bikişîne, firokeyên şerî yên tirkan dest bi bombebarana herêma Kurdistanê kir. Her heman rojê Obama ferman da ku hemû hebûnên malî yên Sûrîyeyê yên li Amerîkayê werin cemidandin û îtxalkirina nefta Surîyeyê qedexe kir. Ev yek nîşan didin ku di navbera Tirkîye û Amerîkayê de peymanek heye. Anku Amerîka dê bihêle ku Tirkîye herêma Kurdistanê bombebaran bike û Tirkîye jî li hember pêkirinên li dij Sûrîyeyê dengê xwe nake, da ku rejîma Esad were rûxandin."*

Le Monde diplomatique kurdî
Ji aliyê Independent Kurdish Media Group GmbH ve tê weşandin

INDEPENDENT KURDISH MEDIA GROUP GMBH

Carnotstr. 4
10587 Berlin / Almanya

Lijneya Weşanê
Murad Satik
Riza Dînç

Le Monde diplomatique kurdî

Redaksiyona Zimanî
Mahmûd Lewendî
Remzî Kerîm

Alîkarên vê hejmarê
Yado Ciwan
Semra Polat
Ergün Yetkiner
Celîl Kaya
Nedîm Baran

Revîzyona Wergeran
Feryal Guladawîya
Luqman Guldivê

Berpirsê Hunerî
Hasan Huseyîn Devecî

Designer
Fabio Biasio

Web Developer
Erhan Yekta

Tel: 00 49 (0)30 330 990 420
Fax: 00 49 (0)30 330 990 429
info@lemonde-kurdi.com
www.lemonde-kurdi.com

ABONETÎ
Independent Kurdish Media Group GmbH

Berliner Volksbank
Konto: 2284 123 010
BLZ: 100 900 10
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 00
BIC/SWIFT: BEVODEBB

Abonetiya Salane:
Almanya: 50 €
Derveyî Almanyayê: 60 €
Abonetiya dîjîtal: 20 €

Le Monde diplomatique

Damezrîner
Hubert Beuve-Méry

Birêveberê giştî
Serge Halimi

Sernivîskar
Maurice Lemoine

Cîgirên Sernivîskarî
Martine Bulardi
Philippe Rivière
Anne-Cécile Robert

Redaksiyon
Alain Gresh
Mona Chollet
Pierre Rimbert
Dominique Vidal

Birêveberê hunerî
Alice Barzilay

Dokumantasyon
Olivier Pironet

Sekreter
Sophie Durand
Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon,
F-75013, Paris, France

Vegera dema bihurî (Dewama rûpela 1)

giran be" û ji bo *"wan kesên"*(yanî partîya nêzîkî kurdan *"Partîya Aştî û Demokrasîyê"BDP)* ku xwe ji PKKê dûr nekirine, şefê hikumetê tehdît dike û *"şerekî nû"* îlan dike, belkî jî, ji nû ve dagirkirina bakûrê Îraqê, cîyê ku jixwe bi salan e 1200 lêşkerên tirk tê de ne.

Erdogan berî her tiştî li pey motîvên siyasî ye

Di siberojê de, wiha dibêje serokwezîrê şerhez, divê hêzên taybetî yên polîs bi çekên nû û yekemcar bi firokên bê pîlot roleke girîng di şerê li dijî PKKê de hilgirin ser xwe; ev yek dê heta gerîla bên tune kirin bidome. Tehdîta ku yekîneyên polîs ên paramilîter di şer de cî bigirin, ragêşî bilind dike û bîranînên salên şer ên 1990ê şîyar dike, di wê demê de ev yekîneyên leşkerî 4000 gund xirab kiribûn û nêzîkî du mîlyon niştecî koçber û perîşan kiribûn, birînên derketine holê hîn jî, baş nebûne. Piranîya kurdan difikirin ku ew ji leşkeran gelek xirabtir bûne. Di sala 1997ê de ew ji holê hatibûn rakirin, ji wê demê ve rewş hinek aramtir bûbû. Bicîkirina wan a nav şer dê şansa dawî ya ji bo aştîyê jî, derdest bike. Ev mebesta Erdogan li cem kurdan û li cem tirkên lîberal jî, şikbarîya wan a ku serokwezîr bi lihevhatin û aştîyê ne cidî ye, zêde dike. Rojnamevanê tirk **Cengiz Çandar** wiha gazinan dike *"li hember hemû hewldanên ku tundrewîya leşkerî ya li Kurdistanê rawestîne, ew bixwe jî pirsa kurd bi heman şeklê netewperestîya leşkeran dibîne".*

Ji nû ve vejandina yekîneyên polîs ên kerixî ne, Erdogan helbet ewil li pey motîvên siyasî ye. Bi wêrekîya serfirazîya hilbijartina meha hezîranê wiha dîyar e ku hêvîya wî, kefaleta leşkerî ya dûrediréj ji bo sîstema atatürkî, piştî xwejikarvekêşana serbazên wê yên bilind û sê serbazên herî berz hîn bêtir bê tesîr bihêle, rêzdarîya wan kêm bike û bi şerê li dijî PKKê kontrolê hîn bêtir bixe jêrdestê sîvîlan. Polîsên taybetî dê bi wezareta hundir a nêzîkê AKPê ve bên girêdan. *"Ji alîyê siyasî ve gaveke gelek xirab"* dibêje analîzvanê leşkerî **Gareth Jenkins** ku li Stenbolê hatiye bicîhkirin *"ji ber ku ew wê hîsê dide, mîna ku hikumetê berê xwe daye dema bihurî".* (Eurasianet. Org, 18.8.2011). Salên 90ê ji bo kurdan û ji bo tirkên lîberal jî wek *"dema winda"* derbas dibin. Wisa dixuyê ku **Erdogan** jî mîna yê berîya xwe pirsa kurdî wek *"pirsgirêka ewlekarîyê"* difikire û li termînolojîya kevin vedigere: *"Li Tirkîyeyê pirsgirêka kurd tuneye, pirsgirêk tenê bi PKKê re ye",* ji kurtedemekê ve ye ku vê yekê dubare dike.

Derfeta ku ji dest derketî

Di rastîyê de hilbijartinên parlamentoyê di meha hezîranê de şanseke nû ji bo nêzîkbûna tirk û kurdan li ser daxilkirina siyasî ya pêwîst vekir. BDP bi qezenckirina 36 endaman di parlamentoyê de bû xwedîya hejmarekê ku heta niha tu partîyek nêzîkî kurdan nebûye. Lê dilşahîyê dirêj nekişand. Ne tenê endametîya siyasetmedarê kurd **Hatîp Dîcle** jê hat girtin, ji ber axaftineke wî ya sala 2007ê, sê roj berîya hilbijartinê salek û heşt meh cezayê girtîgehê dabûnê. Dîcle ku li benda dozeke ji ber heman *"sûc"*î bû, ji kanûna 2009ê ve di girtîgehê de bû û bi vî awayî cezayê xwe temam kiribû. Pênc parlamenterên din ên BDPê ji ber dîtinên xwe hîn di girtîgehê de li benda doza xwe ne, piştî hilbijartinê daxwaza wan a ji girtîgehê derketinê hat redkirin.

Ne ecêb e eger ev dîyarde kurdên ku li pey hewla çareserîyeke demokratîk in, bixe hawarbangê. Dewamkirina boykota BDPê ya parlamentoyê ji wê rojê ve û îlana *"otonomîya demokratîk"* a gelê kurd li Tirkîyeyê ya lezûbez di 14ê hezîranê de ku ji alîyê *Kongreya Civaka Demokratîk (KCD),* komelgeheke ku 850 endamên wê ji siyasetmedarên tirk û kurd, ronakbîr û nûnerên komên parastina mafên hemwelatîyan hene, bû sedema hîn bêtir tengijînê, bi taybetî jî, ji ber ku di heman demê de li herêma Diyarbekirê 13 lêşkerên tirk hatibûn kuştin. Siyasetmedar û medyaya tirk bala xwe li ser vê çalakîya terorî kûr dikin, PKKyê jî wek berpirsê wê dibînin. Ew di wê derbarê de hemû sûcdarîyan red dike û heta alîgirên dewletê mîlîsên -"cerdevan" ên ku li dijî PKKê bi dewletê re dixebitin bixwe jî, agahdarî û angaştên [îdîa] şahidên BDPê piştrast dikin û dibêjin ku leşkerên tirk bi rêya hêrişên firokên şer hatine kuştin, mebesta hêrişan însîyatîfên demokratîk ên kurdan blokekirin e.

Konsepta Otonomîya Demokratîk: Bi tenê sembolek e?

Konsepta *"Otonomîya demokratîk"* ji bo çareserkirina pirsa kurdî çiqas girîng be jî, daxuyanîya bi lezûbez, ji xeyalşikestîya kûr ku dijber manîpulasyonên **Erdogan** derketîye, halîhazir gelek zerar daye. Siyasetmedarên nasdar ji konsepteke ku naveroka wê kêm e û yekalî beyan bûye, ji sembolekê pê ve nabînin û xwe bi biryardarî jê dûr dixînin. Lê dîsa jî ev yek cardin cotsdandartîya trajîk a siyaseta rojava şanî dide. Ji alîyekî filistînî bi tentepêlên mezin ên medyaya navnetewî û çavdêrîya siyasetmedarên navdar ji sê dehsalan zêdetir e çalakîyên wiha –yekalî bangewazîya dewleteke serbixwe- hertim çêdikin, ji alîyê din çalakîyeke wiha yên kurdan ku mafê wan ê çarenûsî ji wan hatîye dizîn, hîç girîngîyekê jî nabîne; herçiqas nivîskar berztirîn nirx dida tirsa tirkan a derbarê *"yekîtîya neteweyî"* ya dewletê birevînin. Daxuyanî binxêz dike ku *"otonomî"* bi tenê ji bo herêmên kurdan ên di nav sînorê Tirkîyeyê de ne. Lê dîsa jî, ev gav di nav neteweperestên tirk de bû sedema bahoza protestoyê.

Qelsîya herî mezin ya qanûna bingehîn a Tirkîyeyê

Daxwaza otonomîyê qelsîya herî mezin a qanûna bingehîn a tirk dest nîşan dike: Sentralîzma li ser hertiştî ya di wê derê de bicîhkirî ku sedemê kêmberhemdarîya rêvebirîyên herêmî ye. Reformeke bi vê konseptê dê ji bo hemû hemwelatîyên tirk faydeyên mezin bîne.

Lê dîsa baş e ku Erdogan guhertina qanûneke bingehîn a nû ji bo heyama nû wek karekî sereke hilgirt pêş xwe. Kilîta girîng a çareserîya pirsa kurd jî di wê derê de ye. Lê serokwezîr dixwaze nûnerên partîya demokratîk a kurd a herî xurt BDP bi tenê bi şertê ku ew vekirî xwe ji PKKê dûr bixînin, dikarin bikevin komîteya xebata ku dê li ser qanûna bingehîn bixebitin û gengeşîyê bikin –daxwazeke bi dehsalan e di wê yekê de serkevtî ye ku rêberên kurd *(mînak kesên navdar:* ***Dîcle*** *û xwedîya xelata aştîyê a Sacharow* ***Leyla Zana*** *ku bi giştî dozdeh sal di girtîgehê de ma),* ji pêvajoya siyasetê dûr bixîne. Herçend zelal e ku beşekî mezin ê kurdan teror û şidetê red dikin û dîsa jî serokê PKK **Öcalan** ku deh sal in girtîye, kirine efsane, ji bo lihevhatineke rasteqîn ya di navbera her du gelan de nikare bê paşçav kirin. Nexistina BDPê a nav reforma qanûna bingehîn, ji bo Tirkîyeyê ne tiştekî qenc e.

Belê Erdogan bi zexta-YE (EU) hejmareke lîberalîzekirin, beramber kurdan jî, pêk anîn, lê qanûna bingehîn a di bin dîktatorîya leşkerî, di 1982yê de amade bû, ne bi tenê hêmanên otorîter danîye, herwiha li pêşîya kurdan astengeke mezin e ku ew nikarin mîna hemwelatîyên wekhev di nav dewleta tirk de bilind bibin. Ji ber ku hema di pêşgotinê de qanûn hemwelatîtîya komarê tenê li ser bingeha etnîsîteya tirk bi nav dike ku bingeha vê yekê îdeolojîya dewletê ya Atatürk digire û bi dehan salan e li hember kurdan rêberîya otorîterî ya dewletê ye. Sê madeyên ewil ên qanûna bingehîn prensîpên heyî zexim dikin û zimanê tirkî wek (tenha, yekem) zimanê welat bi nav dikin û girêdana xwe ya bi *"neteweperestîtîya Atatürk"* qewî dikin. Madeya çarem neguherbarîya her sê madeyên ewil dinivîsîne. Hejmareke madeyên din, hîn tundtir bikaranîna zimanê bi taybetî jî, ji bo dibistanê qedexe dikin.

Nîşanên guhertinxwazîyê li ba AKP tunene

Hîç tiştek şanî nade ku AKP dixwaze li vê derê guhertinên radîkal pêk bîne. Derveyî vê jî şik heye ku di reforma qanûna bingehîn de yekem girîngî ji bo **Erdogan** ew e ku ew dixwaze sîstemeke serokatîyê li gor awayê fransî bixe qanûnê, ew jî bibe serokê yekem.

Hertim dubarekirina sozên reformê vê rastîyê paşçav nake ku AKP Tirkîyeyê li pêş çavan ber bi rêyeke -nûjen-otokratîk ve dibe. Rastî û hejmar li holê ne. Dê dijberên siyasî di nav kurdan de bê şidet bi alîkarîya dadmendîyê bên berteref kirin. 150 siyasetmedarên kurd, 15 ji wan serokên şaredarîyan ên hatine hilbijartin in, bi îdîayên têkilîyên bi PKKê re li benda darizandinê ne. 106 siyasetmedarên kurd, di nav de 98 serokên şaredarîyên hatine hilbijartin, ji ber sedema bangewazîyeke başkirina şertên girtîgehê yên **Öcalan** îmze kirine, li benda darizandinê ne. Di bin tehdîda 20 sal cezagirtinê de ne. Li gor ragihandinên serokê BDPê **Selahattin Demirtaş** ji sala 2009ê ve herî kêm 2300 çalakvanên kurd hatine girtin, dozgerî serî lê daye ku ji bo 22 parlamenterên BDPê cezayekî girtîgehê yê zêdeyî 2350 salan bê dayîn. (Economist 14.04.2011), *Human Rights Watch* bi êş şikayet dike û dibêje qanûnên-terorê xirab bi kar tînin ku siyasetmedarên kurd berteref bikin (hrw.org: 18.4.2011): *"Hewldanên dozgerîya komarê ên bê belgeyên îspatkirî derbarê kiryarên şidetê ku partîya legal (BDP) bi rêxistineke îlegal ve (PKK) girê dide, mirov nikare vê yekê ji hêrişeke li dijî çalakîya siyasî ya rewa, cuda binirxîne."*

"Sîstema tirk hertim li hember guhertinê li ber xwe daye û helwêsteke kevneperest li dijî nasname û daxwazên din ên ji bo azadîyê, şanî daye" dinivîse Erbey di nameya xwe ya ji girtîgehê. (opendemocracy.net, 23.8.2011) *"Sala 2002ê, 52 000 mirov di girtîgehên tirkan de bûn, ji Nîsana 2011ê ve ev hejmar bûye 123 000."*

Şerê tevayî yê kurd û tirkan ne dûr e

Zordarî û sozên reformê yên nehatine cî; niha bilindkirina şidetê ji her du alîyan ve, ber bi parçebûneke tirsnak a civaka tirk dibe. Pevçûnên dijwar ên dema nû di navbera kurd û tirkan de li Stenbolê vê yekê şanî didin. Şik nîne: Têkçûneke *"vebûna demokratîk"* a sedîsed li hember kurdan, encamên mirov nikare texmîn bike, tîne holê. Ji ber ku zarokên kesên di 25 salên derbasbûyî de hatine bindest û koçber kirin, dibin nifşekî ku tehamul û bêhêvîtîya dê û bavên xwe li hember qudreta mekanîzmeya dewleteke zordar, her diçe bi hişmendîya serhildêr diguherînin. Tenê di çar mehên dawî yên 2011ê de 350 zarokên di bin 18 salî de, di dema xwepêşandanên ji bo PKKê hatine girtin. 116 ji wan hîn jî di girtîgehê de ne. (blogs.wsj.com, 3.6.2011)

"Em nifşê dawî yê siyasetmedarên kurd in ku dikare bi nunerên dewletê re bazarîyê bike û destê wan bigire", çendek berê serokê şaredarîya mezin a Amedê **Osman Baydemir** gotibû.

Bi taybetî jî, bi hêrişa leşkerî ya nû li Bakûrê Îraqê, herêma perîşan li hember krîzeke nû ye. Di salên derbasbûyî de 25 hêrişên çêbûyî, wiha tesbît dike wezîrê derva yê Îraqê **Hoşyar Zebarî,** nikaribûn PKKê ji cîyên wan, ji çîyayan derbixin der, lê tenê îstikrara li Îraqê hîn bêtir qels kirin. Û hîn jî heye. Hin şirovekar dibêjin ku **Erdogan** dixwaze PKKê ji alîyê leşkerî gelek qels bike, berîya ku Surîye hîn bêtir di tevlîhevîyê de winda bibe û Îranê jî bi xwe re kaş bike û ev yek ji gerîlayan re zemînên nû ji bo şerê çekdarî peyda bikin daku mafên kurdan ên bingehîn yên hîn jî nayên nas kirin, pêşkêş bike.

"Ez hêvî dikim û bendewar im ku hûn li gor wijdanê xwe, pêwistîyên wezîfeya xwe bînin cî", rê li ber *"şerekî etnîkî"* di navbera gelên Tirkîyeyê de bigirin. Ji ber ku ev *"misoger"* e dinivîse parlamentera kurd û xwedîya xelata Sacharow **Leyla Zana** di bangeke xwe ya acîl ji Serokê-DY (US) Obama re. *"Gelê me"* ku *"ji edaleta dîrokê bêpar hatîye hîştin"* hîn jî şerekî ji bo *"hebûn"*a xwe dide û ji bo vê yekê gelek jîyanan wek qurban dide.

* Rojnamevan, nivîskar

Wergera ji almanî: Hüseyin Kartal

RÊDÎ SEÎD TOPRAK: **Komwêneyên Ba-Jahrê I**, li ser kaxizê teknîka tevlihev, 27 x 43 cm

Di bin sîya çekan de li aştîyê gerîn (Dewama rûpela 1)

Protokola Yekem: Serenavê protokolê weha bû.'Prensîbên çareserîyeke demokratîk ji bo pirsgirêka kurdî a li Tirkîyeyê' An ku meseleya destûreke demokratîk...

Protokola Duyem: Di warê têkilîyên navbera dewletê û civakê de prensîpên aştîyeke adilane...

Protokola Sêyem: Bernameya çalakîyê ji bo aştîyeke demokratîk û adilane...

Her protokolek ji du rûpelan pêk tê û gelek kûr û tije ne. Heyeta dewletê, ku mehek berê digel serok ***Apo*** *rûniştibû, van protokolan red nake. Dibêjin 'nivîsarên weha ne ku mirov dikare li ser nîqaşê bike' û dîyar dikin ku dewlet û hikûmet dê li serê nîqaş bikin. Em li benda bersiva wan in."*

Sedema wê yekê ku rêveberên PKKyê şidet ji bo demekê dabû rawestandin ew bû ku Ocalan, ku ji tecrûbeya ***Xabûr***ê hin encam derxistibûn, fikr û ramanên xwe yên ji bo çareserîyê sîstematîze kiribûn û di encamê de sê protokolên *'aştîyê'* pêşnîyarî dewletê kiribûn. Ev protokol li rêveberîya PKKyê jî hatibû pêşnîyar kirin û wan jî protokol erê kiribûn. Ocalan ji bo bersivekê heta 15ê tîrmehê wext dabû dewletê. Bersiva ku rêxistin bi awayekî bêsebr li bendê bû, Ocalan di 6ê tîrmehê de di hevdîtina xwe ye digel parêzerên xwe aşkere kir: *"Di hevdîtina me ya dawî ya digel heyetê, ku îro pêk hat, pêngava herî girîng û pêwîst ku me li ser li hev kir, avakirina Konseya Aştîyê bû. Digel heyetê em niha di warê avakirina Konseya Aştîyê de hevbîr in. Jixwe ev yek di protokolan de jî cih digirin. Avakirina Konseya Aştîyê pêngava berbiçav a herî girîng e, ku divê û dê were avêtin. (...) Tarîxa 15ê tîrmehê, ku me berê behs kiribû, bila çewt neyê fam kirin. Sedema ku me 15ê tîrmehê gotibû ew bû ku ev roj nêzî wê tarîxê ye ku em ê bi heyetê re kom bibin. Jixwe hevdîtina me ya digel heyetê zûtir pêk hat. Ji bo min tiştê esas ev hevdîtin bû, ne roja 15ê tîrmehê. Û ji ber ku me ev hevdîtin îro pêk anî, êdî roja 15ê tîrmehê jî bo min ne xwedî wate yan ji hukimek e."*

Ev daxuyanîyên PKKyê ji alîyê hin rojnameyan ve wekî 'pêşveçûneke dîrokî' hat nirxandin. *(Ji Ocalan daxuyanîya dîrokî: Me bi dewletê re li hev kir. /09.07 2011/* ***Radikal****)* Dema ku ev gotinên Ocalan hîna di raya giştî de dihatin nîqaş kirin, ji ***Farqîn***ê xebera nebaş hat. Leşkerên ku du ji wan leşker, li sê kesên ku ji alîyê PKKyê ve hatibûn revandin, digerîyan, li çoltera Farqîna rastî gerîlayan hatibûn û di encama pevçûnekê de 13 leşker bi awayekî kambax jîyana xwe ji dest dabûn. Çend rojan paşê, di 18ê tîrmehê de yek ji rêveberên PKKyê **Cemil Bayık**, di hevpeyvîna xwe ya digel *Ajansa Nûçeyan a Firatê* de dîyar kir ku ka PKK wan protokolên ku Ocalan û dewletê li serê li hev kiribûn çawa dinirxîne. **Bayık** weha peyivî:

"Rêber Apo dîyar kir ku dewletê ev protokol pejirandine û konseya aştîyê dê were ava kirin. Ev bi tenê protokolek bû. Yên din jî hene, yek ji wan jî li ser avakirina ***Komîsyona Destûrê*** *bû. Ev komîsyon dê di çarçoveya destûrê de hewl bidaya ku pirsgirêka kurdî were çareser kirin. Protokoleke din jî li ser avakirina komîsyona ewlekarîyê bû. Ev komîsyon jî dê ji bo dualîkirina agirbestê, qedandina şer, dawîlêanîna operasyonan û serbest berdana girtîyên siyasî bixebitiya. Hîna ne dîyar e ku ev protokolên ku dewletê pejirandine kengî werin bi cih anîn, niha yan saleke din, nayê zanîn. Dewlet di vî warî de tu tiştekî nabêje lê bi tênê pejirandîye. Ev yek jî xapandin e, taktîk e (...) Bila tu kes xwe nexapîne, divê gelê me di vî warî de hişyar be, ev taktîk in, aliqandin in. Dixwazin serokatîya me, tevgera me û gelê me bialiqînin. Divê gelê me li rûmeta xwe xwedî derkeve."*

Ev daxuyanîyên **Cemil Bayık** nîşan didin ku bûyera Farqînê ya 14ê tîrmehê û ragihandina xweserîyê ya heman rojê ne tesadufî ne û parçeyekî nû ya hamleya leşkerî û siyasî ya siyaseta kurd in. Rêveberên PKKyê, ku ev demeke dirêj e ku li benda bersiva protokolan in, biryar stendiye ku careke din şer bikin. Êrişên li dij hedefên leşkerî ku rojên din pêk hatin, vê yekê pişt rast dikin. Fikr û stratejîya rêxistinê, ku li pişt vê biryara di şer de ne, ne dijwar e ku mirov tespit bike. Herçend PKK vê yekê bi awayekî aşkere nayne ziman jî, dîyar e ku rêxistin xwedî du armancên sereke ye, armanca demkurt û demdirêj:

1. Di dema kurt de, hevdîtinên li Îmralîyê bigihîjin merheleyên nû. Di hevdîtinan de beşdarbûna aktorên nû an jî çavdêrîya kesên sêyem.

2. Di dema dirêj de jî bi riya ragihandina yekalî ya xweserîyê bidestxistina statuyekê.

Bawer nakim Selahattin Demirtaş bêyî Qendîlê gotibe "divê muzakereyên digel Ocalan bi awayekî vekirî werin meşandin."

Dibe ku mirov pê matmayî be ku mebesta demkurt a rêxistinê merheleyeke nû ya hevdîtinên li Îmralîyê ye. Lê belê, serokê BDPyê **Selahattin Demirtaş** di 10ê tebaxê de, di bernameyeke NTVyê de, ku tê de beşdar bûbû û herweha di civîna çapemenîyê ya 18ê tebaxê, ku li Dîyarbekirê pêk hatibû, pêşnîyareke balkêş kir û got ku muzakereyên digel Ocalan divê bi awayekî 'vekirî'/aşkere werin meşandin. Bawer nakim ku serokê BDPyê birêz Demirtaş, ku wekî siyasetmedarekî rêzê lê digirim, van gotinên xwe, ku tê de pênebawerîya li hevdîtinên nepenî yên Ocalan dîyar dibû, bêyî haya Qendîlê gotibin. Ji ber ku ev demeke dirêj bû ku navenda siyaseta kurdî bi şik û gumanan berê xwe dida hevdîtinên li Îmralîyê. Pêşî wekî gotegot li kulîsan belav bû ku Ocalan tê aliqandin û paşê jî fikra ku digot *'Ocalan ji alîyê dewletê ve tê xapandin'* belav bû. Tê zanîn ku ji destpêkê ve PKK ji wan rayedaran re, ku ji bo hevdîtinê çûbûn cem wan, gotibû ku muhatab Ocalan e. Û herweha ne sireke e ku di stendina vê biryarê de bandora **Murat Karayılan** heye, ku bi nêzîkbûna xwe ya Ocalan tê nasîn. Lê belê rêveberên din, ku îro li ser rêxistinê xwedî giranî ne, di wê bawerîyê de ne ku di encama hevdîtinên li Îmralîyê de encamên ku ew li bendê bûn, derneketin. Hevdem, ev dixwazin ku ne bi awayekî rasterast be jî ji naveroka hevdîtinan haydar bin. Di demên dawî de li cem rêxistinê tê gotin ku di hevdîtinên aştîyê yên Afrîkaya Başûr de **Nelson Mandela** gelek bi hêrs bûye û rêxistina ku bi rastî muzakere meşandiye ANC (Kongreya Neteweyî ya Afrîkayê) bûye.

Mebesta demdirêj a PKKyê li herêmê bidestxistina statuya xweserîyê ye. Ji ber ku rêxistinê di vî warî de gelek daxuyanîyên dûr û dirêj weşandine, hewce nabînim ku li ser vê yekê bêhtir nirxandinan bikim. Lê belê, bi awayekî yekalî dîyarkirina xweserîyê û hilbijartina şidetê wekî rêbaza sereke bûn sedem ku ev projeya siyasî bibe xwedî karaktereke otorîter û zordest û raya giştî ya tirk û kurdî bi awayekî bi şik berê xwe bidinê.

Helwêsta Imralîyê ya li beramber van bûyeran ne zelal e

Ewqas ne hêsan e ku mirov bikaribe helwêsta Îmralîyê ya li hember van pêşveçûnan fam bike. Raya giştî ya tirk difikire ku di navbera Îmralî û Qendîlê de derizîneke cidî heye. Tê îdîa kirin ku li hember daxuyanîyên Ocalan ku digot 'me bi dewletê re li hev kir, em şerê şoreşger ê gel didin rawestandin', rêxistin bi ya xwe dike. Serokwezîr **Erdoğan** jî îdîa dike ku Ocalan êdî li ser rêxistinê xwedî desthilatdarîyeke giştî nîne. Herçend hin guman hebin jî raya giştî ya kurd di wê bawerîyê de ye ku Ocalan bênîqaş hîna jî serok û rêberê rêxistinê ye.

Herçend çapemenîya tirk û derdorên hikûmetê rewşê mubalexe dikin jî, bawer dikim ku dê heqîqetek be were gotin ku di nav rêxistinê dînamîkeke li dij Ocalan heye. Heta roja îro Ocalan karî fêriseke siyasî nîşan bide û meyl û tevgerên cihê yên nav rêxistinê, ku komên nepenî yên li xwe jî tê de, li gor hesabên xwe yên siyasî binirxîne. Ne hêsan e ku komek, ku bi awayekî aşkere dijberîya Ocalan bike, di nav PKKyê de bisitire. Lê belê di rewşa heyî de êdî rêxistin mekanîzmayên xwe yên biryarstendinê afirandine û ev yek nabe ku were înkar kirin. Bi awayekî bê şert û merc bi ya her tiştê ku Ocalan dibêje nakin. Ji ber ku rêveberên li Qendîlê bersivên dewletê yên ji bo protokolên ku Ocalan pêşniyar kiribûn têr nabînin, ev yek wan nake dijberî Ocalan, lê belê dikare li cem dewletê otorîteya Ocalan, ku jê re destûrmendîya muzakerekirinê hatibû dayîn, bêguman qels bike. Heger em bêjin otorîteya Ocalan a li ser rêxistinê qels bûbe jî bandora Ocalan a li ser kurdan bênîqaş jî bo siyaseta kurdî xwedî girîngîyeke gelek mezin e. Anku di warê meseleya kurdî de rola Ocalan ji ya PKKyê jî mezintir e.

Pevçûnên navbera hikûmet û PKKyê, qada manevrayên siyasî yên BDPyê, ku çav lê bû ku di pêvajoya aştîyê de roleke girîng bilîze, teng kir. Ji êrişa li dij PKKyê, BDPyê jî para xwe stend. Wekî hikûmetên berê AKPyê jî li ser BDPyê zext û zora xwe zêde kir û karta girtîgehê derxist pêş. Di kombûna ewlekarîyê ya Lijneya Ewlekarîya Neteweyî (MGK) de ne tenê têkoşîna li dij PKKyê, lê her weha rê û rêbazên li hember siyasetmedarên kurd jî derketin holê. Li gor agahîyên ku çapemenîyê bi dest xistibûn, di nav wan rêbazan de hewldanên ji bo bêtîtbar kirina siyasetmedarên kurd û piçûk xistina wan a di çavê gel de jî heye.

BDP êdî nikare wekî hebûneke siyasî xwe bide hîs kirin

Encama bivê nevê ew bû ku şer û pevçûn rê li ber siyaseta demokratîk teng bike. Li hember otorîteyên hêzdar ên wekî Qendîl û Îmralîyê, êdî ne mumkin be jî, gelek dijwar e ku BDP bikaribe xwe wekî hebûneke siyasî bide hîs kirin. Siyaseta legal a kurd, heta îro ji temaşekirina şer û pevçûnan nikaribû wêdetir biçe. Ji ber ku BDP piştî hilbijartinan nikaribû vegere meclisê, ev yek jî nîşan dide ku BDP di nav nal û bizmar de maye.

Lê belê BDP bi giranî dayîna siyaseta demokratîk dikaribû him meyla şidetê ya PKKyê sînordar bike û him jî pêşî lê bigire ku hikûmet serî li rêbazên leşkerî bide. Rêveberîya BDPyê di warê tu mijarên girîng de nikaribû bi tena serê xwe îmze biavêje. Di her derfetê de wan Îmrali û PKK nîşan dan û xwe pasîfîze kirin. Bêguman, Îmrali û PKK ji bo siyaseta kurdan realîte ne û înkarkirina vê yekê jî ne rast e. Lê belê, ji holê rakirina mesafeya navbera xwe û Îmralî û PKKyê jî, wekî ku dihat guman kirin, siyaseta kurd hêzdartir nekir, lê qels kir. Dema ku ji hikûmetê re dibêjin 'operasyonan rawestînin' divê heman tiştî ji PKKyê re jî bibêjin ku ev gotina wan hêjayî bawerî û xwedî nirxeke siyasî be. Da ku bikaribin li hember hikûmetê muxalefeteke bandorker bikin, divê hinekî jî li îtîrazî PKKyê bikin. Heger ev ne jidil be, tu kes nikare xwe nêzîkî pirsgirêka kurd bike, ku jixwe her kesê ku nêzîk dibe bi tîna wê disoje.

Windakirina pêbawerîya siyasî

Xala ku niha BDP gihîştiye xembar e, rêveberên BDPyî êdî hatine wê merheleyê ku ji nîşandana nerazîbûna xwe ya însanî ya li hember mirinên şer jî îmtînê dikin. Heger gihîştibin vê merheleyê, wan êdî pêbawerîya xwe ya siyasî jî wenda kiriye. Lê belê dîsa jî jîyan bi munasebetên cur bi cur nîşan dide ku pêwîstî bi BDPyê heye. Di vî warî de divê BDP piştevanîya sedema hebûna xwe anku piştevanîya siyaseta demokratîk bike. Bi hiştina gotina dawî ji Qendîl û Îmralîyê re siyasetmedar dikarin paşeroja xwe ya siyasî biparêzin, lê belê tu caran nikarin bibin aktorên aştîyê.

Stratejîya nû ya ewlekarîyê ya hikûmeta AKPyê, pirsgirêkê girantir dike

Stratejîya nû ya ewlekarîyê ya hikûmeta AKPyê, ku dîyar kir ku dê di warê pirsgirêka kurd de bişopîne, aşkere ye ku dê pirsgirêkê girantir bike. Di nav wan sedeman de, ku pirsgirêkaa kurd nikare ji bin sîya çekan were derxistin, siyasetên xelet ên hikûmetê di serî de ne. Esasa vê siyasetê feraseta qebûlkirina mesela kurd, lê belê redkirina PKKyê ye. Ev yek ji alîyekî dibe sedem ku hikûmet meseleya kurd wekî pirsgirêkeke piçûk a demokrasîyê fam bike û ji alîyê din de jî hewlê bide ku PKKyê tasfîye bike. Ev yek jî bivê nevê dibe sedema şidet û pevçûnê. Ev çembera stewr, ku hêsan xuya dike, di rastîyê de stewrîya sereke ya AKPyê nîşan dide. Her ji ber vê yekê *vebûna demokratîk* negihişt tu encaman. AKP, serokê wê, serokwezîr Erdoğan, ji alîyekî rastîya kurdî nas dike lê di dema naskirina mafên civakî û siyasî yên vê rastîyê de tirs û xofa parçebûnê wan digire. Serokwezîr gelek caran dibêje *'pirsgirêka kurd nîne, pirsgirêkên birayên min ên kurd hene'* û serî li rêbazên leşkerî dide. Ev helwêsta ku bêmêzîn xuya dike, di rastîyê de pirsgirêkeke alîyên siyasî yên meselê têkildar e.

Serokwezîr yan jî AKP bi pirsgirêkeke kurd a razber re rû bi rû nînin. Wekî nûnerên siyasî yên meseleya kurd bi PKK/Îmralî û BDPyê re rû bi rû ye. Di warê çareserîya meseleya kurd de helwêstên van aktoran ne tenê AKPyê, lê her weha partîyên siyasî yên din ên tirk jî ditirsînin. Anku di warê pirsgirêka kurd de tiştê ku nêrîn û helwesta AKPyê sînordar dike hinek jî nêrîn û helwesta PKKyê ya di warê çareserîya meseleya kurd e. Bêguman, ev yek paşdeavêtina daxwazên meşrû yên kurdan mafdar dernaxe, lê belê dikare îzah bike ka hikûmet di warê pirsgirêka kurd de çima qîma xwe bi pêngavên sînordar tîne.

Mijareke din ku hat rojevê helwêsta AKPyê ya li hember **Ocalan** e. Hikûmet li Îmralîyê dixwaze digel Ocalan ne meseleya kurd, lê belê meseleya PKKyê muzakere bike. Di rastîyê de hikûmet naxwaze ku Ocalan wekî muhatabê meseleya kurd qebûl bike. Du sedemên vê yekê hene: Yek hikûmet naxwaze ku bi qebûlkirina Ocalan wekî nûnerê meseleya kurd bihêle ku PKK meşrûîyetekê bi dest bixe. Ev meşrûîyet tê wê wateyê ku başûrê rojhilat ji PKKyê re were hiştin, ku ev yek ne tenê ji bo sîstemê, lê belê her weha ji bo hesabên wan ên siyasî jî bi kêr nayê.

Hikûmet çima dev ji Ocalan bernade?

Lê belê hikûmet di meseleya kurd de da ku dawî li pirsgirêka şidetê bîne û PKKyê kontrol bike, dev ji temasên bi Ocalan re jî bernade. Û dema ku digihîje radeyekê, wekî îro, serî li rêbazên leşkerî dide.

Rêbazên leşkerî nikarin heta ebedîyetê dewam bikin û AKP jî vê yekê dizane. Lê belê, hikûmet di wê bawerîyê de ye da ku bikaribe rêxistinê qels bike, divê wê di warê leşkerî de qels bike û lewma maweyekê operasyonên leşkerî dê berdewam bikin. Li Bakurê Îraqê, operasyoneke bejayî ya li dij kampên rêxistinê jî dikare pêk were. Lê belê heger li ber çavan were ragirtin ku AKP partîyeke konjonktûrel e û siyasetên rojane dimeşîne, mimkun e ku otorîteya siyasî dawî li van operasyonan bîne. Di warê pirsgirêka kurd de, herçend Tirkîye nikaribe bi awayekî giştî xwe ji sîya çekan rizgar bike jî, di dahatûya nêz de lêgerînên xwe yên aştîyê berdewam bike.

* Nivîskarê rojnameya Tarafê

Wergera ji tirkî: Celîl Kaya

RÊDÎ SEÎD TOPRAK: **Komwêneyên Ba-Jahrê II**, li ser kaxizê teknîka tevlîhev, 43 x 27 cm

TÛNIS Û MISIR DI GERA LI MODELEKE PÊŞKETINÊ DE

Piştî şoreşan arizîkirin?

AKRAM BELKAÏD *

Tûnis û Misir bi îstîqrar-kirineke zehmet a rewşa xwe ya siyasî re rûbirû ne, divê ew di heman demê de ji heqê pirsgirêkên aborî jî derkevin. Hilweşîna sîstema kurtêlxur a mafyawarî wê bêguman enerjîyan û înîsîyatîfên ferdî serbest bike, lê belê bi tenê heke desthilatdarîyên nû yên li cihê cih derfetên malî peyda bikin da ku demên ji dest dayî telafî bikin û pêşketineke wekhevîparêztir misoger bikin, ev enerjî û înîsîyatîfên ferdî wê berdar bin. Li gor texmînên destpêkê yên Bankeya Navendî ya Tûnisê û wezareta aborîyê ya Misirê di nav pênc salên li pêşîya me de wê pêdivîya her du welatan bi bîst ta sih milyar dolaran hebe da ku hoy û mercên jîyana welatîyên xwe baştir bikin û bi xêra bernameyeke sermayedana li sektorên barkêşî, çûnûhatin, enerjî û binesazîyên teknolojîk herêmên sihê/tam bi pêş bixe. Kesayetîyên tûnisî, belê herweha yên ewropî û ereb haya wan ji van pirsgirêkan heye (1), ev kesayet li bin slogana "Invest in Democracy, invest in Tunisia" ("derfetan li demokrasîyê, sermayeyê li Tûnisê razîne) û bangeke bi navê (Manîfestoya 200an) kir ku pê ji Rojava xwest di warê malî de destekê bide Tûnisê.

Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Yekîtîya Ewropayê bi awayekî kêm û zêde parçeparçeyî dan zanîn ku kaseyên wan vala bûn û krîza deynên dewletê pêşî li wan digire ku devê kîsê xwe vekin. Di dema civîna G8ê a li Dovîlê, di navbera 26 û 27ê gulana 2011ê de welatên herî dewlemend ên cîhanê bêguman soz dan ku di nav du salan de bîst mîlyar doları (çardeh mîlyar euroyan) bidin Misir û Tûnisê, lê belê ev mîqdara wan deynan e ku berîya şoreşê biryara wan hatibû dan. Herçî welatên ereb in, ew qet nalezînin ji bo ku alîkarîya cîranên xwe bikin yên ku ketine ser rêya zehmet a demokrasîyê. Tevî ku gencîneyeke wê ya şer a pir xurt a sedûpêncî mîlyar dolarî heye jî, Cezayîrê bi tenê deh milyon alîkarî dan Tûnisê: Ne tu tişt e. Em behsa projeya Bankeya Derya Spî jî nakin, ya ku ji sala 1995ê ve di kartonan de ye, ji alîyê YEyê ve di gulana 2011ê de bi awayekî teqez hat betal kirin. Bankeya Ewropî ya Pererazandinê (EIB) –ku wê ji niha heta bi sala 2013ê wê mîqdareke giştî ya şeş mîlyar dolaran pêşnîyar bike– û Bankeya Ewropî ya Jinûveavakirina û Pêşketinê (EBRD) ku wê li cem Fona Pereyan a Navneteweyî (IMF) û Bankeya Cîhanî, bibin sazîyên sereke yên kredîyê didin Tunisê. Berevajî rewşa piştî hilweşîna dîwarê Berlînê ya welatên Rojhilata Ewropayê, welatên Derya Spî yên ku di derbasbûna demokratîk de angaje ne, wê bankeyên "wan" ên jinûveavakirinê û pêşdebirinê ne li ber destên wan bin.

Li Tûnisê û herweha li Qahîreyê, li cihên ku hêvî dihat kirin "planeke bi rastî ya Marshall" lê dest pê bikin – referansa fînansmana jinûveavakirina Ewropayê ji alîyê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ve piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn– hêvî neman û tesîra wê pir bû. Tesîra vê nemana hêvîyê mezintir bû, lewra gelek aborîzanan rave kirin ku planeke bi vî rengî, mesrefa ku wê lê biçe jixwe li du mehên şerê li Iraqê diçe, yan jî %3yê hesabê yekbûna Almanyayê ya sala 1991ê ye. (2)

IMF û HDTê heman tiştê ku ji dîktatorîyan dixwest, ji demokrasîyên nûzayî jî dixwazin

Ji ber ku nikarin hêvîyê ji alîkarîyeke malî ya li gor pirsgirêkên aborî û civakî bikin, yên ku ew bi wan re rûbirû ne, Fona Pereyan a Navneteweyî (IMF) bi awayekî pir xurt hem Misrê û hem jî Tûnisê teşwîq dike di pêşîlêvekirina lîberal de bêtir pêşde biçe, ku rê li ber tehlûkeyê vedike ku ji bo fînanskirina pêşketina xwe serî li komên mezin ên navneteweyî bidin. Di çavên deyndayên fonên navneteweyî û şirketên pirneteweyî yên rojavayî de yên ku li başûrê Derya Spî bi cih bûne û hez dikin xwedîyên rehetîyeke mezin a çalakîyê bin, xwedîbûna opsîyona hevkarîyên dewlet-taybet (HDT) êdî hema hema weke çareserîya mûcîzane xuya dike. Prensîp çi ye? Şirketeke taybet wê li ser navê dewletê yan jî kolektîfên wê, ji bo demeke dîyar xizmeteke dewletê (av, enerjî, tenduristî ...) fînanse bike, ava bike, paşê sûdê jê wergire, bimije: Demî jî be taybetkirinek e, ku navê xwe eşkere nake. Bi vî rengî bi sînîzmeke ku ya wan bi xwe ye, sazîyên malî yên navneteweyî ji van demokrasîyên hê nû ji dayik dibin heman tişta ku wan berîya demeke kurt ji dîktatorîyan dixwest, dixwazin.

Ji destpêka salên 1990ê ve IMFê her ji **Husnî Mubarek** û **Zînelabidîn Bin Elî** [yê pêşî serokdewletê Misrê yê din jî serokdewletê Tûnisê bû] bêtir reformên aborî dixwestin, di nav van reforman de guhertîbûna tam a pereyên wan, "*başkirineke hawîrdora karsazîyê*" –maneya wê "ji bo muteşebîsên bîyanî afirandina bêtir derfetan" e–,bi awayekî bi lez û beztir vekişîna dewletê ji qada aborî û lîberalkirina xizmetên gelemperîyê hene. Bêyî ku ketina nav aborîya bazarê bixin ber lêpirsînê, dîktatorên ji textê desthilatdarîyê xistî dîqet dikirin û jê haydar bûn ku di mijara pêşîlêvekirinan de zêde gavan neavêjin, lewra wan pê dizanî mumkin bû ev yek newekhevîyên civakî xirabtir bike. Hukûmetên paşerojê yên bi awayekî demokratîk hatî hilbijartin, gelo ew ê serê xwe ji van daxwazên lîberalkirina aborî yên hê zêdetir re bitewînin? Gelo HDT bi rastî jî çareserî ne?

Li başûrê Derya Spî ev montaj ji bo derdorên karsazan û sazîyên navneteweyî weke amûreke destjê-nabe ya fînanskirina binesazîyê xuya dike. Bi ser de jî pirsgirêkên vê sîstemê nayên zanîn. Çawa ku *Les Echos* ew rave kiribû "*her diçe bêtir serî li hevkarîyên dewlet-taybet tê dayîn û vê sîstemê hê berdarîya xwe ya aborî îsbat nekiriye*". Rojnameya aborîyê ya fransî ji ber profesorê huqûqê yê zanîngeha Aix-Marseilleyê **François Lichère** digire û bi kabîneya parêzeran ji bo nivîsandina peymanên HDTyan dişêwire û weha bi ravekirina xwe de diçe: "*rîska malî li ser milê şirketên projeyê ye ku ji bo vê rewşa taybet ketine vî karî, ew ji sedî 90ê fonan deyn dikin. Ango ev amûr bi wî rengî ye ku dikare bi piştgirtina bankayan bawer bike* ". (3)

Ji bo bicihanîna HDTyê divê faîz kêm bin û rewşa bankeyan jî baş be

Ev şirove du xalên sedema şik û gumanê derdixe holê. Endîşeya pêşî rewşa sektora bankeyan e. Pêdivîya amûra HDTyê bi rêjeyên faîzê yên kêm heye û divê rewşa bankeyan jî baş be. Ya rastî ev herdu şert jî li Tûnis û Misrê pêk nayên û gelek sazî (banka) li van welatan xwedî deynên gumanbar in û ji bo beşdarîya montajeke malî ya tevlîhev, bisporîya wan a pêwîst nîne. (4) Endîşeya duyemîn elaqedarî kapasîteya pêkhênera gelemperîyê ye ka ew dikare berjewendîyên xwe –û yên welatîyan– misoger bike û ka hevkara taybet wezîfeya xwe baş bi rê ve dibe. Maneya vê ew e ku dewlet, kolektîfên herêmî yan jî tevahîya aktorên din ên dewlet û gelemperîyê divê xwedîyên jêhatîbûn û bisporîya pêwîst a ji bo şopandin û bipêşxistina HDTyan bin. Weke mînak li Fransayê di sektoreke mîna tedarîkkirina ava vexwarinê de, ferz e li ser şaredarîyan ku îsbat bikin ew hişyar in da ku nekin buhayên zêde li wan werin bar kirin û da ku neke ku operatorê taybet hukmên peymanî bi cih neyîne, hemûyan li ser ferz bike. (5) Bi awayekî zelal ji bo HDTyan divê dewlet ne bi tenê xurt û bi îstîqrar be, belê herweha jêhatî be, jê were ku çarçoveyeke huqûqî ya zexm bi pêş bixe û paşê birêvebirineke baş a wezîfeyê ya hevkarê xwe jî kontrol bike. Pirs ew e, em zanibin ka birêveberîyên siberojê yên tûnisî û misrî wê jêhatî bin yan na.

Waşîngtonê "sertîfîkaya demokrasîyê" weke xelat da Birayên Misilman, ji ber ew ji bo DYAyê hevgirên bikêrhatî ne

Gelo derfet û bijarteyeke din a aborî heye ku ne lîberalîzmeke bêserûber be û ne jî vegera li dîrîjîzma [sîstema dewletê ya bi her awayî rê dide ber aborîyê] berê be? Heke bersiv erê ye, partîyên siyasî-dînî wê vê derfetê neyînin pê. Çawa ku aborîzanê Misrî **Samir Amin** ev yek der barê Birayên Misilman de nîşan daye, îslamîzm pê razî ye li alîyê tezên lîberal û merkantîlîst cihê xwe bigire û berevajî fikra bi mirovan re çêkirî, bi tenê hindik elaqeyê nîşanî pirsgirêkên civakî dide. Samir Amin rave dike "*Birayên Misilman li sîstemekê aborî hatine zêde kirin ku xwe dispêre bazarê û bi tevahî girêdayî derve ye. Ya rastî ew hêmaneke bûrjûwazîya komprador in.* (6) *Ew li dijî grevên mezin ên çîna karker û şerê cotkar û gundîyan ên ji bo parastina milk û erdên xwe jî bûn* [nexasim di nav van deh salên dawîyê de].*Birayên Misilman ne bi tenê bi du alîyan "nerm" in bi awayê ku wan timî red kir bi rengekî bernameyeke aborî û civakî îfade bikin (ya rastî ew siyasetên neolîberal ên paşverû naxin ber lêpirsînê) û ew* de facto *serîtewandina li ber daxwazên belavkirina kontrola Dewletên Yekbûyî li dinyayê û li herêmê qebûl dikin. Ango ew ji bo Waşîngtonê hevgirên bikêrhatî ne (ma gelo ji Erebistana Suûdîyê baştir ku hamîya Birayên Misilman e, hevgireke Dewletên Yekbûyî heye?), jixwe Waşîngtonê "sertîfîkayeke demokrasîyê" jî weke xelat da wan!"* (7)

Sereqet behsa kirinên alîkarîyê yên pêkhatîyên îslamîst tê kirin; hatiye ji bîr kirin ku ev îslamîst nîzameke qerisî diparêzin û ew red dikin ku li siyasetên ji bo kêmkirina xizanîyê û newekhevîyên civakî bifikirin, yan jî wan bi pêş bixin. Bi heman awayî îslamîzma siyasî meyldar e, siyasetên neolîberal teşwîq bike û li dijî tevahîya siyaseta bi rêya bacan ji nû ve dabeşkirinê ye û vê yekê weke nedînî dibîne. Zekat îstîsna ye, ango zekata huqûqî û bi qanûnan dîyarkirî –zekat yek ji pênc ruknên Îslamê ye. Ev yek jî rave dike ka çima îslamîstan qet hewl neda xwe nêzî tevgerên li dijî globalîzmê nekirine. Jixwe pirî caran ew wan weke rengekî nû yê komûnîzmê dibînin. Em dikarin niha ferzî mîsal bibêjin heta ku ew ji bo hîmê demokrasîyê bi xwe nebin tehlûkeyek, partîyên îslamî yên xurt şoreşeke mezin di siyaseta aborîya welatên navbirî de pêk nayînin.

Tûnis û Misir niha bi wê rewşê re rûbirû ne ku li vê "rêya sêyem" a navdar digerin, ku ji welatên kevnebloka Sovyetan nehat piştî hilweşîna dîwarê Berlînê pêk bînin. Mesele ew e ku pêşî lê were girtin ku şoreşên gel ciheki ji kapîtalîzmeke fetihkar re veneke, ku wê hevgirîya civakî ya civakên misrî û tûnisî bixe ber lêpirsînê. Ji bo pêşî li vê kapîtalîzma fetihkar were girtin, divê siyasetên aborî civakê û kêmkirina newekhevîyan derxin pêş.

*Rojnamevan, nivîskarê *Etre arabe aujourd'hui (mirov îro ereb be)*, Carnets Nord, Parîs, 2011

RÊDÎ SEÎD TOPRAK: **Gêrikên hesin**, li ser kaxizê hibir, 50 x 70 cm

1 Di nan wan de aborîzan George Corm, Jean-Marie Chevalier, Daniel Cohen û El Mouhoub Mouhoud, kevne-wezîrên karên derve Hervé de Charette û Hubert Védrine û heta parlemanter Elisabeth Guigou û Denis McShane hene

2 "Un plan économique pour soutenir la transition démo-cratique en Tunisie (Planeke aborî ji bo destekkirina derbas-bûna demokratîk a Tûnisê)", Le monde, 18ê gulana 2011ê

3 Catherine Sabbah, "Partenariat public-privé: un mauvais outil de relance (Hevkarîya dewlet-taybet: Amûrekî xirab vedije)", *Les Echos,* 15ê nîsana 2010ê

4 Der barê rewşa sektora bankeyan li başûrê Derya Spî de, *bigire li ber* nota lêkolînê ya Guillaume Almeras û Abderah-mane Hadj-Nacer (bi hevkarîya Isabelle Chort), "L'espace financier euro-méditeranéen (Qada malî ya euro-Derya Spî)", Les Notes Ipemed, çirîya pêşî ya 2009ê, www.ipemed.coop

5 *Bigire li ber* Marc Laimé, *Le Dossier de l'eau; pénurie, pollution, coruption (Dosya avê, xela, qirêjbûn, bertîlxurî),* Le Seuil, Parîs, 2003

6 Peyva "bûrjûwazîya *komprador*" wê çînê terîf dike ku hatina xwe ya maddî ji bazirganîya bi derve re, nexasim jî bi rêya karûbarên îthal û îxrackirinê bi dest dixe, yan jî bi tenê îthal dike, çawa ku li gelek welatên ereb (Cezayîr, Erebîstana Suûdîyê, Lîbya ...) tê dîtin. Bandora vê kategorîya aborî ewqas e ku ew pêşîyê li bipêşketina çalakîyên aborî yên nav welêt digirin, yên ku mumkin bû bi malên wê yên îthal re reqabetê bikin

7 Samir Amin, "2011: le printemps arabe? Réflexions égyptiennes (2011: Bihara erebî? Hizirînên misrî)", 24ê gulana 2011ê, www.europe-solidaire.org

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Gava ku leşker qanûna bêdengîyê dişkînin

MERON RAPOPORT *

Ez dê ji we re bibêjim ka kengî ez jidil tirsiyam. Me li Xezayê operasyonek pêk dianî; em li pişt barîkadeke leşkerî bûn û zarok ber bi me de hatin û dest pê kirin kevir avêtine me. Li gor telîmatan, gava ew [filistînîyek] *li devereke be ku bikare keviran bavêje me, herwiha dikare narincokekê jî li me bide; lewma min li wî reşand. 12 an jî 15 salî bû. Bawer nakim ku min ew kuştibe, hewl didim, xwe qanih bikim* [ku min ew nekuştiye] *da wijdanê min rihet be, da bikaribim bi şevan baştir razêm. Ez têk çûm gava bi xapexap hatim da ji hevalên xwe û malbata xwe re bibêjim ku min* [bi çekekê] *nîşan li yekî girtibû û ku min di par re guleyek li lingê wî dabû,. Ew hemû xweşhal bûn: Ez bûme qehreman û wan li sînagogê serhatîya min hemû belav kirin. Ê min, ez mabûm di şok û heyra kiryara xwe de."* (1)

Primo Levi di kitêba xwe ya bi serenavê *Si c'est un homme* (2) de dikeve bîra xewneke xwe ya li Auşwîtzê ku heman xewnê çendîn caran dibîne –paşê fêr bûbû ku hejmareke gelek a zindanîyan heman kabûs didîtin. [Di xewna xwe de] vedigere mala xwe, cem malbata xwe û wehşeta li kampê ji wan re tarîf dikir, lê kesî guh nedida wî: Herkes ji ser maseyê radibûn û diçûn, ew bi tenê dihiştin. Wî dixwast tiştinan bibêje, çîroka xwe bibêje, lê belê ne kesekî guh didayê, ne jî wan ew fam dikir.

Xeza ne Auşwîtz e û eskerên ku şahidî li *Occupation of the Territories* kirin ne filitîyên Şoayê ne. Lê belê, wek **Primo Levi**, wan jî hest bi pêdivîya gotina çîroka xwe kir, lê kesên derdora wan guh nedane çîroka wan, ew ji xwe re wek tehdîdekê dîtin.

"Ev dîroka nifşekî ye, dîroka nifşê me"

Guhdarên wan bêtir hewl dan çîroka wan jinûve û li gor xwe şirove bikin, wê wergerînin ser peyvên nasyar û xwemalî û wê bixin nav şemayên ku jixwe nasyar bûn ji dîmenên Xezayê, yên Şerîaya Rojava, li pişt dîwarî, li pişt *checkpoint*ên nû ku ji bendên leşkerê îşxalê zêdetir dişibin baregehên hidûdên navneteweyî. *"Ma dayik û bavên vî eskerî dikarin ji kurê xwe re çi bibêjin?",* dipirse Avihai Stolerê kevne eskerê ku çendîn çîrokên şerî di kitêbekê de berhev kirine. Jê re bibêjin, *"Xwe aciz neke kurê min:Te zarokek kuşt, qey çi bûye?"* Stoler dîyar dike ku *"dayik û bav naxwazin bala xwe bidin dudilî û xema wî."*

Occupation of the Territories (3) berhevokeke serhatîyên çendîn eskeran (mêr û jin) e ku ji dema destpêka Întîfadaya duyem ya sala 2000ê, li Şerîaya Rojava û li Xezayê di beşên cihê yên artêşa Îsraîlê de xizmeta eskerî kirine. Ev xebat berhema herî temam û tekûz e li ser *modus operandi*ya [awayê xebitînê] îsraîlî li deverên dagirkirî. Di kitêbê de tu aşkerakirineke biryarên li pileyên bilind an jî li kûlîsan hatî girtin nîne, lê belê çend çavdêrî û tecrûbe li ser heqîqeta req û rojane ya kontrola eskerî hene; li ser xane û qadên filistînîyan, li ser cade û kolanên wan, li ser hertişt û zemanên wan, li ser jîn û mirina her yek ji şênîyên Şerîaya Rojava û Xezayê.

Bi pêy serkanîyên pêbawer, van deh salên dawîyê çil heta şêst milyon îsraîlî beşdarîya yekîneyên şerî kirine. (4) Ji bo vê kitêbê bi tenê digel heftsed û pênceh ji wan mulaqat hatine kirin. Ferz bikin ku hemû ev eskerên şervan demekê ji deman derbas bûne ser deverên îşxalkirî (ku tê heye ev yek di nav eskerên artêşa hewayî û deryayî de ne wisa be), derdikeve ku ji sedî 1 heta 2 ji wan, serhatîyên xerab û xemgîn ragihandine. Bi vê rêjeyê nimûneyeke girîng e, rêjeyeke gelek bilindtir ji ya ku bo anketa lêkolîneke akademîk pêdivî ye. Her kesek azad e encamên nivîseran red bike û bawer bike ku kontrola hişk a li ser hemû alîyên jîyana filistînîyan xaleke esasî ye ji bo ewleyîya Îsraîlê; lê belê tu kes nikare red bike ku li wir rewş wisa ye.

Koma bi navê ***Shovrim Shtika*** (*Bêdengîyê bişkîne*) sala 2004ê ji layê çend kevne eskeran ve hate danîn ku di nav refên Hebronê de xizmeta eskerî kiribûn û dilxwaz bûn îşxalê bi pêy dîtina xwe nîşan bidin. Pêşîyê wan xwest bi qasî ku mumkin e çîrokên şokker berhev bikin. Kiryarên berbelav ên wek eskerên ku filistînîyên mirî ser jê kiribûn û eskerên ku bi lûleya tivinga xwe serê kuştîyan ba dikirin, bûne mijara serekî ya behsan. Lê belê, digel lehîya serhatîyan, daneran fam kir ku mesele ne ew bû ku nimûneyên bêhed zalimane û barbarî raxin ber çavan. Michel Menkinê yek ji danerên komê dîyar dike, *"Eskerê ku li checkpointê bi pîremêrekî re xerabkarîyê dike ne xema me ye. Em bêhtir dixwazin behsa eskerê li pişt wî bikin, ango behsa eskerê normal bikin."*

Serhatî û şahidî bi hûrgilî behsa zordarîyên dane kişandin dikin, behsa şideta belasebeb û kuştinên keyfî dikin ku carinan dikevin nav tawanên şerî: Kêmendamekî eqlî yê hingaftî û di nav xwînê de; rêwîyên ku hatine şandin bo serê mînareyê ji bo teqandina nesneyên gumanbar ku robot bi xwe nagihîjê. Çîroka kuştina mirovekî bêçek heye di kitêbê de ku tenê sûcê wî hilkişîyana ser banî bû *(Hûn îro ji min dipirsin ka min çima ew kuşt? Bes ji ber zextan, min nema karî li ber zextên yên din li ber xwe bidim"*, dibêje eskerek). Hêj xerabtir qetla amadekirî, hetta înfaza polîsên filistînî yên bêçek, ji bo vekirina tola êrîşeke bi ser *checkpoint*eke cîran. Wiha ye fermana pilebilindekî li ser awayê hereketkirina beramber qaşo-terorîstekî ku bi erdê ve vezelîyaye, êdî çi birîndar be çi mirî be: *"Hûn nêzîkî termekî dibin, hûn çekê xwe li hindava navbera didanên wî radigirin û hûn lê direşînin."* Û çendîn sehneyên dizîyê, talan an jî rûxandina dezgeh û tirimbêlan.

Avishai Stoler dîyar dike, *"Ev ne 'horror showeke Tsahal'ê ye. Ev çîroka neslekî ye, ya neslê me ye."* Sê dehsalên piştî şerê 1967ê, pareke mezin a munaqeşeyan li Îsraîlê li ser pêdivîtî an jî li ser barbarîya dagirkirinê bûn. Ji hingê ve, ev peyv hema bibêje bi yekcarî winda bû. Ji bo destnîşankirina deverên filistînî, îsraîlîyek texer dibêje "Jude", "Samarî", "Şerîaya Rojava" an jî "dever", lê tu carî nabêje "deverên îşxalkirî". Terma "dagirkirin"ê hema bûye tabû, peyveke xerab, ku divê tu cara di nav cemaetê de neyê telafûz kirin. Min bi xwe di çarçoveya xebata xwe de ev yek dît; gava ku min bernameyeke televîzyonê amade dikir, yek ji mêvanan piştrast kir ku di nav cemawerê Îsraîlê de xuşûnet her ku diçû xerabtir lêdihat, *"ji ber dagirkirinê"*. Welwele û şêlûbêlek kete nav hevkarên min ên li rejîyê û lava kirin, *"bêje pêşkêşvanî bila ji mêvanê xwe rica bike ku gotina xwe vekêşe."*

Çend sedemên cuda vê rewşê rave dikin. Berî her tiştî, bi ya îsraîlîyan, êrişên xwekujî yên Întîfadaya duyem destûrê dide artêşa Îsraîlê da ku "terorîzmê binbir bike". Li alîyê din, "proseya aştîyê", bênîhayet û bênetîce, dagerîyaye cûreke "fon muzîk"ê li ser sehneya qada giştî, ku proseyê bi du awayên dijber tesîr li qada giştî kir. Li alîyekî, îsraîlî nema hest bi acîlîyeta çareserkirina dubendîyê dikir, lewre dubendî jixwe hatibû safî kirin gava ku me îsraîlîyan qebûl kiribû ku deverên wan ji wan re bihêlin, çareserîyeke du dewletî bidin ber xwe û mafê dîyarkirina çarenivîsa xwe bidin filistînîyan. Nahum Barneayê goşe-nivîserê herî xwedan tesîr ê Îsraîlê, heyamên dawî di nivîsareke xwe de dîyar kir ku *"meseleya deveran qedîya"***.** Li rexê xwe, heftenameya emerîkayî *Time*ê jî serenavê "çima Îsraîl tinazên xwe bi aştîyê dike" dabû hejmara xwe ya îlona 2010ê. (5)

Siyaseta bêzarkirina filistîniyan

Bi ser van daneyên siyasî de, em ê behsa faktoreke girîng a eskerî jî bikin. Ji dema destpêka Întîfadaya duyem û hêj bêtir piştî avakirina dîwarê jihevveqetandinê, kontrola eskerî ya li ser filistînîyan zêdetir rêbazî, sîstematîk û zêdetir "zanistî" lêhat. *Occupation of the Territories* hewl dide wan rêbazan tehlîl bike û jargona ku esker di kar û çalakîyên xwe de bi kar tînin, raxe ber çavan. *Koma Bêdengîyê Bişkîne* zorê dide xwe ku li ser bingeha hemû serhatîyên berhevkirî term û gotinên bi heqîqetê re hevahengtir peyda bike. Bi gotinên wan, çêtir e bibêjin *"berbelavbûna tirsê di nav xelkî de"* li şûna *"tedbîrên berbendkirinê li dijî terorîzmê"* li Şerîaya Rojava û Xezayê; şûna jihevveqetandinê*"* çêtir e bibêjin *"xwemalî kirin û îlhaq kirin"*; çêtir e şûna *"qumaşê zindî"* bibêjin *"kontrola hemû alîyên jîyana filistînîyan"* (*"Life Fabric"*, gotineke leşkerî ku tora rêyên li cihwarên xelkê filistînî derbas dibin, dest nîşan dike); çêtir e şûna *"kontrolê"* bibêjin *"dagirkirin"*.

"Hejmara termên terorîstan, biserketina çalakîyê" û bextreşên dîrokê

"Wezîfeya me acîzkirina –ev bû peyva hatî bi kar anîn- jîyana hemwelatîyan û zordarî bû" dibêje yek ji eskerên beşdarên mulaqatan û pê de diçe: *"Tarîfa wezîfeya me ev bû, ji ber ku terorîst hemwelatî ne û me divîya em çalakîyên wan xerab bikin, ji bo vê yekê jî divîya me zulm li wan bikira û daîmî ew nerihet bikirana. Ez baş bi vê yekê dizanim û bawer dikim ku îro jî mentiqê wan her wiha ye, heke ferman nehatibine guhertin".* Ev serhatî û şahidî fêrî me dikin ku xerabkirina huzûr û şêwe-jîyana xelkî û zulma li xelkê herêmê tê kirin, ne tenê berhema nezanî û bedreftarîyê bû (herçend ev jî tê de hebûn): Dîyar e ev kiryarên zalimane bi xwe kilîda rêvebirina dagirkirina Şerîaya Rojava û Xezayê bûne. *"Heke gund hêlîna çalakîyan be, hûn dê xewê li gundîyan biherimînin."*

Avihai Stoler nêzîkî sê salan li herêma Hebronê ma. Li wê derê, berê wî ket nav eskerên ku bombe diavêtin navenda gundekî *"da ku bizanin ku em li vir in"*. "Dewrîyeya bidengedeng", "Dewrîyeya xeşîm", "Nîşandana hebûna leşkeran", "Çalakîya vedizî", "Pourim pîroz be", wiha ne termên ku şêwe çalakîyeke tekane û rojane ta`rîf dikin: Bi darê zorê têketina nav gund an bajarekî, avêtina narincokan, danîna *checkpoint*an li her çi wext an ciheki, bi rengekî keyfî lêgerîna nav malan û li vir mana bi saetan an jî bi rojan, *"duristkirina hesta zulm û zorîyê* [li nav filistînîyan] *da ku tu caran rihetîyê nebînin".* Wiha bûn fermanên ku divîyabû Stoler bi cih bîne.

Rûyê rastî yê kesên ku em dîl girtine, rûyê me bixwe ye

Stoler û Avner Gvaryahu di yekîneyeke elîtan de bûn ku çalakîyên wan, bi gotinên pilebilindekî, bi pey hejmara termên terorîstên mirî dihatin nirxandin. Herdu jî gazindan dikin ku civak naxwaze guh bide gotinên wan. Tu kanaleke televîzyona îsraîlî nehat civîna danezana derçûna kitêba wan; bes organên medyaya bîyanî hazir bûn, ku ev yek dihêle mirov bikeve gumanan, qey ponijîn û xemgînîya eskerên îsraîlî bi tenê japonî û awustralîyan elaqedar dike. Gvaryahu dîyar dike:*"Bavê min ji neslê duyê yê Şoayê ye. Bi ya wî, mezlûm û bextreşên tarîxê em in.*

Tevî van rastîyan, seyr e, Stoler û Gvaryahu hêj gelek geşbîn in: Civak dê dawîya dawî fam bike ka çi ye li ser navê wê tê kirin û dê veguhere. Ji ber ku ya ku divê biguhere civak bi xwe ye, ne artêş e. Tê bîra Stoler ku, *"rojnamegereke kolombîyayî mulaqatek bi min re kiribû. Wê ji min pirsîbû bê ka çima ev kiryar dibûn kêşe. Li Kolombîyayê, esker herroj di nav bêxemîyeke tekmîl de serhildêran ser jê dikin,. Lê belê, ez bawer dikim civaka îsraîlî dixwaze heta dereceyekê exlaqê bi xwe re ragire. Ev e ya ku me ber bi pêş dehf dide; bêyî wê vîna cemawerî, hewl û kiryarên me bêmane ne."*

Gvaryahu piştrast dike, *"civaka îsraîlî hatibû dîl girtin. Menfaetên kesên ku em dîl girtine cuda ne ji menfaetên me, lê belê em êdî aşiqî wan bûne, heçko em ketibin ber tesîra sendroma Stockholmê. Hêsan e mirov ji bo tawanbarkirina bi van gunehan rûyê maşik û berpirsên nedîyar peyda bike; lê belê bawerîya min bi vê nayê. Rûyê rastî yê kesên ku em dîl girtine, rûyê me bi xwe ye."*

* Rojnamegerê *Haaretz*ê, Tel-Aviv.

1 *Occupation of the Territories*, beş 1, serhatî 45, Shovrim Shtika (Bêdengîyê Bişkîne), Israël, 2010

2 Primo Levi, *Si c'est un homme* (1947), Pocket, Paris, 1988

3 Bnr. www.breakingthesilence.org.il

4 Îsraîl tu daneyên resmî derheqê hêzên xwe yên çekdar de çap nake. Sala 2004ê, l'International Institute for Strategic Studies ya li Londonê dîyar kir ku di artêşa nizamî ya Îsraîlê de 85 000 esker hene. % 10 heta % 15ê wan şervan in; ango qederê 10 000 heta 15 000 ji wan şervan in. Xizmeta eskerî sê salan dewam dike. Her sal 3 000 heta 5 000 şervan xizmeta eskerî temam dikin û ewqas jî dîsa bo eskerîyê têne wergirtin. Texmîn ew e ku 40 000 heta 60 000 eskerên îsraîlî xizmeta xwe li deverên îşxalkirî kiriye. www.globalsecurity.org/military/world/israel/army.htm

5 "Why Israel doesn't care about peace", *Time Magazine*, New York, 13 îlon 2010

Wergera ji fransî: Ergîn Opengîn

RÊDÎ SEÎD TOPRAK: **Komwêneyên binxetê I**, li ser tuwalê teknîka tevlîhev, 120 x 140 cm

Ji bo xweparastina ji roketên dijmin, "berbaraneke" dij-fuze? Projeya Îsraîlê ya bi navê "Kembera Hesinî" "Kîpat Barzel" bi vî rengî ye; ev proje divê di destpêkê de bi du bataryayan ji îsal û pê ve operasyonel be. Ev "Kembera Hesinî" divê pêşîyê li roketên menzîlkurt weke yên ku komên filistînî ji Xezayê û Hîzbullahê ji Libnanê avêtin, bigire.

Îsraîl xwe vedikişîne pişt mertalekî dij-fuzeyan

LAURENT CHECOLA Û EDOUARD PFLIMLIN*

Kembera Hesinî" ji alîyê şîrketa îsraîlî *Rafael Advanced Defence System*-sê ve hatiye pêş xistin. Projeya mertalê dij-fuze ya îsraîlî xwe dispêre fuzeyên piçûk ên ku bi radarê ve girêdayî dixebitin, ne bi tenê roketên menzîla wan gelekî kurt, menzîleke ji çar kîlometre heta bi heftê kîlometreyî, herweha topên obus û hawanan jî hê li hewayê tine dikin. Ev sîstem li dijî fuzeyên *katyûşa* yên ku menzîla wan ji 30 kîlometreyan hindiktir e, mezinahîya wan 122 mm ye û ji Hîzbullahê hatine bi dest xistin, bi awayekî serkeftî hatiye ceribandin.

Li gor wezareta parastinê her du bataryayên pêşî wê li ser kamyonan werin bi cih kirin û bi hêsanî li ser sînorekî Îsraîlê werin bi kar anîn. Piştî tesbîtkirina fuzeyên dikarin bigihêjin erdên Îsraîlê, sîstem dikare di heman demê de rê li ber gelek fuze yan jî roketan bigire. Bataryayeke bi serê xwe, wê têrê bike ku bajarekî başûrê Îsraîlê yê mîna Aşkelonê (hejmara şêniyan 100 000 e) bi awayekî bikêrhatî biparêze. Armanca sereke: bikaranîna tesîsê nêzî Xezaya ku Hamas lê desthilatdar e. Paşê bicihkirina tesîsê li hemberî Libnanê, cihê ku li gor texmînên îstîxbarata eskerî ya Îsraîlê, Hîzbullahê lê di cebilxaneyên xwe de çil hezar roket kom kirine.

Ev bikaranîn di nava karûbarekî parastinê ya "pirsinifî" de pêk tê. Li gor peymaneke îlona sala 2010ê di navbera Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Îsraîlê de hat mohr kirin, sîstemeke bi navê "çovê efsûnî" û herweha fuzeya wê ya bi navê "Mencenîqa Dawid" ("Kala David") wê werin bi pêş xistin, ev bersivek e li dijî fuzeyên menzîlkurt (ji 70 kîlometreyî bêhtir û ji 250 kîlometreyî hindiktir), li dijî roketên menzîldirêj û kalîbre mezin (giranîya yên herî giran wê bigihêje nîv tonê) û li dijî fuzeyan ku ji keştîyan tên avêtin. Eyarkirina tesbîtkarê fuzeyan "Stunner" jî dikeve nav vê peymanê. "Stunner" ji alîyê Rafael a îsraîlî û Raytheon a amerîkî bi hev re tê sêwirandin.

Sîstema *Arrow* ("tîr" yan jî bi îbranî "Hetz") a ku ji sala 2000ê ve operasyonel e, Îsraîlê ji fuzeyên balîstîk ên ku menzîla wan di ser 250 kîlometreyî re ye, diparêze. Waşhington nîvê lêçûnên salane dide. Bernameya *Arrow-II* ji alîyê *Boeing* û *Israel Aerospace Industries* (IAI) ve ji sala 1995ê û pê ve hat pêş xistin, ji bo ku fuzeyên balîstîk ên menzîla wan dirêjtir, nexasim yên îranî (menzîla wan ji 1 600 kîlometreyî dibihure) bê tesîr bike. Di dawîyê de Tel-Avîv a ji êrîşeke nukleer a Tehranê ditirse, hewl da ku fuzeşkêneke li bilindtir û menzîldirêjtir bi kêr tê, bi pêş bixe: *Arrow-III*. Di çirîya pêşî ya sala 2007ê de Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Îsraîlê komîteyeke têkel saz kirin da ku konsepsîyona sipartî *Israel Aerospace Industries* û *Boeing*ê misoger bike. *Arrow-III* ya ku sala 2008ê dest pê kir, ji bo şûna bikaranîna sala 2014ê, dikare îsal were ceribandin. Bi bernameyên din ên cur bi cur re Pentagon wê bi giştî 422,7 mîlyon dolaran bi pergalên cihê yên dij-fuze yên Îsraîlê (1) bide. Ev mîqdar li 3 mîlyar dolarên salane ya alîkarîya eskerî ya amerîkî zêde dibe.

RÊDÎ SEÎD TOPRAK: **Komwêneyên binxetê II**, li ser tuwalê teknîka tevlîhev, 120 x 140 cm

Şerê havîna sala 2006ê yê li dijî Hizbullahê û yê di salên 2008-2009ê de li Xezayê li dijî Hemasê, rewabûneke pêkanîna van mertalan bi taybetî jî yê "Kembera Hesinî", xist destê rayedarên îsraîlî. Di dema van şeran de hin bajarên Îsraîlê bi barandina roketan re rû bi rû mabûn. Di havîna 2006ê de şervanên şîî yên bakurê Îsraîlê û kirin ku milyonek şênîyên deverê bitirsin, yan xwe li stargehan biparêzin yan jî ber bi başûr ve birevin. Para wan a bêhtir roketên tîpa *Qessam* û *Katyûşa* yên ku bi destan bi malzemeyên besîd –nîtrata potasyûmê, şekir, zibil ...– di dezgehên qaç de têne çêkirin, di 2008-2009ê de ji Xezayê bi hezaran roket hatin avêtin.

Dîsa jî gelo sîstemeke parastinê ya bi vî rengî wê bikêrhatî be? Di salên 1980yê de li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê jî di çarçoveya Înîsiyatîva Parastinê ya Stratejîk (ÎPS) de ya ku hê bêhtir bi navê "şerê stêrkan" (2) navdar e, ev pirs hatibû kirin. Bersiv dikare heman bersiv be: sîstemên bi tevahî bêqisûr, nînin.

Di serî de yên îsraîlî, gelek bispor weha hizir dikin ku kêmasîyeke mezin a zirxê "Kembera Hesinî" heye: nêzîkbûna sînor a bajarên mîna Sderotê. Bisporê fuzeyên balîstîk ê îsraîlî Reuven Pedazur ji me re weha rave dike "*Tevî ku Qessamên avêtî Sderotê nisbî hêdî ne jî, Hemasê bi taybetî jî di dema operasyona 'risasa darijandî'* [şerê ku Îsraîlê di navbera kanûna 2008 û çileyê 2009ê de li dijî Xezayê bi rê ve birî] *de roketên Qessam ên nifşê sêyem û Grad avêtin. Ev du yan jî sê caran ji modelên kevin bileztir in*". Bi çil hezar roketên ku wê bi Hizbullah re hebin, tehlûkeya ku parastina Îsraîlê pê re negihîne jî, ne derveyî îhtîmalan e. Serredaktorê kovara parastinê DSIyê ya ku di parastina dij-fuze de bispor e, Joseph Henrotin vê îdîayê dike "*Ev îhtîmaleke rastî ye û ev pirsgirêka sîstemên dij-fuze/dij-roket hemûyan e. Tevî performansê jî hejmar bi serê xwe avantajek e û parastina bi fuzeşkêna, serê fuzeyekê buha ye, belê çi yên Hizbullahê û çi jî yên komên şervanên filistînî bin, roket erzan in û bi hêsanî tên peyda kirin*". Buhayê her fuzeya Tamir li ser Îsraîlê 100 000 dolaran dibe mal, li hemberî vê çend sed dolar li roketeke Qessam diçin.

Weke ku rojnameya îsraîlî *Haaretz* (3) radigihîne "*biryara pêşxistina 'Kembera Hesinî' weha xuya ye ji destpêkê ve hewldanek e, da ku karê zanyarên Rafaelê were parastin û da ku wê valahîyê dagire ya ku ji ber rawestandina lêkolîn û pêşxistina ji bo sîstema Arrowê ya şîrketa Israel Aerospace Industries bi pêş xistî, derket holê. Ravekirineke din dibêje ku şîrketa parastinê Rafael nikarîbû pereyan li L&P* [Lêkolîn û Pêşxistinê] *razîne, lewra qismî ji alîyê welatekî asyayî ve yê ku navê wê nayê eşkerekirin, tê fînans kirin*". Li gor malpera bispor *Intelligence Online* ev welat Sîngapûr e.

Lê belê argumana ji bo pêşxistina sîstemeke bi vî rengî, çiqasî eskerî be, ewqasî jî siyasî ye. Wezîrê parastinê Ehûd Barak weha hizir dikir ku di rewşa vekişîna ji Şerîa Rojavayê de, di çarçoveya peymaneke aştîyê ya bi filistînîyan re, "Kembera Hesinî" dikare weke garantîyeke bawerîyê bide wan, were nîşan dan. Joseph Henrotin weha îşaret bi vê dike "*van salên dawîyê avêtina roketan li Îsraîlê veguherî mijareke rastî ya nîqaşên siyasî û sîstemên behsa wan tê kirin jî nûnerîya bersiveke xwezayî dikin (...). Sîstem ne ji bo "dorgirtina" li Îsraîlê ye, belê ji bo ku karibe wê bixe pozîsyoneke xurttir e*. 'Binihêrin, bi vê sîstemê û bi yên din *[blokada deryayî, dîwarê ewlekarîyê, kontrola bi kamerayan û hwd.]* hûn êdî nikarin tiştekî bi me bikin. Êdî şertên me qebûl bikin' *awayê vê xurtbûnê ye*".

Bispor van peyvên jêr li gotinên xwe zêde dike: "*Bi her halî, nabe ku Barak weke generalekî baş, ya ku general Desportes weke 'qanûna lidorgeranê' bi nav dike, nebîne: dema ku hûn dorê li dijberê xwe digrin da ku nikaribe amûrên xwe bi awayekî bikêrhatî bi kar bîne –weke mînak roket– ew hingî awayên din ên çalakîyan dibîne. Şer dîalektîkek e û him filistînîyan û him jî Hizbullahê, jêhatîbûna xwe ya adaptasyona taktîk, operasyonel û stratejîk, nîşan dane. Bi tenê heke çareserîyeke siyasî pêk were pirsgirêk hingî wê li devereke din aktuel be...*".

Destpêka meha kanûna pêşî ya bihurî, di dema guftûgoyeke li zanîngeha Hayfa de berpirsiyarekî artêşa Îsraîlê Gadi Eizenkot dida zanîn ku ev "*sîstem ji bo parastina baregehên eskerî hatine sêwirandin, maneya vê ew be jî ku di rojên pêşî yê şer de welatî wê bi rewşên zehmet re rû bi rû bibin*. (4)

Li alîyê din, stratejîya parêzer a "kemberê" li bin guhê meyileke artêşa Îsraîlê dikeve, lewma artêş timî hewl dide kapasîteyên xwe yên êrîşê xurt bike, bi taybetî jî êrîşên ku armanca wan ew e bi bombeyên gelekî hesas, fuze û roketên menzîldirêj ên dijminê xwe –bi mezinahîya wan yan jî di dema pêvajoya avêtinê de tesbît bike– tune bike. Der barê roketên menzîlkurt de jî Fermandarîya Giştî alternatîva êrîşê tercîh dike; vê jî bi operasyonên bejahîyê dike ku armanca wan devera avêtina roketan e. (5)

Bicihkirina "Kembera Hesinî" nakokîyên siyaseta Waşîngtonê jî piştrast dike. Tevî ku hevnegirtinên di navbera herdu paytextan de zêde dibin jî, serokê DYAyê Barack Obama ji Kongreyê xwest ku 205 milyon doleran serbest berde da ku destekê bide avakirina tesîsê. Meclîsa Nûneran 8ê kanûna pêşî ya 2010ê roja çarşemê qebûla vê alîkarîya ji bo bernameyeke ku ji sala 2007ê de 210 milyon dolar lê çûne, erê kir.

Awayê alîkarîya qet kêmnebûyî ya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê dayî avakirina parastina dij-fuze ya Îsraîlê: bicihkirina radarên banda X AN/TPY-2 ya ji alîyê *Raytheon*ê ve dawîya sala 2008ê li Îsraîlê hatî çêkirin. Ev radar ne ku bi tenê ji radarên herêmî di tesbîtkirina fuzeyên dijminan de xurttir e, lê belê ew herweha girêdayî tevna global a satelîtan a *Defense Support Program* e. Ev bername, hêmanê sereke yê sîstema amerîkî ya tesbîtkirina pêşketî ya avêtina fuzeyan e.

Kokên vê hevkarîyê xwe berdidin heta bi sala 1996ê. Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Îsraîlê bi hev re bernameyeke dij-roketan a bi navê "Tactical High Energy Laser (THEL)" fînanse kirin. Lê piştî perarazandinan ku texmînî di navbera 300 û 400 milyon dolaran de lê çû, proje nîvçe hat hiştin. Pedazur dîsa jî texmîn dike ku tîreke lazerê wê ji fuzeyeke ji alîyê "Kembera Hesinî" hatî avêtin, erzantir bûya: ango bi tenê 3 000 dolar wê lê biçûna. Herçend şîrketa amerîkî Northrop Grummanê versîyoneke pêşdebirî ya THELê ya bi navê "Skyguard" çêkir jî, bername sala 2005ê bi awayekî vebirî nîvçe hat hiştin. Li gor rayedarên Îsraîlê tesîs hê jî têra xwe bikêrhatî nebû. (6)

Encamên siyasî yên "herêmî" û navneteweyî yên vê projeyê çi ne? Henrotin îşaret pê dike û dibêje "*Ya rastî, ji bilî çend îstîsnayan, welatên ereb ên cîran pêşxistina kapasîteyên bi vî rengî weke hindiktir bi tehlûke dibînin, lewra ji bo parastinê ne.*" Dîsa jî ev ê bes nebe ku bike dijberên Îsraîlê êdî roketan neavêjin bajarên li bakur ên mîna Hayfayê û bajarên li başûr ên mîna Sderotê. Divê bi giringî îşaret pê were kirin ku aştî ne li ser hîmê teknolojîya eskerî ava ye, bila ev teknolojî weke ya "Kembera Hesinî" gelekî pêşketî jî be. Aştî encama biryar û peymanên siyasî ye. Weha xuya ye ku bi dewamkirina avakirina wargehên cihûyan ango kolonîyan, Îsraîl hewl nade bikeve ser vê riyê.

* Rojnamevan

1 Israel Valley, www.israelvalley.com/news/2010/09/29/28769

2 Bixwînin "La 'guerre des étoiles' descend sur terre", Le Monde diplomatique, tîrmeh1986

3 Yossi Melman, "Robbing Sderot of defense from rockets", Haaretz, Jérusalem, 4ê sibata 2010

4 Jerusalem Post, 1ê çileya pêşîn 2010

5 Ron Ben-Yishai, "Missile shield: Is Israel safe?", Y-net, Jérusalem, 22 tîrmeh 2010

6 "U.S. and Israel Shelved Laser As a Defense", New York Times, 30 tîrmeh 2006; et le rapport du Congressional Resarch Service de Jeremy M. Sharp, U.S. Foreign Aid to Israel, 4ê çileya pêşîn 2009

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Bi nêzîkbûna hilbijartinên Rûsyayê yên adara 2012ê, manewrayên mezin ên siyasî li Kremlînê dest pê kirin. Rûsyaya ku di destpêka salên 1990ê de li ber mirinê bû, di nav deh salan de, di warê aborî û dîplomasîya ku xwe dispêre otoratîzm û gendelîyê de, bi awayekî nepayî bi ser xwe ve hat. Di rewşa niha de, du bergehên derbasbûna serdema paşsovyetî li pêşberî hev in.

Gengeşîya li ser Rûsyaya paş-sovyetî

Li welatê sermayedarîya reel

Tony Wood *

Bîstemîn salvegera hilweşîna *Dîwarê Berlînê* bû munasebeta weşandina gelek pirtûkan, ku rûxîna rejîmên paş *Perdeya Hesinî* careke din vedibêjin.[1] Yekîtîya Sovyetan û digel wê Rûsya di vê nihêrîna li rabuhurîyê de cihê sereke girt. Lê belê, piştî bîst salan, di warê tecrûbeya Rûsyayê ya serdema piştî jihevketina Yekîtîya Sovyetê ya 1991ê de hin hewldanên nû jî derketin. Pirtûka **Daniel Treisman** a bi navê *Veger* hewlê dide ku vê valahîyê bi grafîkeke *'Rêwîtîya Rûsyayê ji Gorbaçov heta Medvedev'* dagire.[2] Dibe ku **Treisman** bêhtir wekî hev-nivîskarê gotara polemîkî ya bi navê ***'Welatekî Normal'*** tê nasîn.[3] Pirtûk nîqaş dike ku serdema piştî Rûsyaya Sovyetan ji barên dîrokî yên yekane bêhtir –an ku rewabûna otokrasîyê, meylên burokrasîyê yên kokberdayî- ji hin pirsgirêkên geşedanê tengezar e, ku gelek welatên bi *derameda navincî* bi heman pirsgirêkê re rû bi rû ne: Gendelî, dezgehên qels, hesabsbûna aborîyê. Li gor vê nihêrînê, veguherîna serdema piştî Sovyetan pêvajoyeke hêdî ya hevkarîya digel mînakên welatên din e, ku digel Rûsyayê di heman asta deramedê de ne.

Piştgirîyên îdeolojîk ên vê helwêstê aşkere ne: Reformên lîberalkirinê yên salên 1990ê divê wekî serkeftinekê bê nirxandin, ji ber ku Rûsya niha kêm zêde cihê xwe yê nav hîyerarşîya aborî ya navneteweyî stendîye, ku aîdî wê derê ye. Lê belê helwêsta **Treisman** bi fazîlet hewlê dide ku nîqaşa xwe ya li ser Rûsyayê li gor prototîpên hîsterîk ên ***Şerê Sar*** bêhtir bi serekî bilind û kêmtir serşor bimeşîne, yan jî hewlê dide ku cazîbeya rihê rûsan esrarengîz bike. Di pirtûka *Veger* de **Treisman** herweha hewlê dide ku portreyeke rastîn a Rûsyayê bide û ne ya ku siyasetmedar û analîstên rojavayî di serê xwe de xeyal dikin. **Treisman** helwêsta xwe di navbera du nihêrînan de bi cih dike. Ji alîyekî ve îdeologên neolîberal, ku hemû pirsgirêkên Rûsyayê bi wê yekê re girê didin ku reformên bazarê bi awayekî serkeftî pêk nehatine û ji alîyê din ve jî ew kes hene, yên ku reforman dikin sedema rewşa xerab a welêt. [4] Lê dîsa jî ev nihêrîn hin argumanan ji otorîteyên serbixwe radigihîne -hin kes weha dibêjin, ên din bi awayekî din; rastî li cihekî naverast de ye- çîroka Treisman jî di dawîyê de bi nihêrîna lîberal a rojavayî ya sereke ve tê girêdan.

Nîvê pêşîn ê pirtûkê li ser dîroka siyasî ya bîst salên çûyî ye, ku tê de beşek giranîyê dide kesayetî û rêbazên serokdewletên li dû hev: **Gorbaçov** wekî *'xetaya herî serkevtî ya dîrokê'* tê bi nav kirin; **Yeltsîn** jî wekî qehremanê leng tê pêşkêş kirin, ku bi awayekî bêhemdî birêveçûna krîza siyasî û aborî îdare dike; **Putîn** jî ji hawîrdora baş a aborîyê bi awayekî şikbar sûdê werdigire; **Medvedev** jî wekî *'dublor'* tê bi nav kirin ku di du salên wî yên wekî serok de bername û mebestên wî hîna jî ne dîyar in. Nîve dawî yê pirtûkê jî di heman kronolojîyê re diçe, lê belê îcar di çendîn qadan de sentezên analîtîk ên berfirehtir pêşkêş dike: Dînamîkên ku rê li jihevketina Sovyetan vekir, veguherîna aborî ya salên 1990ê, şerê li Çeçenistanê û têkilîyên Rûsyayê digel Rojava. Gelek encamên ku Treisman digihîje encamên asayî ne- wekî mînak beşek bi giştî qala têkilîya navbera populerîteya serok û çûyîna aborîyê ya ber bi başbûn yan jî xerabbûnê dike-, lê belê hin dem hene ku bi vê tesbîtê re li hev nakin: Nivîskar fikarên Rûsyayê yên ji bo NATOyê û rîyakarîya siyaseta derve ya Dewletên Yekgirtî jî tîne ziman.

Gelo sedema rûxîna Sovyetan tesaduf bû?

Treisman ji hevketina Sovyetan wekî pêvajoyeke tesadufî bi nav dike. Xerab birêvebirina reformên aborî yên sala 1980yê -xemsarîya serekên Sovyetan a di warê pêşdebirina sanayîya welêt de, ku ber bi rûxînê ve diçû- Yekîtîya Sovyetan kişand ber kendalekê û li dû hev hatina *'qeza û karên nezanî'* yên li hember vê karesatê, ***Yekîtîya Sovyetan*** dehf da nav kendalê. **Treisman** hewlê dide ku li dij wê fikrê rabe ku dibêje bilindbûna neteweperestîyê bûye sedem ku Yekîtîya Sovyetan ji hev ket: Piştî ku dîyar bû ku pergala Sovyetan dê ji hev bikeve, înca hevwelatîyên wê piştgirî da hêzên neteweperest, ku nû hatibûn ava kirin.

Lê dema ku nivîskar vedigere ser reformên bazarê yên salên 1990ê, ev têgiha tesadufîbûnê ji nişkan ve wenda dibe: **Treisman** îddîa dike ku ji bilî wê riyê, ku **Yeltsîn** pejirandibû, tu alternatîfeke realîst tunebû, ji ber ku ji **Yeltsîn** re 'karesatek' wekî mîrat mabû, ku ev karesat jê xerabtir bû, ku dihat guman kirin. Lê dîsa jî wî bi awayekî serkeftî siyaseta xwe pêş de bir û welêt li ser hev ragirt. **Treisman** wekî din israr dike ku encam bi qasî ku dihat guman kirin ne xerab bû: Ketina berjêr a hasilata xeyrîsafî nîşaneyeke pêbawer nîne û asta kalîteya jîyanê ya gelek kesan di deh salan de pêş de çû, ku zêdebûna kirîna televîzyonê û alavên nav malê weha nîşan didin. Qala jidestçûna xizmetên gelemperî yên wekî xizmetên tendurustî, perwerdehî, îstîhdamê û bi ser de jî rizîna piştevgirtina civakî nehat kirin.

Di dawîyê de, nivîsa **Treisman** reformên **Yeltsîn** biheq derdixe û çîroka standart a xeyalên nafîle yên tenê dibêje, ku tê de kevirên demokrasîya lîberal datîne nav rastîya rûs. Wekî gelek bawerîyên sebaret bi Rûsyayê, ku ji 1991ê û vir ve hene, **Treisman** dibêje li jêr desthilatdarîya **Yeltsîn** de demokrasîya lîberal hêzdar dibû, lê belê ne bi awayekî berbiçav. Li gor wî di dema Putîn de jî welêt ber bi rabuhurîya xwe ya otorîter hin gavên paş de avêtine. Kêmasîyeke vê dîtinê heye ku li pişt veguherînên salên 1990ê mebesteke kûrtir a îdeolojîk heye. Tiştê ku li Rûsyayê hêzdartir dibû ne îllehîm demokrasî, lê belê kapîtalîzm bû. Ev rewş ji wê yekê aşkere ye ku kesên ku reform pêk dianîn texsîr nekir ku zorê bidin *'terapîya şokê'*, bêyî ku peywireke wan a demokratîk hebe û wan herweha piştgirî dida **Yeltsîn**, dema ku wî çendîn caran destûra welêt bin pê kir -mînaka herî berbiçav ew bû ku wî di sala 1993ê de parlamento bombe kir. Bi rastî jî, li Rûsyayê dema ku mulkên kapîtalîst mijara gotinê bûn, demokrasî her tim di rêza duduyan de ma.

Peydabûna elîteke nû û zêdetir demokrasî yan zêdetir kapîtalîzm?

Têgihiştineke alternatîf a metaforên serdema piştî komunîzmê ya li Rûsyayê ev berjewendîyên kapîtalîst dê li naverastê bi cih bikirana û giranî bidaya wan rêbazan ku rewşa welêt li gor projeya çînan a elîtên nû yên welêt teşe bigire. Vê yekê bi dorê re wêneyek pêk anî ku taybetmendîya vê elîtê hewce bike: Kî Rûsyayê bi rê ve dibe? Di salên bi teşqele yên 1990ê de elît ji endamên berê yên *Partîya Komunîst* û muteşebbîsên nû pêk dihatin. Di van deh salan de serwetmendîya van muteşebbîsan bi piranî bi malên giranbuha yên îxtracatê yên wekî metal û m'aden re, yan jî bi mekîne û alavên malî re girêdayî bû, ku ji palûkeyên Sovyeta berê dihatin dizîn. Daketina nirxê ruble ya 1998ê bingehê vê dora elît hejand û bankagerî û darayî qels bû, lê belê ji alîyê din de jî ew hilberîner hêzdar kirin, ku ji bo bazara navxweyî berhem dida. Lê belê bandora dîyarker ku teşe da him elîtan him jî hemû welêt, buhayên giran ên gaz û neftê bûn, ku ji sala 2000ê û pê ve her ku çû zêdetir bûn. Ev bilindbûna buhayan ne tenê sûdên şirketên mezin ên dewletî yên wekî **Rosneft** û **Gazprom**, lê herweha yên xusûsî yên wekî **Surgutneftegaz** û heta belavbûna wê ya sala 2003ê **Yukos**.

Vê pêla dewlemendbûnê elîteke nû afirand, ku di warê serwetmendîyê de ji yên salên 1990ê gelek serkeftîtir bûn: Bi gotina zanista siyasî **Lilia Shevtsova**, ku li Washingtonê dijî, *'oligarşîya kevin a **Yeltsîn** nizbet bi yekîneya burokrat-olîgarşên nû, wekî ecemî dixuyin.'*[5] Têgiha **Shevtsova**, ku bi xetekê re bi hev re hatiye girêdan, taybetmendîya resen a vê elîta nû nîşan dide. An ku ev elît him sektorên dewletî him jî yên xusûsî dihewîne û *"emrê desthilatdarîya karsazî û hikûmetî dirêjtir dike"*. Lê belê dibe ku portreya herî baş a vê elîta nû ji civaknas **Olga Kryshtanovskaia**yê tê, ku ji salên 1990ê û vir ve pevguherîna endametî û serwetên elîta nû dişopîne. [6] Dîtina wê girîngîyê dide bilindbûna sanayîya giran, ku digel sedsala nû re guherî, û berjewendîyên hevpar ên cîhana karsazî û desthilatdarîya siyasî.

Hişyarîya li welatên ereban wê xwe bigihîne Rûsyayê jî?

Gelek kesan bala xwe da berfirehtirbûna rola dewleta rûs a di aborîyê de û wan ev yek wekî nîşaneya hêdî hêdî dîsa dewletîkirina aborîyê nirxand -wekî mezinbûna aborîyê, personela hêzên ewlekarîyê ku ew jî mezin dibû, li jêr destê **Putîn** bû. Lê belê tiştê ku derbarê elîta îroyîn a rûs de balê dikişîne, ne domînantbûna dewletê ya li ser sermîyanê ye, lê belê linavhevketina wan her duyan e. Personelên hikûmetê ji karsazan tên girtin û herweha berevajî; hêza îdarî ji bo karsazan navgînên gelek girîng peyda dike û raman û fikarên malî di warê tayînkirina mulk û pozîsyonên dewletê de rola mezin dilîzin. Ev rewş di her astê de weha ye, lê belê dibe ku herî pir li herêmên Rûsyayê, ku şirketên mezin -him yên dewletî him yên xusûsî- di aborîya herêmî de xwedî giranîyekê ne. Jê wêdetir, herçend piranîya şirketên mezin, ku di sektorên herî girîng de kar dikin, dewletî ne jî, ew jî bi rêbazên sûda-herî-zêde tên bi rê ve birin- an ku wekî amûrên belavkirina serweta neteweyî ji bo dewlementtir kirina endam yan jî komeke elîtan.

Di hilbijartinên giştî yên berfanbara îsal de û nemaze jî di hilbijartinên serokdewletî yên sala pêşîya me de, em dikarin di nav elîtên du-jiyanî ya Rûsyayê de li benda pêşbirkeke dijwar a ji bo van çavkanîyan bin. Hevdem, ew dê bi tenê ji bo erêkirina parvekirina vê xenîmetê serî li xelk bidin -helbet heger li Rûsyayê jî wekî yên cîhana ereb hişyarbûnek peyda nebe. Herçend ev gavê gelek nîşaneyên kêm ên hişyarîyeke weha hebin jî, divê qedera **Gorbaçov** û ya **Mubarek** pêbawernebûna îmaja *'wekî ku dike'* hînî me bike.

* Edîtorê alîkar ê The New Left Review (London).

1 Wekî mînak Robert Service, *Hevrêno* (2008); Archie Brown, *Bilindbûn û ketina Komunîzmê* (2009); Stephen Kotkin, *Civaka Nesivîl* (2009); Victor Sebestyen, *Şoreş 1989* (2009)

2 Daniel Treisman, *Veger: Rêwîtîya Rûsyayê ji Gorbaçov heta Medvedev*, New York 2011

3 Kovara *Foreign Affairs,* March-April 2004

4 Aborîzanê swêdî Anders Aslund, ku di destpêka salên 1990ê de di ware arizîkirinê de şêwirmendîya hikûmeta rûs kir, yek ji alîgirên sereke yên dîtina berê ye: Binêrin pirtûka wî ya bi nave *Kapîtalîzm çawa hat ava kirin*(2007); alîgirê dîtina dawî jî pirtûka Peter Reddaway û Dmitri Glinski *Trajedîya Reformên Rûsyayê* (2001)

5 Shevtsova, *Rûsya: Di nav veguherînê de wenda* (2007), r. 108

6 Binêrin pirtûka wê *Anatomiia rossiiskoi elity* (Anatomîya elîtên rûs, 2004), nemaze rûpel. 346-66

Wergera ji îngilîzî: Celîl Kaya

Hêzeke navbera du serdeman

1991 Hilbijartina **Yeltsîn** ji bo serokatîya Komara Rûsyayê. Hilweşîna Peymana Varşovayê. Hilweşîna Yekîtîya Komarên Sovyet ên Sosyalîst (YKSS). Avakirina Koma Dewletên Serbixwe (KDS) ya ku ji 15 Komarên Sovyet ên kevin, 11an tîne ba hev.

1992 Destpêka "terapîya şokê": Helwêsta bizorê ya lîberalîzekirin û taybetîkirina aborîya rûsî, ku bû sedema helîyana Hatinîya Nesafî ya Navxweyî (HNN) û ya hêvîyên jîyanê.

1993 Îmzekirina Peymana Kêmkirina Çekên Nukleer ên Stratejîk (Start 2) di navbera Dewletên Yekbûyî û KDSyê de. Derketina krîzê di navbera **Yeltsîn** û Kongreya Parlamenterên Gel a Rûsyayê de; artêş êrîşî Parlamentoyê dike (bêtir ji 150 kesan mirin). Bi referandûmê qebûlkirina destûrekê ji bo "sîstema serokatîyê" ku ji alîyê Yeltsîn ve hatibû pêşkêş kirin.

1994 Destpêka şerê yekê yê li hemberî cudaxwazên Çeçen, ku dê du salan dom bikira.

1995 Serkevtina Partîya Komunîst di hilbijartinên ji bo parlamentoyê de.

1996 Qebûlkirina Rûsyayê di Konseya Ewropayê de. Bi deyn peredana Rûsyayê ji alî Fona Diravî ya Navneteweyî (FDN) ve da ku "biryardarîya" wê teşwîq bike. Ji nû ve hilbijartina Yeltsînî.

1997 Îmzekirina Peymana Birêvebirina Têkilîyên Bingehîn ên di navbera Rûsya û NATOyê de.

1998 Krîza diravî: Devaluasyona rûbleyî, anormalîya deynên giştî. **Evguenî Prîmakov** weke Serokwezîr tê tayin kirin.

1999 Şerê duyê yê Çeçenistanê. **Pûtîn** di hilbijartinên giştî de bi ser dikeve.

2000 Pûtîn weke serok tê hilbijartin. Ji nû ve navendîkirina desthilatê. **Dmîtrî Medvedev** weke serokê konseya birêvebirina dêwşirket Gazpromê, ku dewlet hevparê wê yê serekî ye tê tayin kirin.

2001 Gilîyên binpêkirina mafên mirovî ji alî hêzên Rûsyayê ve li Çeçenistanê. Hevdîtina yekê ya di navbera Pûtîn û Bush de.

2002 Kanala NTVyê dikeve bin kontrola yên nêzîkî Kremlînê. Rehîngirtina ji alî serxwebûnxwazên çeçenî ya di tiyatroyeke Moskovayê de; êriş bû sedema mirina 118 kesan.

2003 Kuştina parlamenterê lîberal **Sergey Yûşenko**, ku li hemberî siyaseta desthilatê ya li Çeçenistanê derket. Girtina **Mîxayil Kodorkovskî**, Serokê Birêveber ê Giştî (SBG) yê grûba petrolê Yûkosê.

2004 Ji nû ve hilbijartina Pûtîn. Serketina namzetê ser bi rûsan Alû Alxanov di hilbijartinên serokatîyê de li Çeçenistanê. Rehîngirtina li dibistaneke Osetîyaya Bakur (340 kuştî). Reformeke destûrî ya ku desthilatên serokê rûsî bihêz dike.

2005 Derbên giran li serxwebûnxwazên çeçan ketin. Başbûna rewşa aborî: HNN dîsa gîhaşt asta xwe ya 1990ê.

2006 Di derbarê gazê de di navbera Ûkrayna û Rûsyayê de nakokî. Civîna G8ê li St-Petesbûrgê. Krîz di navbera Rûsya û Gurcistanê de. Kuştina rojnamevan Anna Politkovskaya li Moskovayê.

2007 Mirina Yeltsîn.

2008 **Medvedev** weke serok hat hilbijartin û **Pûtîn** weke serokwezîr tayin kir. Mudaxeleya leşkerî ya rûsî di nelihevkirina navbera Gurcistan û serxwebûnxwazên Osetyaya Başûr de, ku Moskovayê piştgirîya wê dikir.

2009 Dawîya nakokîya Çeçenîstanê. Lihevkirina bazirganî ya di navbera Rûsya û Çînê de. Êrîşeke xwînî li se xeta hesinî ya Moskova û St. Petersbûrgê de, ku komeke îslamî ya Kafkasyayê ew girt ser xwe.

2010 Cotêrîşek di metroya Moskovayê de. Îmzekirina peymaneke nû ya bêçekirina nukleerî di navbera Dewletên Yekbûyî û Rûsyayê de. Ziwayî û şewata daristanan a nedîtî.

2011 **Medvedev** biserneketina siyaseta têkoşîna li dijî gendelîyê qebûl dike. Di warê nukleera siwîl de, tezdîqkirina lihevkirina hevkarîya bi Japonyayê re.

Wergera ji fransî: Yaqûb Karademîr

Lêgerîna li polîteîzman

MARCEL DETIENNE *

Em bidin zanîn ku ji sê paran diduyê mirovahiya îroyîn bi rengekî xwezayî polîteîst in (yanî doktrîna hebûna gelek xwedeyan qebûl dikin), hingî zêde aqilane nîne ku em neyînin bîra xwe ka îdîaya bi carekê ya "yek xwedayî bi tenê" di kîjan şert û mercan de weha kir ku qebûlkirina pir xwedayan û xwedayê pirhejmar derkeve holê. Ji bo mirov bibihîze û bifikire ka maneya "polîteîzmê" çi ye, divê li Ewropayê û li deverên ji wê peydabûne, bi rengekî dîrokî em vedîtina wê monoteîzmê yan jî wan monoteîzman (baweriya bi yek xwedayî bi tenê) raxin ber çavan, yên ku xuya ye di navbera Roma, Mekke û Qudsê de fikrên gelek belav û xurt in. (1)

Peyva polîteîzmê ji peyva yewnanî *polîthēos* tê, bi wateya " yê/ya ku pir xwedayan derdixe pêş"; weha xuya ye ku Eskûlus di trajediyeke xwe de ev peyv li hev siwar kiriye, daku çîtekî li dora deriyên Argosê bi nav bike, ku şeş an jî heft xweda lê kom dibûn û bi awayekî nediyar bi cih bûne. Ango bi tenê baxçeyekî piçûk ê polîteîst e, jixwe li welatê yewnanan bi dehan baxçeyên weha hebûn. Hê nû bi ronesansê re, peyva "polîteîzmê" kete nava zimên, bû fikirek û pirsgirêkek: vê peyvê wê deqek li pûtperestiyê bidaya û ew bi awayekî kolektîf muxalifê xirîstiyaniyê bidîta, ew xirîstiyanîzma ku fîgurekî serdest ê monoteîzmeke dogmatîk bû.

Dîroka dînan, bi rengê ku şikil da sedsala 19'ê, hîbrîdek e ku ji gelek hêmanan pêk hatiye. Ew ji du nifşên cihê pêk tê: teolojiya xirîstiyan li aliyekî; dîroka ku îdîa dike zanistî û pozîtîf e, li aliyê din. Pirsa polîteîzmê (yan jî polîteîzman) ji ber hizirîna (filozof, civaknas, antropolog û îlahiyatnasan) li ser "kokên dînî yên mirovahiyê" derket holê. Ev "kokên dînî yên mirovahiyê", ji bo naskirina Rojavayê weke bivênevê dihatin dîtin û ew, her weha, weke garantiya îmtiyaza Rojavayê ya bigewedekirina şaristaniyê jî dihatin dîtin. Em tê digihîjin ka ji bo çi analîzeke liberhevgir û ezmûnker a polîteîzmê – cins, nifş, reng, stîl – hê jî, di piraniya zanîngehan de, ne´adetî û heta qedexe ye jî, li wan deran ku pirs û pirsgirêk ji dehsalan û vir ve bi kategoriyên monoteîzmê bi xwe tên xwedî kirin û di serî de ji her sêyan, bi ya herî "katolîk". (2)

Ya rastî, dîroknivîsîna ji Incîlê heta bi Tewradê, nîşan dide ku bi çi awayî monoteîzma pêşî ya weke incîlî tê binavkirin, xistine nav dîrokeke têr şer û qutbûnê. Tewrad, ango Incîla ibrî, ji Incîlê – bi aramî û yewnanî, Mizgînî jê re tê gotin - bi çend sedsalan kevintir e. Jinûveavakirina me ya rabirdûya Rojhilata Nêzîk dike ku em bawer bikin ku destpêka peydabûna yek xwedayî ku yên din hemûyan red dike, mumkin e heta bi sedsala şeşan ya B.Z.' ê biçe. Li vir, ji bo çavdêrên roja me ya îroj ên ku pê dizanin ku beriya milyonek û heftsedsalan li parzemîna *Efrîqayê* zindiyekî bi rengê mirovan yên li ser piyên xwe disekinî hebû, tiştekî taybet heye. Ji dema ku pêşketina mejiyî destûr dayê "zimanî" bi kar bîne, şik û guman têde nîne ku zindiyê evqasî nazik dest pê kir kopiyên piçûk ên her şêwaz diyardeyên em navê derxwezayî li wan dikin, xeyal bike; çavkaniya van xeyalan xewn bûn ku bixwe ji bo manûnemana roj bi roj û şev bi şev dildariyeke bivênevê ye.

Dibe ku yek ji van zindiyên li ser du piyan yên dûrî roja me ya îroj fikira dahiyekî afirandibe, ku xewna wî ev e ku dahiyên din hemûyan li derve bihêle. Ji bo niha, divê em qîma xwe bi taybetiyeke di nav eşîreke koçer a Rojhilata Nêzîk de bînin. Dema ku komek keşeyî di navbera du qonaxan de dest pê kir, bawer kir ku *Elohîmê* wî, ango xwedayê wî yê piçûk ê "neteweyî" dixwaze ku mirov weke ku ew yekane *Elohîm* be, wî bihebînin, ku navê wî Yahwê ye û ku wî biryar daye "benî-îsraîlan" cihê bike daku wan bike "gelê xwe yê hilbijartî", ev eşîr li derdoreke sûroyo-kena´anî bû.

Bi awirê pêşî tiştê mirov dibîne, bûyereke bêencam e. Ne xema asûriyan, ne ya yewnanan, ne jî ya afrîqiyan bû; jixwe hîç xema çîniyan jî nebû. Yên ku em ê bi reaksiyona wan bihesiyana, Farisên serdema mirovên Yehûdayê bûn, piştî mişextkirina cihûyan a ber bi Babîlonê ve; van Farsên wê serdemê tercîh dikir ku xweseriya gelên di bin nîrê desthilatdariya wan de bûn, bidin wan, û her weha xwedawendên mîna Yahwê jî bêyî nîşanên maddî, perestgeh, yan jî peyker, qebûl dikirin. Bisporên Incîlê çi protestan çi jî katolîk, li ser vê tesbîtê li hev dikin; heke li Rojhilata Nêzîk û Navîn, rabirdûyeke hezar salî ya polîteîst meydan û perestgehên nûneriyên ku bi hêza kêm û zêde xwedayî pêk hatin, tijî nekira, tu sedama megalomaniya çavnebar a xwedayê piçûk ê Îsraîlê wê nebûya.

Hê nû di sedsala Voltaireyî de, ango bêhtirî du hezar salan piştî *tesniyê* û Zulkif , Davîd Hume bîr bir ku pêşiyên tiştê ku hin mirovên serdema wî hez dikir navê " polîteîzmê " lê bikin, bide qebûlkirin. Hêza monoteîzma xirîstiyan ewqasî mezin bû û hê jî li gelek welatan bi hêz e, ku ji bo polîteîzm hêdî hêdî li Rojavayê werin analîzkirin, diviyabû demeke dirêj derbas bibe.

Li Bogazkoyê (Tirkiye), li vî "cihê kombûna xwedayan" ku dişibe paytexta împaratoriyan, arkeolog, zimannas û dîroknasan beriya demeke kurt înventera panteona hitîtiyan da zanîn. Polîteîzmeke zêde navendîbûyî, bi îdareya xwe ya katib, efser û wezîran yên ku pê daketine ku li ser kevalan serjimarekexwedayanakubipêşdikeve, li çînan dabeş bikin; divê "bedenê" van xwedayan, bi hebûna ruhekî ji hesin ê ku bi maddeyên nirxbuha kiraskirî ye, bi baldarî were parastin. Di heman demê de, bisporên şaristaniya Sumeriyan û yekemîn xanedana Babîlê hê jî nîşan dida ka ehlê zanînê – xwedayî û katib – bi baldariyeke çawa ketine nav karê organîzekirina bi sedan xwedayan daku navên wan binivîsin, li malbatan, cotan û komên ji sisiyan dabeş bikin.

Li devereke din û carinan li gelekî nêzîk, xweda şopa piyekî ne li ser xîzê, textekî vala ne, neynikeke metal in, bêhnek in, bêdengiyek in. Li Japonyayê bêhed û hesab in: her tişt, her zindî, libeke birincê, navê deverekê, guliyek, kevirek. Demeke dirêj, Rojavayê bi hezaran netiştên xwe yên ku rojane li hev çêdikirin di nav beşê "anîmîzmê" de bi cih kirin. Dema ev dikir jî lê difikirî ku bi kerema wan kesên ku ruhê xwe bi rengekî pir xiristiyanî tijî kirin, hêviyê bide bi milyonan mirovan ku rojekê wateya bi rastî ya "*anîma*yê" (3) nas bikin. Afrîkanîst (bisporên Afrîkayê) guh didin kesên ku li gorî bikaranîna xwe şikil didin "fetîşan" û van fetîşan analîz dikin. Bi vî rengî, di tiştê û objeyên ku ji wan re tê gotin "fetîş" de, rîtûelên piçûk ên kehaneta rojane, yan jî hezar rêyên ku mirov divê di navbera jidayikbûn û mirinê de bikudîne, ku li cem gelek xelkên pêşî yên cihêreng hene, analîz dikin.

Heke li her deverî û li her parçeyê dinyayê xweda hene, sedema vê ne ew e ku em bi fikirên ruhên xwedî hêz yan jî xwedayên mezin ji dayik dibin. Ev fikir bi texmînî weha peyda dibin: bi guhdarîkirina kesên ku behsa wan dikin, bi temaşekirina merasîmên ku ji bo bigewdekirin û carinan ji bo rengdayîna "hêmanên derxwezayê" hatine fikirîn, yên ku hatine neqandin yan ji bo yekser desttêwerdana jiyana mirovan, yan jî ji bo xurtkirina spekulasyonên li ser kirasguherînan yan jî danûstandina bêyî bikaranîna ziman ya di navbera ruhan de, di navbera melekan de.

Mala xwedê gelekî ava ku li vir û li wir, nobetdarên nifşê mirov roniya şevçirayekê didin şevê. Bi vî rengî yekî ji wan, di nava hesta vedîtina Dunya Nû peydakirî de, weha kir ku were dîtin ku li her deverî û her demî "fikirên gelêrî" hene. Ev fikirên gelêrî carinan nas û - eger yên xerîban bin - carinan cinawirane tên nîşandan. Û Michel de Montaigne – ev ew e – bi dengekî nizim pêşniyaz dike ku divê "karkerê mezin ê mûcîzeyan" ango mejiyê mirovî ji hebûna van baweriyan berpirsiyar were girtin, lewma bi tenê ji wî tê ku baweriyên "bi heman rengî" û her weha "absurd" –tewş- li dever û demên pir dûrî hev çêbike. Û heke bawerî "*weke lana mozan*" lê derdibin, kîjan ji wan dikarin îdîa bikin ku xwediyê "*otorîteyeke fermandêr*" in? Nobetdarê hêjayî qedirgirtinê, bê deng, bê guman, ev peyv li gotinên xwe zêde kirin: xwedayên pirhejmar, çi fikir û çi dahî bin, weke çeteyan û taxan şerê hev nakin. Tu daneya birincê heta îroj xeyal nake ku tevahiya zindiyên li ser rûyê erdê bike koleyên xwe, "erda" "kesên baweriya mirovan diguherin".

Ev tesbîteke hêsan e, monoteîzm, qet nebe yên ku hez dikin hewasdarên belavkirina baweriya xwe bin, li dijî herkesî şer dikin û beriya her tiştî li hemberî hev şer dikin. Rastiya banal: çawa ku xwe weke şahidên *Wa´hiya Rastî* ya mirov li ber rabûn, qebûl kirin, xirîstiyanî û îslam ketin nav komkujiyên mezin ên li dijî hev. Dîrokeke nexweş e, heta mirov bêje bes xwînrij û îroj bûye xwedî stîlekî holywoodî yê "şerê şaristaniyan".

Heke Rastî hebe, hingê baweriyên din şaş in. Di serdema desthilatdariya Augustusî de, pêxemberekî piçûk ê Filistînê bi peyama xwe ya evînê, bi mirineke di çarmixê de, bi çendek bawermendên dildarê karîzmaya "xwedayekî" ji bo her ruhî yek bi yek fikaran dike. Ev taybetmendiyek ji taybetmendiyên wî ye. Bi malbatî bawerkirina vejîna pêxemberekî mirov heyranê wî, ango; li "meclisê" (4) bawerî pêanîna ku Îsa ji bo ku dinyayê xilas bike hatiye, bi tenê yek ji baweriyên bi Mesîh e. Ya herî kêm zerarê dike ji bo damezrînerê baweriyên nû, ew e ku bide bawerkirin ku ew tiştekî weke "dînekî çêtir" tîne. Çima wa´hiya projeyeke mezin a ji bo rizgarkirina mirovan ji dinyayeke ku ji ber gunehekî ne yê wan e, bi rengekî xirab ketine ser rûyê wê, li quncikeke wenda ya Celîleyê wê nehatibe? Bê guman, hêjayî pesindayînê ye mirov bi dost û cîranên xwe bide zanîn, ku hê jî "maneya her tiştî heye"!

Ev yek vê nahewîne: di binê dareke çinarê de xeyalkirina çalakiyeke mezin a lidervehiştina gerdûnî ya "şaşiyê" ku baweriyên din nûneriya wê dikin. Dîsa jî, ya ku ber bi sala 320'ê ve li Rojavayê qewimî ev bû: dema welatiyekî romayî ku ne weke yên din asayî bû, lewra ew împarator bû – ji yên berî xwe ne xirabtir û ne jî çêtir bû – biryar da ku dînê xwe biguhere û dînê "Mizginiyê" qebûl bike. Konstantin karîbû tercîheke ku bi tevahî şexsî bû, bike. Mixabin! Di despêka sedsala 4'ê de, dilsozên rebenê li çarmixê xistî, li dora peyva seydayê xwe ku êdî "pirtûk" (5) bû, li "meclisan" kom bûn, ya ku wê paşê navê *Dêrê*, *Meclisê* lê bihata kirin, damezirandin. Ji bo ku koka xwe berdin û bi cih bibin jî, paytextê împaratoriyê, bajarê Romulus û Rêmus hilbijart. Çawa ku vê dêrê dikarî xwe bispêre hêz û otorîteya prensî, pê re jî misoger bû ku Wa´hiya Rastiyê ya şîroveyên Nivîsan bi tenê ji wê re hatiye û ew ê bi lez û bez bi lidervehiştina "baweriyên" din hemûyan, *baweriya* bi amenaya xwe ferz bike û baweriyên din hemûyan veguherîne ser putperestî û xurafeyê. Çîneke dîndaran a hiyerarşîzekirî bi vî rengî mezin bû ku hêza wê bi sedsalan tevahiya "karmendên xwedayan" ên din ji rûyê dinyayê birin. "Şaristaniya Rojavayê" dimeşe, ji bo ku gelên biyanî bîne ser dînê xwe, erdên anîmîstên hov dagir bike, bi xaçê şerên adil yên navê şerên "dînî" li wan tê kirin bi rê ve bibe, li her deverî otorîteya Rastî û Başiyê bide qebûlkirin.

Va ye, bi vî rengî di nav şekeke ruhên bi êş û bi jan de hilgirtî, em bûn "polîteîst" ... Hinek dixwazin dîroka kûr a monoteîzmeke di cewherê xwe de *totalîter* e, bi zanîn netolerans e û rewa ye, rexne bikin. Ev nêrîna rexnegir di cih de avantajek e : piştî ku carekê mirov fikira "dîn nabe şaş be" deyne aliyekî, bi mezinahiya çavkaniyên xeyala mirovî dihese.

Bisporekî şareza di guhên min de dibêje: "xuya ye, polîteîzm wê bibe bazareke baş!"

RÊDÎ SEÎD TOPRAK: **Xwezarijik I**, li ser tuwalê teknîka tevlîhev, 100 x 140 cm

* Zanyarê olî û antropolog

1 Francis Schmidt (di bin birêvebiriya wî de), L'impensable polythéisme. Etudes d'historiographie religieuse [Polîteîzma mirov nikare lê bifikire : Lêkolînên li ser dîroknivîsina dînî], Editions des archives contemporaines, Parîs, 1998

2 Peyva "Katolîk" ji peyva yewnanî katholîkos tê, û wateya wê "gerdûnî" ye

3 Peyveke bi latînî ye ku wateya wê ruh, giyan e

4 Ango Ecclesia, bi yewnanî – ji cîhê dêrê

5 Bi yewnanî navê bîblîon [navê Incîlê, bi zimanên ewropî ji vê peyvê tê] li pirtûkê tê kirin

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Di şoreşê de reform

Kubayî bi vî awayî dijîn

RENAUD LAMBERT *

Xelkê Kubayê dizanî ku Fidel Castro serokatîya welêt daye destê birayê xwe Raúl. Birayê piçûk bi vî rengî dikeve kongreya 6ê ya partiyê ku divê, di rewşa ferzkirina "pragmatîzma" xwe ya aborî de dawîya nîsanê pêk were.

Gefa serekî ya ku tesîra wê li me dibe, ne topên amerîkî ne, xetera mezin fasûlî ne. Fasûlîyên ku kubayî naxwin". Sal 1994 e û fersend masî ye, hergav çênabe: Wezîrê Parastinê, **Raul Castro**, hemfikirnebûna xwe ya bi birayê xwe, **Fîdel** re weha dest nîşan dike. (1) Fîdel li hemberî lîberalîzekirina bazarên kiştûkalî derdikeve –hinek "bazar" dê hilberîna xwarinê zêde bike. Ji ber ku, ji dema hilweşîna Bloka Sovyetê û bi vir de, Kuba cefaya "perîyodên taybet ên dema aşitîyê" dikişîne: Berhema Nesafî ya Navxweyî (BNN) % 35 kêm bû, Dewletên Yekbûyî zorê didin embargoyê ku ew jî aborîya giravê dixeniqîne û dibe sedem ku xelkê giravê bi kêmadanîyê (nebaşxwarinê) bihese. **Raúl Castro** ji vê yekê gumanê nake: *"Ger em tiştekî neguherin, ji xeynî ku ez tankan derxim pê ve, li ber min rêyeke din namîne"* Û bi vî awayî di dawîya salê de, destûra bazarên serbest ên gundîyan hate dayin.

Piştî şanzdeh salan, birayê biçûk ji bo serokatîya welêt şûna yê mezin girt (2) û li gor wî, girav *"hê jî ji dema serdema taybetî derneketîye, xelas nebûye ".* (3) Di 2008ê de, sê bagerên li pey hev, jêrxane serûbinî hev kir: 10 milyar dolar zirar li giravê kir ku dike % 20ê BNNê. Ya çarê, krîza diravî ya navneteweyî bû, ku sektorên herî dînamîk ên aborîyê li ber xwe birin (bitaybetî, tûrîzm û nîkel). Kubaya ku, êdî nema dikare vatinîyên xwe bi cî bîne, hebûna şirketên bîyanî û beşekê ji îtxalata xwe dicemidîne, zêdetir dev ji hêdîkirina çalakîyan berdide. Ji nû ve, fasûlî tehdîd dikin: Di 2009ê de, hilberîna kiştûkalî % 7.3 dadikeve. Di navbera 2004 û 2010ê de, para xurekê ku ji derve tê bi carekê re ji % 50yê hildipeke heta %80yê.

18ê çileya pêşîn a 2010ê, **Raul Castro** êdî nema berê xwe dide birayê xwe lê, dide xelkî. Li hemberî Parlamentoya Netewî li ser armanca kongreya şeşem a Partîya Komunîst a Kubayê (PKK) –ku piştî ya dawîn bi çardeh salan ji bo dawîya meha nîsanê hatibû pêşbînî kirin–, diaxive û sozê dide: *"Yan divê em rewşa heyî rast bikin, yan jî dê wexta me ya em ji ber felaketa ku nêzîk dibe, rizgar bibin nemîne".* Lê belê heta bi ku derê mirov rast bike?

Asrex ji ber ava ku tê diçizire, qelişîye, li ser dîwaran şûnên terkan xwiya dikin, raxer jî bi vegotineke herî basît weke nobedarê ewlehîya koşkekê westiyaye: Ji hola ku serokê Parlamentoya Neteweyî, **M. Ricardo Alarcón** lê pêşwazîya me dike, bîna desthilatê nayê. Dîsa jî, ev pênc sal bûn, "paşgotinî" dixwaze ku **Alarcón** bibe yek ji her du namzedên serekî yên piştî **Fidel Castro**: "Çarenivîs"ê diyar e bi awayekî din biryara xwe daye. Jixweberbûna muxatabê me belkî ji ber vê bû.

"Erê, helbet dê rêvekirineke ber bi bazarê ve, rêvekirineke ber bi kapîtalîzmê ve jî be". Ji welatê şoreşê qetiyan? Serokê Parlamentoya Neteweyî vê fikrê pûç dike: *"Ji bo rizgarkirina sosyalîzmê, em ê her tiştê ku ji destê me bê bikin. Belê ne "sosyalîzma mikemel", ku herkes xeyala wê dike. Na, sosyalîzma li Kubayê mimkun e, helbet di mercên ku em bixwazin de. Û di encamê de, hûn dizanin, mekanîzmayên bazarê jixwe di civata kubayî de hene".*

Navenda bajarê Havanayê, taxa **Vedado**. Selikeke piçûk a vala di bin milê wê de, **Miriam** ji mala xwe ya li ser *kolana 23yê* derdikeve. Tam li jêra cadeyê, li çepê wê, pêgeha **Malecón** heye. Seyrana li ser asfalta heft kîlometreyan dirêj, êrişa pêlan dike ewrên giran ên weke xubarê û ew jî peravên deryayê ku xwêyê ew xeritandine, dide ber qamçîyan. Hinekî ji wê dûrtir, her di wê rêzê de: **Key West** û **Florida** hene. Serê din ê dinyayê, bi kêmanî sed û pêncî kîlometre dirêj e.

Gava ku ew, tam di ber lampeyeke sor, ya di ser rê re derbas dibe, Miriam, zaroka bi cilên pertelî, serçavên wê ji qirêja reş nabîne ku bixwaze hesteyekê, pakêteke şekir an jî bilêteke lotoyê bifiroşe şofêrekî lê rasthatî. Tu afîş wê venaxwînin ku hînikayîya bêdawî ya filan vexwarina bi gazoz –"sifir calorî" misoger– an nermahîya tîr a jeleyeke dûşê ya "şoreşger" hîs bike. Îstisnayeke herêmî, kubayî nizanin parsekîya zarokan çi ye. Îstisnayeke cîhanî, giravê xwe ji panoyên reklaman xilas kiriye.

Tu çi dixwazî, birincê?

Lê Miriam saniyekê jî li vê yekê nafikire. Weke ji sedî heftê ew piştî 1959ê hatiye dinyayê, tarîxa "serketina şoreşê" –weke ku li Kubayê dibêjin. Ev jîngeh, ya wê bixwe ye. Ew yeke bitenê ye. Tevî vê jî, ew ji daxwaza *"fethên civakî"* ku gelê vir pê kêfxweş dibe, bi şûn de namîne. Hemî tiştên ku dewlet belaş pêşkêşî wê dike, û ku ji bo wê mafekî xwezayî ye: Perwerde, tenduristî, werziş, çand, kar, û xurek, bi saya *libreta (defterê)*, karneya xurekîyê dibe ku dê sala bê pêncî salîya xwe pîroz bike.

Gava digihê *bodega (dikanê)*, Miriam belgeya xwe ya pir biqîmet dirêj dike: Bi dirêjkî, tabloyên neh stûnên li pey hev tê de hene. Li çepê, lîsteya berhemên ku libreta dest dide: 1.20 livre (453,5 gram) fasûlîyên bi 0,80 pesoyan; nîv lîtir rûnê xwarinê yê bi 0,20 pesoyan, kîloyek şîrê tirole (rûn jêgirtî) ê bi 2 pesoyan; 3 livre şekirê bi 0,15 pesoyan, 400 gram meqarnaya bi 0,90 pesoyan, 115 gram qehweya bi 5 pesoyan... Li rastê, stûneke ji bo ji 8 hefteyan 1ê, perîyoda du mehî heye ku rûpelê hemûyê digire. Di her xaneyekê de, tayîna ji bo xwedîya/ê karneyê dabeşkirî heye.

"Tu çi dixwazî? –Birincê". Miriam selika xwe dirêj dike. Weke hemî kubayîyan, mafê wê yê 5 lîvre bi 0,25 pesoyan û 2 livreyên zêde bi 0,90 pesoyan heye– ku li ser hev dikin sê kîlo.

Miriam li wezaretekê kar dike, bi mehaneyeke navincî ku mehê dike 450 peso. *"Ango kêm zêde, dike bîst CUC".* CUC çi ye? *Convertible unit currency* yan jî "pesoyê ku tê guhartin", ku bihayê wê dike 24 pesoyên gelêrî. Ev pereyê duwem di sala 2004ê de derket piyasê, da ku şûna dolarê bigire. Tawîzeke ji bo "realîzma aborî" ku birêveberên kubayî mecbûr kir di 1993yê de destûrê bidin dolarê.

Piştî hilweşîna Yekîtîya Sovyetan, karbidestan texmîn dikir bêyî ku bibin sedemên guherînên radîkal di warê hundirîn de, dê karibin reforman di sektora derve de bikin: *"parastina kapîtalîzmê li derve û ya sosyalîzmê li mala xwe"*, dîroknas **Richard Gott** bikurtebirî dibêje(4). Lê belê "bazar" di her qulikê re difna xwe dixe nav karê wan. Erda îzole ya veberhênan û tûrîzmê, divê dovîzê ji bo parastina skeleta civakî –bêyî ku wê biguhere– ya welatî pêwîst peyda bike. Ev erda îzole bazarê di bin banknotên kesk di dihêle. Bexşîş, beşekî mehaneyan weke dovîz dan, lê her wiha jî ji derve û bi taybetî jî ji bazara reş pere transfer kirin: Portreya **George Washington** di nêzîk de çi bigire weke yên "birîh" ên Sierra Maestrayê dê bi mirovan nas be.

Karbidest buroyên dovîzan vedikin

Karbidest dev ji têkoşînê berdidin. Ew êdî buroyên dovîzan vedikin û ji bo ji nû ve berê dovîza biha banknotê kesk ber bi kaseya dewletê ve biguherin – *shopping /kirîn û firotinê*– dikin. Du cûre bazar derdikevin holê, ku yek serdestîya diravî ya welatî dide dest pê kirin û ya din karaktera prensîpa wekhevîyê ya Şoreşê tehdîd dike: Bi tenê ji sisiyan duyê kubayîyan dikarin bi awayekî legal xwe bigihînin dolaran (her wiha jî CUC). Ferqa di navbera mehaneyan de, ku di 1987ê de ji 1ê heta 4ê bû, derketîye ji 1ê heta 25ê. (5)

Ji nuha û pê ve, êdî hemî kubayî dikarin pesoyên xwe bi CUCê biguherin: Îmtiyazên vî mafî ji holê hatin rakirin. Îmtiyazên fiîlî man. *"Yê min, dewlet her bi peso mehaneya min dide,* Miriam bi ken dibêje û li îbreya mêzînê dinêre. *Te fiyatên li firoşgehê dîtin?"* Coca-Colaya (ji Meksîkayê îtxalkirî): 1 CUC (dike 24 peso); pakêta sabûnê (ku kalîteya wê ji bo ewropîyekî normal e): 1,5 CUC (dike 36 peso); seta Hi-Fi: nêzîkî 400 CUCan (dike 9 600 peso); komputer: Li dor 500 CUCan (dike 12 000 peso).

Selika Miriamê êdî tije ye. Lê ne ewende giran e. *Libreta* têr dike ku mirov pê bijî? *"Erê, lê herî zêde ji 10 heta 15 rojan".* Li *bodegayê*, herkes bi şef re hemfikir e. *"Bêyî hisab bike ku hûn divê tiştên din jî bikire".* Sewze, heqê rê, elektrîk û ya xirabtir, cilûberg. Heta ku tu der ji tiştên moda jî berdî, lixwekirin her dem tercîhekê dixwaze. Pantalonek? Li dor 130 pesoyan e. Tîşortek? Divê tu 90an bidî. Derpêyek (bi rastî ne tiştekî ku dilê mirov bibijîne xwe jî) bi 10 pesoyan e.

Landi, temîrkerê tirimbêlan li Matanzasê mehê bi 350 pesoyan kar dike; **José**, şofêrê kemyonê li **Santa Clara**yê, li dor 250 pesoyan qezenc dike; **Marilyn**, rojnamevana ciwan li Cienfuegosê, 380 pesoyan. Karmendên asta bilind? Rojnamevanê *British broadcasting corporation* (BBC) **Fernando Ravsbergê** li Havanayê dijî, texmin dike ku, *"mehane kêm zêde 800 pesoyan digirin".* Ger mehaneya navincî di navbera salên 1989 û 2009ê de, ji 188 heta 427 pesoyan zêde bûbe jî, qîmeta wê ya rastîn –ango ku mirov bi enflasyona heyî re bide ber hev– ji 188 heta 48 pesoyan daketiye.

Ji *bodegayê* heta dikana tekstîlê, bêyî ku di *shopingê* re derbas be, bikir hisabê xwe pir zû dike. Bivê nevê dipirse: Gelo kubayî çawa dikarin debara xwe bikin? Tu bixwazî nexwazî, bersiv ev e: *"Hay que resolver". Resolver?* "Çareser bike" –ku kubayî weke lêkereke netêper bi kar tînin, ji ber ku pirsa çareserkirinê ji alî herkesî ve tê zanîn.

Tûrîstek li şaneşîna oteleke mezin bîrayekê dixwaze: 3 CUCan dide. Garson hergav ji stokên otêlê nade, lê belê carinan jî ji yên xwe dide ku hema li kêlekê veşartî ne: Bi 1 CUCê kirîye, bi 3yan difiroşe, ev bîra derfeta ku mehaneya xwe ya rastî, pêncî caran zêde û şefê xwe jî "razî" bike, didiyê.

Karkerê otêlekê ji ber êşa diranê xwe debar nake. Doktorê diranan berî ku problema wî "çareser" bike, jê re dibêje ku divê tu du hefteyan li benda dora xwe bimînî: *"Tu dikarî îşev jî bêyî; lê wê gavê tu yê 5 CUCan bidî".* Weke ku tiştekî normal be. Îcar dora karkerê otêlê ye ku bazareke bêbingeh bike: *"Min niha bigire û ez ê jî îşev te û hemî malbata te berdim ku hûn ji bufeya otêla ku ez lê dixebitim, bixwin."*

Mehaneya asgarî nema têra pêdivîyên bingehîn dike

Firotina daîreyên apartmanan qedexe ye. Lê dîsa jî, hin malbat mezin dibin, tevî ku yên din piçûk dibin. Sîmsar, bi komisyoneke dema lihevkirinê ango kirînûfrotinê, li ser bingeha "bihayekî bazarê" ku ji herkesî ve malûm e, têkilîdanîna di navbera her du alîyan –yê dikire û yê difroşe– de digire ser xwe. Studyoyek li taxeke piçekî berbiçav a Vedadoyê? *"Bi 15 000 CUCan tê frotin."* Ji bo daîreyeke apartmanê ya pênc odeyî hinekî ji navenda bajêr dûr? *"Bi kêmanî 80 000 CUC divên".*

Li welatê "yan sosyalîzm yan neman", langust/kêzikên deryayî ji bo tûrîzmê û îxracatê tên hilanîn. Nêçîrvanên wan dixwazin bi rêya bazara reş li hemberî vê neheqîyê derkevin –hatinîya xwe ya mehane bi 700 dolaran misoger bikin. Ji alîyê din ve, akademîsyenên ku koda wan ê ji bo bikevin înternetê heye, koda xwe êvarî, piştî saeta kar bi kirê didin; Mamoste li nav malan dersê didin, her weha hemşîre bêhed û hesab li malan xizmeta tenduristîyê dikin. Şofêrên otobus û kamyonan benzînê ji depoyan dikşînin. Ji bo piranîya wan, karê ji bo Dewleta Sosyalîst derfetê dide wan ku bazara reş xweş bikin: Qelem, kursî, alet, malzemeyên avasazîyê û hwd. Hin laşê xwe jî difiroşin.

Dupereyî, lojman, xwarin: bi salan e ku kubayî hînî avakirina "mekanîzmayên bazarê" bûne û pê jîyana xwe ya rojane bi rê ve dibin. Rewşek e ku vegotina

Laboratuara guhertinê, hêzên çekdar

Weke şeva din, şeva berî wê û roja berî şeva berîya wê, rojnamevanê bi min re bi rêya telefon dipeyive: *"Ez ji bo daxwaza xwe ya hevpeyvîneke nûnerekî hêzên çekdar re..."* Bersiv naguhere: *"Erê, min baş not girt, lê bawer dikim ev yek dê ne hêsan be".* Artêş li Kubayê di quncika xwe de ye, li tu deran xuya nake. Û ev yek ne bi tenê ji dema ku general **Raúl Castro** ji 1959ê heta 2006ê wezîrê parastinê bû, hatiye desthilatê, weha ye.

Heta destpêka salên 1990ê, Kubayê ji bo techîzata artêşê hesabê xwe li ser Yekîtîya Sovyetan dikir. Bi carekê re, artêş mecbûr ma ku xwebixwe xwe fînanse bike. Ji bo ku karibe bi ser keve jî, çalakîyên xwe yên cihêreng pir kirin: Ji birêvebirina otelan, heta tûrîzmê, sanaîyê, avakirinê, kirîn û frotina erd û avahîyan, bankeyan, xizmeta diravî, rêzedikanên cihêreng, hilberîna puroyê, kirêkirina erebeyan...

Artêş ji alî eskerî ve lawaz dibe –jimara eskeran dadikeve; di destpêka salên 1960ê de, jimara ku li dora 300 000 eskeran bû, di destpêka salên 2000ê de daketiye 45 000 eskeran. (1) Li hemberî vê jî îro giranîya xwe dide warê aborî û siyasî. **Raúl Castro** çi bigire li şûna hemî wezîrên ku ji alî birayê wî yê mezin ve hatibûn wezîfedar kirin, merivên xwe bi cî kirine; bi awayekî giştî ew yan eskerên kevin yan jî yên veqetîyayî tercîh dike. Ew li siyaseta derve pir miqate ye, artêş berî her tiştî ji nêzîkbûneke siyasî ya weke dema Yekîtîya Sovyetan a ku bibe sedema rewşeke çavê wê li destê **Venezuela**yê be, ditirse. Ji bo îdeolojîyeke berfireh divê hevalbend jî bên zêde kirin: Brezîlya, Çîn an jî Rûsya.

Her çend tu jimarên fermî tunebin jî, Wezareta Parastinê (MINFAR) kêm an zêde divê yekser % 50yê aborîya Kubayê kontrol bike. Bêyî ku ji bikaranîna teknîkên *birêveberîyê* yên hevdem ên şirketên mezin ên rojavayî dudilîyê bike, MINFARê modela xwe ya birêveberîyê nûjen kiriye *–perfeccionamiento empresarial* an jî mezinkirina kapasîteya karê xwe– bi encamdaneke çi bigire bê kêmasî pêk tîne.

Hêzên çekdar weke *"pêşengên modêla kapîtalîzma kubayî"* ji alîyê kovara *The Economist* ve hatin pîroz kirin (2), ew xwe weke laboratuareke "modernîzekirin"a civata kubayî derdixin pêş. Di 29ê çileya paşîn a 2011ê de, sernivîseke rojnameya *Granma*yê careke din gilîyan ji brokrasîyê dike. Lê, herwiha dibêje jî ku, çare heye: *"Şansê me kubayîyan pir hebûye ku hêzên me yên çekdar zanibûne dermanekî ji bo vê nexweşîyê bibînin ku me nikaribû ji nav civatê derxista".*

1 Li gor Enstîtuya Navneteweyî ya Lêkolînên Stratejîk ku di "Paymaster generals" de jî behsa wê hatiye kirin, *The Economist*, London, 13ê çileya pêşîn a 2001ê

2 "Fading away *(jibîrbûn)*", *The Economist*, London, 3ê tebaxa 2006ê

resmî, heta hatina ser desthilatê ya **Raúl Castro**, herkes mecbûr kiribû ku bi dizî bijî. Çi bigire bi awayekî saf, weke serok (ê demî) ji axaftina xwe ya yekem îstifade dike û di 26ê tîrmeha 2007ê de weha dibêje: *"Mehaneya asgarî, pir aşkere, êdî nema têra pêdivîyên bingehîn dike (...) ev yek fenomena bêdisîplînîya civakî teşwîq dike"*. Gelo ev detayek e? Berevajîya wê.

Fidel Castro, di 26ê gulana 2003yê de, dibêje: "*Tiştên ku kalîteya jîyanê ya rastî pêk tînin, ji xwarin, ji xanî an jî ji cilûbergan bêtir, raman in.*". Ji bo têkoşîna li dijî alozîyên li pêşîya welêt –bi taybetî jî li dijî gendelîyê–, ev serê çend salan e wî "şerê fikrî" îlan kiribû. Armanc: Bawerîya şoreşgerî ya kubayîyan, bi taybetî jî ya yên herî ciwan, bi kardayina wan, bi hêz bike. Weke mînak xwendekar ji bo çavdêrîya stasyonên benzînê hatibûn wezîfedar kirin. Ji bo demekê, tesîra van fikran çêbû, paşê "ji armanca xwe bi dûr ketin" û dîsa hatin ji bîr kirin. Çapemenî (her fermî ye li Kubayê) hîn niha pê dihese ku Wezareta Avakirinê heşt hezar karker û hosteyên dîwaran, her weha jî duwanzdeh hezar zêrevan wezîfedar kiribûn da ku rê li ber dizîyê bigirin.

Piştî "minaqeşeyeke mezin a neteweyî" ku sala2007ê dest pê kiribû, **Raúl Castro**, têgihîşt ku kubayî li benda hin reformên bi awayekî din in. Tiştê bû sedema ku ew bigihê encameke weha çi bû gelo? Bi rastî kesek jî nizane: Tu rapor, bîlanço yan encameke "minaqeşeya" navbihurî ji rayagiştî re nehate aşkere kirin. Piştî her tiştî, Landî bi kurtî weha dibêje: *"Li vir yê ku biryarê dide Dewlet e. Ne gel e"*.

Ji îro pê ve, mesele ne pirsa sererast-kirina kêmasîyên civakî ye, yên ku bi zahmetîyên îdeolojîk re li hev nakin, lê pirsa lêgerîna sosyalîzmeke ji *"fikrên me yên çewt û cîbicîkirina wan nemimkin"* pakbûyî ye. Ji bo vê, tevî rîskên xwe jî divê mirov *"ji tecrûbeyên erênî yên kapîtalîstan dersê bigir"*. (6) Hîle û ji heq xwe derketinê, gelo ji niha ve beşek kubayî ewqas kirine teşebûskarên piçûk? Serokê niha, bi rêya xebata serbixwe bihêzkirina teşebusa taybetî hilbijart.

"Ma bi rastî jî pêdivî ye ku dewlet biryarê li ser heqê kurkirina por jî bide"

Di jîyana rojane de, weşana lîsteya sed û heftê û heşt pîşeyên ji kesên serbixwe re vekirî ji îlona 2010ê bi vir de, bi rastî jî zêde tiştek neguhert. Hosteyê dîwaran, necar, hosteyê elektrîkê, saetçêker, temîrker an jî dagirkerê çeqmaqan: Di resmîyetê de tiştekî weha tuneye. Lê ji demeke direj ve ye, herkes wan bi kar tîne. Û bi munasebeteke baş: *"Tiştek ji tamîrkirina çizirîna avê bi riya teşebusên Dewletê [yên tamîrkirina avayîyan] zortir tuneye*, Ricardo dibêje. *Piştî demekê, herkes hîn bû bi rêya cîranêkî xwe yê ku di vî karî digihe pirsgirêka xwe çareser bike.*

Êdî ev cîran bacê dide: Baceke ji 20 CUCan hinekî kêmtir ji bo ku lîsansa xwe tomar bike, yeke din ji bo (% 25)ê karê ku kiriye, prîmek ji bo ewleyîya civakî (ji % 25ê dahatê) û baceke biqedeme li ser hatinîya salê ji 5000 pesoyan pê ve (heta ji % 50 ji bo hatinîya salê qasî yan bêtirî 50 000 pesoyan). *"Karkerekî serbixwe dikare heta kubayîyên din jî bigire kar"*, Ricardo gotina xwe didomîne. Destûr vê yekê qebûl nake û weke cûreyekî çewisandinê dibîne. Daîreya bacê hez dike: Cîranê bûye "patron", bacekê li ser ji % 25ê mehaneyan dide.

Jîyana rojane hinek diguhere. Vegotin berevajî wê dibin… Di adara 1968ê de, **Fidel Castro** li hemberî vê yekê derdikeve û weha dibêje: *"Ev beşê piçûk ê nifûsê ku li ser pişta yên din dijî, (...) ev çavbelên siheta wan li cî ku xwe didin paş dezgeyekê, yan karekî piçûk dikin da ku rojê pêncî pesoyan qezenc bikin)"* (7) Hîn du roj di ser vê axaftinê re derbas nebûn, kargehên taybetî –bar, market, tamîrxane her weha necartî, hostên dîwaran û temîrkerê tesîsatên avê– çi bigire hemî wenda bûn. Di çirîya paşîn a 2010ê de, vegotina resmî hate guhertin. Teşebusên taybetî ?, *Granma bi kelecan dinivîse*: *"Teşebuskerên bi niyeta baş"*, *"bi nifûzeke etîk"*, serketina wan *"dê bibe beşeke girîng a serketina nûjenkirina modela aborî ya kubayî"* (8)

Sala 1995ê, diviyabû hemî hewesa zengînbûnê bi kêmkirinê bihata sar kirin, weke mînak, xwaringehên piçûk ên taybetî bi duwanzdeh maseyan bi sînor kirin. Piştî panzdeh salan, "daneserhev" êdî birastî jî nema kesî ditirsîne. *"Divê mirov durist be; ger, piştî ku hemî mesrefên xwe derxe, karkerekî serbixwe bi hatinîyeke mehane ya di ser mehaneya navincî ya îro re kar dike, gelo di vê de bi rastî tiştekî nelirê heye?"*, rojnameya Partîya Komunîst a Kubayê dipirse. Piştî hertiştî, *"sermîyanek, bi xebatê tê civandin, hêdî hêdî, bi tecrûbeyê, roj bi roj bi baştirkirina kalîteya xizmetê, heta bi bişirîna ku dilê mişterî xweş bike"*. Di çileya paşîn a 2011ê de, kovareke katolîk ji xwe re payekê derdixe ku Kuba êdî *"bêyî ku ji dewlemendîyê bitirse"* bi siberoja xwe dilebike. (9)

Lê armanca reformên ku ji alî **Raúl Castro** ve hatine dest pê kirin, ne bi tenê serbestkirina wî tiştî ye ku doh qedexe bû. Ev yek herweha, weke **Alfredo Guevara**, yek ji întelektuelên kubayî yên herî bi navûdeng, li seranserê welêt dubare dike, aborîyeke bi rêbaz û kontrolê êdî nikare kesî razî bike, divê ew be *"bêdewletkirin"*. Nimûneyek: Beşekî mezin ê firingîyên (tomat) berhevkirî yên 2009ê di cihên xwe de xera bûn: Ji ber fermana divê ku vala neçin li ser wan hebû, kamyonên dewletê di wextê xwe de nehatin. Van firingîyan bişînin kargehan, li ber pozê wan da ku wan bikin ava bacanan? Ne mumkin e: Ji ber ku tiştekî wiha di rêznama têşebusê de nehatibû pêş dîtin. *"Ma bi rastî jî pêdivî ye, ku Dewlet biryarê li ser heqê jêkirina por jî bide?"*, **Jorge Luis Valdès** li ber çavên me, ji Rêxistina Aborînas û Bisporên Mihasebê yên Kubayê pirsî, bêyî ku bi rastî jî li benda bersivekê bimîne. Berîya reformên nîsana 2010ê, *her vê teşebûsê hemî kuaforên welatî gihandin hev. Bi hisabê herî piçûk guhastina sektorê bi ya taybetî, ne bi tenê qazanceke 630 milyon pesoyî di neh mehan de bi xwe re anî, lê herwiha hatinîyeke zêde ya 660 milyon pesoyan pêk anî"*.

Ji bo ku patikekê di dema herî kurt a pêwîst de kurt bike, **Jorge** deftera xwe ya piçûk derxist, qehweyek anî û cixareyek vêxist. *"Berîya nîsana 2010ê, bihayê resmî yê kurkirinê 80 santîm bû. Lê vê yekê rê li ber kuaforan nedigirt, ku ji mêrekî ji 5 heta 20 û ji jinekê heta 100 pesoyan bixwazin. Dewletê servîsa av, elektrik û telefonê dikir, ku herkes karibe jê îstifade bike û li hemberî vê xizmetê dixwest ku hevwelatî pesoyekê bide salonê. Ji bo çar kuaforan, bikêmanî du nobedar, jineke ku paqijîyê bike, muhasibek, birêveberek û her weha yek an jî du kes ji bo diwarê navberîyê bigirin, tayin dikirin. Hemiyan jî mehaneya xwe ji dewletê distand"*.

Jorge qehweya xwe vexwar û çend hilmên baş li cixara xwe dan. Li benda mixatebên xwe ma, heta ku têra xwe kuxiya, paşê dîsa dest bi karê xwe kir: *"Êdî her tişt hatiye guhertin. Kuafor serbixwe ne û her yek ji wan mehê 990 pesoyan hewaleyî qaseya dewletê dikin: 330 peso ji bo kirêya dikanê, 330 peso ji bo ewleyîya civakî û 330 peso jî baca li ser hêza kar didin. Paşê, ew bi kêfa xwe, kê ku bixwazin digirin û heqê wan jî li gor dilê xwe didin: bi awayekî giştî, jimara xebatkaran kêm dibe"*. Hemî ji kuaforan heta bi nobedarên jimara wan pir û karmendên dîwarê navberê, ji niha û heta 2020ê (halê hazir, % 90ê nifûsê ji bo dewletê dixebite) divê % 40ê nifûsa aktîf ji sektora dewletê derbasî ya taybet bibe. Jorge cixara xwe dipelixîne û axaftina xwe weha diqedîne: *"Maliyeta hindik, hatinîya pir e, ev tişt hemî li gor berjewendîya dewletê ne.*

Kartêkerî, berhemdêrî, aborî: Ev nîqaş ne nû ye, heta li welatên ku peyva "sosyalîzmê" ji sîmaya **Che Guevara** bêtir ya **Dominique Strauss-Kahn** tênê bîra mirov jî, her eynî tişt tê gotin. *"Çima em ê ji gelên din ên cîhanê cihê bin?"*, **Jorge** li dij derdikeve. *Divê em hemî belaşîyên li welatê xwe ji holê rakin"*. Belaşî? *"Her tiştê ku dewlet belaş ji bûyîna wan heta mirina wan li kubayîyan belav dike, ji bo wekhevîya wan misoger bike"*.

Bi kêmkirina rola hatinîya diravî di gîhaştina refahê de, ev belaşbûn dê motîvasyonê kêm bike û bibe asteng li pêşîya pêşketina aborî. Sosyalîzma kubayî jî, bêyî ku vekirî behsa bidûrketina ji prensîpê "wekhevîyê" bike, êdî pir kêm ji wekhevîyê xeber dide. Çareserî: Jinavbirina "belaşî"yan û weke ku **Raúl Castro** jî, di 27ê çileya paşîn a 2008ê de dibêje *"divê qîmetê rasteqîn ê mehaneyan bê dayin"*. Bi ser ve zêde dike: *"Alternatîfa vê yekê tuneye"*.

500 000 karker ji kar tên derxistin

Di 27ê îlona 2009ê de, cîgirê serokê Konseya Wezîran, **Ramiro Valdés**, ji kubayîyan re got *"divê em her tiştî ji diya xwe dewletê hêvî nekin"*. (10) Êdî, pasteyên zewacê û heqê otelê yê ji bo meha hinguv yên ji alîyê dewletê ve hatin dayin, bi dawî bûn. Her weha, kantînên (belaş) ên çar wezaretan li Havanayê neman: Karker li şûna wê rojê 15 pesoyan heqê xwarinê distînin (halê hazir, têrê dike). Û belbî di demeke nêzîk de *libreta*ya ku ji bo wê pêşniyara bi dokumanê jimara 165ê pêşkêşî Kongreyê hatiye kirin û pêşniyar dike ku li şûna wê *"alîkarîya civakî ya biarmanc"* ji bo *"kesên ku birastî jî pêdivîya wan pê heye"* hatiye cî bî cî kirin jî nemîne – weke ya ku êdî li welatên din ên Amerîka Latînî tê bi cih anîn.

Ji alîyê din ve, sendîkayê bi tenê daye ser xwe ku di mehên li pêşîya me de, jikarderxistina 500 000 karkerên dewletê îlan bike. Ev karker dê piştî jikarderxistinê bi mehekê jî mehaneya xwe bistînin, piştî wê bi mehekê jî, yên ku ji nozdeh salan kêmtir xizmeta wan hebe, dê % 60ê tezmînata xwe, yên ku ji bîst û şeş heta sî salî xebitîbin sê mehan, yên ji sih salan zêdetir xebitîbin, pênc mehan, dê bistînin. (11) Îhtimaleke mezin, ev yek ji bo motîvekirina wan e, da ku bêyî dereng bimînin ji xwe re ji nû ve di sektora taybet de karekî bibînin.

Lê keseke/î ku deh sal di wezaretekê de derbas kiribin, gelo dê karibe di nav du mehan de bibe cotkar, berber an hosteyê dîwaran? Em dizanin ku yekî ev tarîx derbas kiribe, tu sîstema ewlehîyê dê mesrefên wî yên tenduristîyê negire ser xwe. Ji vegotinên îlahî û wê de, ekonomîst **Omar Everleny Pérez** –ku bêtir weke yek ji bavên fikrî ê reformên pêk tên e – wiha dibêje: *"Erê, mirovên ku ev reform wê zirarê li wan bikin jî dê hebin. Erê, dê mirovên ku bi carekê xwe di nav bêkarîyê de bibînin jî wê hebin. Erê, dê newekhevî zêde bibin"*. Jixwe ev rewş, dê wer dewam bike, *"ew jî berê de heye, ne nû ye; îro, wekhevîya me ya heyî, wekhevîyeke sexte ye. Tiştê ku divê em wê yekê ji niha ve dest nîşan bikin, ev e: "kî bi rastî jî hêja ye li jor be"*.

Di 9ê sibatê de, xebatkarên klînîkeke navenda bajêr li hev civiyan ku *lineamientosanê* minaqeşe bikin, belgeya vê minaqeşeyê pêşkêşî kongreyê hat kirin. Tam sî û du rûpelên ku 291pêşniyarên ku hin ji wan siberoja hemî kubayîyan dixist bin bêr de: Mehaneya hêjabûnê, bi qanûnê tayinkirina "fîyata bazarê", sererastkirina bernameyên civakî. Ev hemî di çend deqeyan de, bi yekdengî hatin qebûl kirin. Lê besdaran ji bo piştgirîya xwe bo sîstema perwerde û tenduristîyê ya kubayî dest nîşan bikin, qet ecele nekirin. Guhertin, erê; lê ne bi vî rengî. Sekreterê rûniştinê, berpirsê beşa sendîkayî, balkişandinan not dike – bêyî ku kesek bi rastî jî zanibe bê çawa û bi çi awayî ew ê li ber çavan bên girtin.

Tevî vê jî, gelo tu xetereke ku reformek yeke din bikşîne, paşê yeke din, yeke din, berpirsên kubayî dê di encamê de tênegihên ku texmîn bikin bê "rojanekirin"a "fethên civakî" yên welêt pêdivî ne, yan na? Mînakên dîrokî, ji rêvekirina aborî ya çînî ya reformên xizmetên giştî li Fransayê kêm nabin, ku fikra senaryoyeke wiha nîşan didin. Ew weke mînak Parlamentoya Neteweyî, ku ew bixwe serokê wê ye nîşan dide: *"Pir bi hêsanî mirov dikare rikeberîyekê bi reformekê re bike ku xwe wiha nîşan dide û gava dema wê bê, dengê xwe li dijî wê bide"*. Dê desthilatên rikeber her bijîn wê gavê? Sala 1976ê, ji her ku ava bûye bi vir de, Parlamentoya Neteweyî dengdaneke wiha tu caran tomar nekiriye ku dengekî mixalif jî li dijî deqeke ji alî hikumetê ve hatibe pêşkêş kirin, derkeve...

Di 10ê adara 2011ê de, resmek di *Granma* "yek"ê de: Xortekî bişewqe ku pişta xwe daye stûna lempeyeke kolanê, ji kalekî re ku di rê re derbas dibe, dibêje: *"Hinek pere, bapîro?"* Ji "pere" re, bi spanyolî, *cambio* tê gotin –ku her wiha jî tê mana "guhertin"ê. Û "bapîr" bersiva wî dide: *"Helbet, kurê min! Bêgûman, lawo! Bi rastî jî niha wexta guhertinê û bi duristî xebatê ye!"*

* Rojnamevan

1 Her çend peyveke bi tenê ji bo guhertinê tunebe jî, peyvê dîsa jî cîyê xwe girtiye

2 Ji 24ê sibata 2008ê bi vir de, piştî ku ji ber nexweşîya birayê xwe, di 31ê tîrmeha 2006ê de ji bo demekê weke serok hate bi nav kirin

3 Axaftina 26ê tîrmeha 2007ê

4 *Cuba. A new history (Kuba. Dîrokeke nû)*, Yale university press, New Have, 2004

5 "Fidel, the church and capitalism (Fidel, dêr û kapîtalîzm)", *The Economist*, London, 14ê tebaxa1997ê

6 Axaftina 18ê çileya paşîn a 2010ê

7 Ji ber Richard Gott hat girtin, *Cuba., pirtûka li jor behsa wê hat kirin*

8 Félix López, "Opinión por cuenta propia", *Granma*, Havana, 18ê çirîya paşîn a 2010ê

9 Olando Márquez, "Sin miedo a la riqueza", *Palabra nueva*, hejmar 203, Havana, çileya paşîn a 2011ê

10 "Gobierno pide a los cubanos "no esperar que papá Estado venga a resolverles todo"", 27ê îlona 2009ê, noticias24.com

11 Janette Habel, "Changement de cap à Cuba ? (Li Kubayê guherîna rêgehê)" bixwîne, *Le Monde diplomatique*, çirîya pêşîn a 2010ê

Wergera ji fransî: Yaqûb Karademîr

Berî pêncî salan, Tengava Berazan

HERNANDO CALVO OSPINA

Şoreşa Kubayê, ku di 1ê çileya 1959ê de bi ser ketibû, pir bi lez bûye armanceke sereke ji bo Waşîngtonê. Di pirtûka xwe ya bi nav û deng de, **Haynes Johnson** weha dibêje: *"17ê adara 1960ê, serokkomar* ***Eisenhower*** *destûr da Central Intelligence Agency (CIA) ku pênaberên kubayî bi rêk bixe, entrenman û teçhîz bike da ku hêzeke gerîla ya dij-kastroîst pêk bîne"*. (1) **Tim Weinerê** xelatgirê **Xelata Pulitzer** şirove dike ku ji bo vê yekê, CIAyê bang li heman kesan kir ku sala 1954ê *"berîya şeş salan hikûmeta* [Jacobo Arbenz li] *Guatemalayê ji desthilatdarîyê xistibû)"*. (2)

3yê çileya1961ê, **Eisenhower** têkilîyên li gel Havanayê qut dike. 20ê vê mehê, **John Fitzgerald Kennedy** cihê wî yê li Qesra Spî digire. Yek ji fermanên wî yên herî pêşî ew e ku amadekarîyên dagîrkerîyê bên bi lez xistin -tevî ku li hemberî raya giştî bi dubareyî dibêje dê tu êriş li ser girava Deryaya Karayîbê pêk neyê. Lê proje êdî ne bi dizî ye. **Johnson** diyar dike: *"Dê dagîrkerî pêk bihata û li Kubayê haya her kesî jê hebû. Ji* ***Fidel Castro*** *bigire heta* ***guajiro*** [gundî] *yê herî xizan ê li nav zevîyan"*. Moskva û Pekîn bi israr ji Waşîngtonê dixwazin ku vê kiryarê pêk neyîne, ew dewam dike û *"hem li Londonê hem jî li Parisê, hem li Bonnê hem jî li Romayê, tansîyoneke neditî peyda dibe û bê navber radibe. Dinya hemû* ***kakûnîyan****dike, awir zîvirîne ser Kubayê"*.

Roja 15ê nîsanê CIA heşt balafirên B-26 -ku nîşanên hêzên hewayî yên kubayî li ser boyax kiribûn- dişîne da ku warên parka teyareyên Hêzên Hewayî yên şoreşgerî bombebaran bike. Nîvê sî û şeş balafiran îmha dibe. Pirtûkeke ku hevnivîskarê wê Fidel Castro ye -yek ji pirtûkên hindik ku versîyona kubayî ya bûyeran piştrast dike- talîmatên ku serfermandar dotira rojê dabû xelkê giravê, weha vedibêje: *"Divê her kubayî cihê xwe di yekîneyên leşkerî û navendên xebatê de bigire, bêyî ku hilberîn û kampanyaya xwendewarîyê bên rawestandin"*. (3) Heman rojê, di binaxkirina qurbanên bombebaranan de, **Castro** dibêje: *"Ya ku nikarin efû bikin ev e (...) ku me şoreşeke sosyalîst li ber çavên DYAyê pêk aniye!"*. Ew ji bo cara yekem, bi awayekî fermî, şoreşa Kubayê bi projeya sosyalîst ve girê dide.

Endamên lîwaya 2506ê a ji 1511 leşkerên li Guatemalayê temrîn û perwerdekirî û ji Nîkaraguayê derketî pêk hatî, 16ê nîsanê, saet di 23 û 45 deqîqan de, li **Playa Giron** pê li erdên Kubayê dikin. 70 saet di ser re derbas nebûn ku lîwa têk çûbû: 1197 endamên lîwayê esîr bûn û 114 jî hatibûn kuştin. Tu hewldana raperîna navxweyî nebû. **Weiner** weha rave dike: *"CIAyê anketeke ku wê xwestibû pêk were û ya xuya dikir ku piranîya xelkê piştgirîya Castroyî dike, pişt guhê xwe xist"*. **Howard Jonesê** lêkolîner dibêje ku CIAyê pê zanî ku *"bê raperîneke girseyî, dê qet nebe pênc hezar kes ji hêza dagirker re lazim bibûyana da ku beşeke ji welatî dagîr bikin"*. (4)

24ê nîsana 1961ê, serok **Kennedy** tevahîya berpirsyarîya DYAyê di dagîrkerîya têkçûyî de qebûl dike. **Fidel Castro**yê serkeftî weha îlan dike: *"Emperyalîzma* ***yankee*** *li Amerîkaya Latîn, derba xwe ya mezin û pêşî xwariye!"*. **William Colby**ê kevneserokê CIAyê dide zanîn ku, bi pey vê "rûreşîyê", Kennedy *"ji ber hêrsa xwe bi meyl bû ku "xwelîyên CIAyê li çar alîyên cîhanê belav bike""*. (5) Li gel birêkirina 53 mîlyon dolarên xurek û dermanan ji Waşîngtonê bo Kubayê, 22ê kanûna 1962ê, girtî azad dibin. 29ê mehê, di ber merasîmeke li Miamiyê re, ew ala Lîwayê pêşkêşî Kennedy dikin. Serok bi awayekî merasîmane dibêje *"Ez we misoger dikim ku ew al dê li Havanayeke azad li we bê vegerandin"*.

Piştî panzdeh salan, Komeleya Kevnelîwayîyan ji Muzeya Kennedy xwest ku ew al ji ber soza bicihnehatî li wan bê vegerandin. Al bi rêya postê ji wan re hat şandin.

1 Haynes Johnson, *La Baie des Cochons. L'invasion manquée de Cuba [Tengava Berazan]. Dagirkirina Têkçûyî ya Kubayê]*, Robert Laffont, Parîs, 1965, 390 rûpel

2 Tim Weiner, *Des cendres en héritage - L'histoire de la CIA [Mîraseke bi xwelîyan - Dîroka CIAyê]*, Ed. de Fallois, Parîs, 2009, 456 rûpel

3 Fidel Castro û José Ramón Fernández, *Playa Girón*, Pathfinder, New York, çapa 4emîn, 2007, 314 rûpel

4 Howard Jones. *The Bay of Pigs [Tengava Berazan].* Oxford University Press, New York, 2010, 238 rûpel

5 William Colby, *Trente ans de CIA [Sî salên CIAyê]*, Presses de la Renaissance, Paris, 1978, 390 rûpel

Wergera ji fransî: Simko Destan

Cotmeh 1988

QIRKIRÎYÊN BI ÇEKÊN KÎMYAYÎ Û QURBANÎYÊN DAWÎ YÊN ŞERÊ KENDAVÊ

Lêgerîna kurdan ji bo stratejîyeke nû

CHRISTIANE MORE

ARŞÎVA BÎRA KURDAN

Christiane More Fakulteya Hiquqê ya Grenoble temam kiriye, naskirina wê ya kurdan di 1974ê de gava Barzanî li dijî zagona otonomîyê rawestiyaye, çêbûye. Li INALCOyê li ser kurdan xwendiye û gelek caran çûye herêmên cûrbicûr yên Kurdistanê, bi rêvebirên rêxistin û partîyên wan re hevdîtin kirine. Pirtûkeke wê li ser kurdan bi navê "Kurd Îro, Tevgereke Netewî û Partîyên Politîk" di nav weşanên L'Harmattan de derketiye.

Pêvejoya heta qirkirina Helepçeyê mijara vê nivîsê ye. Kurtedîroka têkoşîna hêzên kurd li Iraqê û piştî hatina Xomeynî ya ser hikumdarîyê rewşa tevgera kurd li Îranê bi mînakên gav bi gav polîtîka û dîplomasîya girift ku ber bi komkujîya kurdan ya bi çekên kîmyayî ve dibe, di kîjan pêpelîkan re derbas bûye, tên ziman. Îran û Iraq ji alîyekî ve li dijî hev şer dikin, ji alîye din jî her yek bi kurdên parçeyekî re li dijî parçeyê din şer dike. Bêçaretîya kurdan jî bi navê têkilîyê bi kar tînin û ew dixin rewşên têkbar û dijber. Derbasî sînorên xwe yên fermî dibin û dikevin pey nêçîra şervanên kurd, bombeyên kîmyayî dibarînin û ev rewş heta Helepçe dewam dike; li Helepçeyê hedef komkujîyeke sîvîl e, Sedam dest bi komkujîya sîvîlan dike ku bingeha hêzên kurd ya girseyî ji holê rake. Ne tenê Bexda û Tehran, herwiha Şam û Enqere jî di nav van têkilîyan de dijberîya hêzên kurd dikin. Gava kurd ji bombebarana kîmyayî xwe dispêrin welatên derdor jî, ew di destpêkê de vê yekê tenê ji bo xwe bi kar tînin û di rastîyê de alîkarîya gelê sîvîl nayê kirin. Sedam rê li ber ereban vedike ku li Kerkûkê bi cî bibin û gelek zêde pereyan dide erebên ku bi cî dibin, lê nahêlê kurd dakevin bajarê Kerkûkê, bi ser de kurdên niştecî jî bê mal û milk dikin û nahêlin ew li wê dere bijîn.

LMdkurdî

Di nav çend hefteyan de, zêdetirî 100 000 kurdên Iraqê, yên ji bombebaran û çekên kîmyayî revîyan, xwe li Tirkiyeyê girtin. Ev pêla ji nişkave ya koçberîyê dikare têkilîyên nazik ên Enqereyê bi Bexda û Tehranê re jî dijwar bike. Ev yek herwiha dikare bibe zemîna teşwîq û destekê ji bo serhildêrên kurd ên ji tebaxa 1984ê ve li herêma *Rojhilata Tirkiyeyê* çalakîyan li dar dixin û ji ber vê ev rewş dikare dengeya navxweyî ya Tirkiyeyê xira bike.

Dawîya nîsana 1987ê, rêxistinên kurdên iraqî lîsteya gundên kurdan ên ku hukûmeta Bexdayê biryara hilweşandin û valakirina wan dabû, radestî sefaretên hêzên mezin ên li Şamê dikirin. Wan herwiha bal dikişand ser îhtîmala bikaranîna çekên kîmyayî di çarçoveya bicihanîna plana ku di serê nîsanê de dest pê kir. Di dema geryaneke xwe ya Ewropa (1) û Dewletên Yekbûyî de, bihara 1988ê, serokê partîya *Yekîtî Niştimanî Kurdistan* **Talabanî** jî bi gilî û sitem, bal dikişand *"tevkujîya ku bi mehan e li ser gelê (wî) tê meşandin"* û ev tevkujî dişiband qirkirina ermenîyan ya di pêvajoya şerê yekemîn ê cîhanê de.

Tevî ku ji aliyê dîplomatên xwe û gelek rêxistinên mafên mirovan ve hatine hişyar kirin, hem hukûmetên *Rojhilat* hem jî yên *Rojava* dîsa jî xwe li kerr û korîtîyê danîn û nexwestin dengê xwe derînin. Medyayan jî, bi temamî bala xwe didan ser rewş û çarenûsa şerên li enîya başûr ên navbera artêşa *Komara Îslamî* û ya rejîma ***baas*** û qet cih nedan bûyerên kambax ên li bakur rû didan.

Ji agirbesta tebaxa 1988ê ve ku ji bo vê gavê dawî li şerê *Kendav*ê anî û der barê qedera Iraqê de hin paytext rihet kirin, û piştî êrişên dawî yên ku Iraqê li gel çekên kîmyayî birin ser Kurdistanê, civata navneteweyî kete nav livûtevgerekê. 7ê îlonê, êdî serok **François Mitterrand** "endîşeya" xwe dianî ziman; 8ê îlonê, sekreterê Amerîkayê **George Shultz** jî, îlan dikir ku bikaranîna amûrên "dilxelîner û nemafdar" dikarin têkilîyên Amerîkayê yên bi Bexdayê re xira bikin.

Ev helwêstnîşandan êdî hêsantir dibûn, bi taybetî bi rawestîna şerên li bereyên Îranê û bi vemayîna nepayî ya rejîma baas a ku li dijî Tehranê, nêzî tevahîya civata navneteweyî destek dabûyê. Fransayê çekên pêşketî tedarîk kiribûn; gelek welatan -Fransa, Îtalya, Qralîyeta Yekbûyî, Hollanda jî di nav derasterast an jî nerasterast destek dabûn bigewdebûna kargehên hilberîna çekên kîmyayî; Amerîkayê qût û xwurek tedarîk dikirin; Komara Federal a Almanyayê navgînên pîşesazîyê; Çînê jî di warê karûbarên mezin de hevkarî dikir... Lê belê peydekara bingehîn a çekên kevneşop ji bo Bexdayê, YKSS bû û vê dewletê bi eyarkirina têkilîyên xwe yên baş bi her du alîyên şer re, di heman demê de îtîbara xwe li cem kurdan jî diparast û winda nedikir. Rejîma **baas** îro êdî xwe wisa bi çekûrext kiriye ku dikare ji bo pirsgirêka kurd "çareserîya hetahetayî"yê bixe dewrê.

Rejîma ***baas*** a ji serkeftina xwe serxweşbûyî û heta qiriqa xwe biçekûrextbûyî, ji bo ku li dijî *"ecemê dijmin"* pê re bibin hevalbend, xwe nêzî kurdan dike. Berdêla hevalbendiya partîyên kurdên Iraqê li gel rêveberên Tehranê, careke din ji alîyê gelê sîvîl ve tê dayîn. Dîsa weke 1975ê, gava ***Peymana Cezayîrê*** ya di navbera Sedam Hussein û şahê Îranê de 6ê adarê hatibû îmze kirin: Ji bo berdêla rawestandina alîkarîya Tehranê ji bo serhildana Mistefa Barzanî ya li Kurdistana Iraqê, Bexdayê qebûl dikir ku sînorê başûr ê navbera her du welatan weke newala ***Şat El Ereb*** were dest nîşan kirin. Otonomîstên kurd ên bêparmayî ji alîkarîya ku bi temamî pê ve hatibûn girêdan, pir zû şikestin û rastî pelişîneke dilsotîner hatin.

Dîrok, herçendî detayên wê cihêreng jî bin, weke ku xwe dubare dike. Kurdên bi temamî dorpêçkirî û parçekirî bi taybetî di navbera sê welatan de –Iraq, Îran, Tirkiye-, hertim ketine pey alîkarî û pişgtirîya dijminên hukûmetên xwe û balkêş e ku her yek ji wan hukûmetan welatîyên xwe yên kurd diperçiqandin. (2)

Hêzên derve jî bêguman ne li derveyî vê lîstikê ne. Piştî şerê yekemîn ê cîhanê, wan bi kûrahî mohra xwe li dîroka Kurdistana nûjen da: Qralîyeta Yekbûyî, pêşî bi siyaseta xwe ya petrolê ji 1920ê ta şoreşa 1958ê û dûre jî heta neteweyîkirina petrola Iraqê di 1972yê de; Fransa, ji bo dijberîkirina li himberî *"Albionê bêbext";* Yekîtîya Sovyetê, di 1946ê de bi alîkirina yekemîn Komara kurd a Mehabadê an jî bi desteka carcaran a ji bo têkoşîna **Mustafa Barzanî** li Kurdistana Iraqê di navbera 1961 û 1975ê de.

Tevî vê yekê, bi pêşserdestîya tesîra amerîkî li ser Îran û Tirkiyeyê ya salên navbera 60 û 70yê, rêzikên lîstikê guherîn. Ji bo rejîma Bexdayê ya ku ji 1972yê ve bi *Yekîtîya Komarên Sovyeta Sosyalîst* (YKSS) re bi peymaneke dostanî û hevkarîyê ve hatibû girêdan, armancên stratejîk ketin pêşîya yên aborî.

Rapora veşartî ya Pike (3) a 1975ê, bi ronahîyeke balkêş vê vedora dîrokê zelal dike: Bi şandina çekan ji bo tevgera **Barzanî**, Waşîngtoneynî weke ya Tehranê – ne li pey serkevtina serhilêdaran bû; Waşingtonê ji bo ku rejîma baas qels bike û nehêle bikeve nav ti macerayeke navneteweyî, dixwest *"radeya hêza dijminên wê rejîmê di asteke têra xwe bilind de"* ragire. Di dema şerê cotmeha 1973yê de, li ser pêşnîyarên îsraîlîyan, kurd amade bûn ku li dijî artêşa Iraqê êrişekê bidin dest pê kirin, lê belê **Henry Kissinger** ew yekcar ji vê armancê vegerandin û ***pêşmergeyan*** bi ya wî kir. Bi wî awayî wan ew firset ji destê xwe revand.. Di adara 1974ê de, dîsa di bin tesîra nêrîna Dewletên Yekbûyî û Îranê de, **Barzanî** pêşnîyareke

RÊDÎ SEÎD TOPRAK: **Komwêneyên xanîjahrê I**, li ser tuwalê teknîka tevlîhev, 50 x 70 cm

lihevkirinê ya Bexdayê red kir. Piştî pelişîna 1975ê, 200 000 kurd xwe li Îranê girtin û li wir bûn penaber. Dema carekê li ser encamên siyaseta wî jê hat pirsîn, **Kissinger** ev bersiv dida: "*Nabe ku livûtevgerên îlegal bi karûberên misyonerîyê re bên tevlîhev kirin*." (4)

"Ceribandina hemû rê û rêbazan"

Ji destpêkirina şerê Kendavê yê îlona 1980yê û vir ve, tevgera neteweyî ya kurd, hem li Iraqê hem jî li Îranê, nefeseke nû stand. Li gel vê yekê jî, careke din, hevalbendên wê li gor şertûmercan guherîn. Li himberî rûdana ji nîşka ve ya êrişên Îranê di 1983yê de, rejîma ***baas*** ket nav danûstandinan li gel ***YNK***ê û rêveberê wê birêz **Talabani**, ku hevalbendîya xwe ya bi Komara Îslamî re ji bo demekê bi dawî anîbû.

Bi navbeynkarîya sekreterê giştî yê *Partîya Demokrat a Kurdistana Îranê* **Abdul Rahman Qasemlo** ku hevalbendê Bexdayê bû, YNKya ku Îranê ji bo kurdan ji Iraqê jî xetertir dinirxîne, agirbesteke bi rejîma baas re qebûl kir. Hêza din a mezin a muxelefeta kurd *Partîya Demokrat a Kurdistana Iraqê* ya kurê **Mustafa Berzanî**yê binavûdeng, **Mesûd Barzanî** jî dima weke hevalbendê rejîma îslamî.

Têkçûna muzakereyan a bêtir ji ber zextên Dewletên Yekbûyî û Tirkiyeyê –tevî ku Parîs û Moskovayê berevajîya wan alîgirîya lihevhatinekê dikirin- bû sedem ku **YNK** careke din vegere himbêza Îranê û hevalbendîya xwe bi **PDK**ya Iraqê û **PKI**yê re nû vebike. Û bi wî awayî careke din her tişt vedigeriya rewşeke ji berê jî adetîtir:Ji her du tevgerên neteweyî yên kurd ên rojhilat û başûr, her yek jê careke din bi dijminên hukûmeta xwe re, xwe di nav hevalbendîyê de didît.

Rêveberên YNKê, serwextbûyî ji şaşîyên **Mustafa Barzanî** yên 1975ê, tevî vê yekê îqna bûn ku **Ayetûllah Xomeynî** wê ti caran bi "xayîn **Sedam Husseyn**" re li hev nekira. Helbet wan, bi piçûkdîtina desteka navneteweyî ya ku Iraqê jê sûd werdigirt, tercîheke şaş kir.

Bi tamdana Tehranê, **Talabanî** di destpêka 1988ê de bi Enqerê re kete nav danûstandinan; lê belê rayedarên tirk ên ku hertim red kirine ku kurdan li dijî cîranên xwe bi kar bînin, xwe nedan ber daxwazên wî. YNK îca vegeriya ba ***Partîya Karkerên Kurdistan-PKK*** ya ku li rojhilataTirkiyeyê şerê çekdarî dimeşîne. Di navbera her du rêxistinan de 1ê gulana 1988ê li Şamê peymanek hat îmze kirin.

Bexdayê jî bersiveke zêde dijwar da lihevhatina kurd û îranîyan a ku li dijî tesîsên petrolê yên **Kerkûk**ê dibû tehdîdek. Di nîsana 1987ê de, artêşê gelek êriş dibirin ser bakur; yên kîmyayî jî di nav de, bombe dibarandin ser kurdan û ev rewşa kambax dibû sedemê koçberîyeke girseyî a kurdan. Ev pratîka koçberîyê ne tiştekî nû bû, lê belê vê carê êdî gihîşt asteke ji ya hemû demên berê dijwartir û sîstematîktir: Bexdayê hem têkilîyên "pêşmergeyan " ji gel qut dikirin, hem jî lez dida erebkirina Kurdistanê. Bi wî awayî, gundîyên kurd ên ji gundên xwe dihatin avêtin, nikaribûn li Kerkûkê bi cih bibin, lê belê her erebekî ku bi armanca bicihbûnê dihat Kerkûkê, di îlona 1987ê de, alîkarîyeke bi qasî 600 000 frank distand da ku bikaribe ji xwe re xanîyekî jî çêke.

Raya giştî ya navneteweyî dest pê kir dengê xwe yê dijber deranî, gava ku di adara 1988ê de li bajarê **Helepçe**yê zêdetirî pênc hezar kes, jin, mêr, zarok, hatin kuştin –ê ku berî demeke kin ji alîyê "pêşmergeyan" û hevalbendên wan ên îranî ve hatibû vegirtin– bi bikaranîna gaza girsekuj. Bexdayê hingê da xuya kirin ku ew xwedî *"maf û biryardarîyê ye ku li dijî dagîrkerîya Îranê û heta li dijî welatîyên xwe jî, her cure derfet û amêrên di destê xwe de bixe dewrê "*, welew welatîyên wê bi xwe jî bibin hedef.

Di îlona 1988ê de, li gel vê yekê jî, rejîma ***baas*** bikaranîna çekên kîmyewî yekcar înkar kir û li pêşîya sefareta amerîkî ji bo şermezarkirina tehdîdên ambargoya aborî ya ku hukûmet û senatoya amerîkî xwe amade dikirin li dijî Iraqê bixin dewrê, xwepêşandanên mezin dan li dar xistin. Û di vê navberê de şer jî dewam dike: Di nîvê meha îlonê de, artêşa Iraqê piranîya "deverên azadkirî " yên kurdan careke din vergirtibûn û sînorê bi Tirkiyeyê re jî ji nû ve xistibûn bin kontrola xwe.

Paşeroja muxelefeta kurd a Iraqê tarî xuya dike; bêhtir, bi her halî, ji ya ***PDK***ya Îranê. Tevgera **Qasemlo**, ya ku li dijî şoreşa îslamî şer dike, berevajîyê tevgera ***Mucahidîn a Mesûd Racavî***, hertim red kiriye çalakîyên xwe bi hevkarîya artêşa Iraqê bi rê ve bibe: Dibe ku bi îxanetê jî were sûcbar kirin, lê belê bi pêkanîna hevgirtineke siyasî bi **Sedam Huseyn** re, hewl da bibe xwedî otonomîyeke ku derfetê bidê ku karibe xwe li himberî peymaneke navbera rejîmên Tehran û Bexdayê biparêze û li ser lingan bimîne.

Zêdetirî sed hezar kurdên Iraqê ji niha ve li Tirkiyeyê bûne penaber û ew li vî welatî xwe digihînin gelek îranîyên ku ji ber rejîma ayetûllah **Xomeynî** reviyane. Serokwezîr **Turgut Ozal**, tevî vê yekê dîyar kir ku ew ê nikaribin heta dawîyê himbêza xwe ji pêla koçberîyê re vekin û da zanîn ku "Tirkiye wê nikaribe zêdetirî hejmareke dîyarkirî penaberan pêşwazî bike". Rayedarên vî welatî ji encamên vê koçberîyê endîşeyan dikin: Her çendî gelek kurdên Tirkiyeyê çalakîyên PKKê yên şidetê neecibînin jî bi sempatî nêzî armancên wê yên siyasî dibin û bi danûstandinên li gel birayên xwe yên ji Iraqê hatine, dikarin radîkaltir bibin (5) hê germtir bibin li çandeke ku Enqereyê pêvajoyeke dirêj hebûna wê înkar kiriye.

1 Hikûmeta Jacques Chirac tevî vê yekê jî wê hatina nav xaka fransî qedexe bike

2 "Gelê kurd, kozeke jibîrkirî li Rojhilata Navîn", le Monde diplomatique, cotmeh 1986

3 Bi piranî di Village Voiceyê de eşkere bû, New-York, 16 û 23 sibat 1976. Binêrin William Blum, The CIA. The Forgotten History, Zed, Londres, 1986

4 Voir William Blum, op. cit, rûpel 278

5 "Kurdistan: Pirsgirêkeke bêhempa", le Monde diplomatique, mijdar 1987

Wergera ji fransî: Baran Nebar

Komwêneyên ba-jahrê III, li ser tuwalê teknîka tevlîhev, 120 x 140 cm

WÊNESAZE VÊ HEJMARÊ

Rêdî Seîd Toprak

Di sala 1983yê de li bakurê Kurdistanê, li bajarê Rihayê, li navçeya Hewagê (Bozova) ji dayik bûye.

Di 2004ê de li Zanîngeha Çukurovayê, Fakulteya Perwerdeyê beşa wêneyê qedandiye û dîsa li heman zanîngehê di 2009ê de lîsansa bilind-mastir qedandîye.

Wênesazê kurd Rêdî Seîd bi xelatên ku di pêşbazîyên wêneyan de bidestxistine balê dikşîne ser xwe. Hîn di zaroktîya xwe de bi evîna xwe ya wênesazîyê beşdarî mîhricana sîyareka gurî (kelaynak) bû û xelata xwe ya yekemîn di 13 salîya xwe de wergirt.

Rêdî Seîd li gel jîyê xwe yê ciwan, hişmendî û zanyarîya welatparêzîyê pêş ve xistiye û di hunera wênesazîyê de bi kar anîye.

Yek ji taybetmendîyên wî jî giringîya ku dide zimanê kurdî ye. Di derheqê zimanê kurdî de hunermendekî hestyar e û tawîzan nade. 2008ê de di pêşbirkeke wêneyan de ji ber ku navên wêneyên xwe li gel zimanê tirkî bi kurdî jî nivîsandibû, bi astengan re rûbirû ma. Li ser vê yekê helwêsta xwe bi hevoka *'pişavtin evîna min a bo kurdî mezintir dike'* nîşan da.

Di xebatên hunermend de xaleke balkêş heye. Di nêrîna ewil de rengên wêneyan li ser temeşavanan tesîr û hesteke dilşikestî û reşbîn dihêle. Lê dema mirov bi kurahî li wêneyan binêre, hostatîya hunermend dibîne. Di warê jîyana rojane û bûyerên li derdorê diqewime de metodên wî yên taswîrê û motîfên bi kar tîne gelek balkêş in. Ev balkêşî ne ji motîf û metodên bikartîne, lê ji hestyarî û zimanê wî yê siyasî tê…

Hunermendê ku kompozîsyonên wî gelek bi hêz in; bi jêhatîbûna xwe ya li ser sî û ronîyê bala mirovan dikşîne. Wênesazê kurd ê ciwan û biserketî ku mirov dikare wek hosteyê kolajê biwesifîne, di xebatên xwe de bi giranî li metodên tevlihev û kolajan hûr dibe.

Hunermend heta niha li gelek bajarên Tirkîyê beşdarî pêşangehan bûye. Ji bo agahdarîyên zêdetir li malpera, www.redisaittoprak.net binerin.

REWREWKA XIZMETÊN JI BO ŞEXSAN

Modela qerwaşa di bin xizmeta malbatekê de li hin herêmên cîhanê, bi taybetî li welatên Kendavê û Asyayê hebûna xwe weke berê didomîne. Endonezya, Srî Lanka an jî Filîpîn di "îxrackirina" destkariya jinan de bûne pispor. Li Ewrûpayê, xizmetên nava malê û venêrîna li zarokan an jî li kesên ixtiyar bêhtir dikevin ser milên kesên bi meaş ên ji bo karsazan dixebitin û di parastina mafên xwe de pir zehmetiyê dikşînin. Ji aliyê dewleta fransî ve jinûve binirxkirina "xizmetên ji bo şexsan" lêçûnên ji bo konforê û heqdestên ji bo lêçûnên zarûrî tevlîhev dike; ew wekî din qet guh nade heqîqeta ku ev pîşesaziya îstîhdamê hem di warê newekheviyiyên civakî (nivîsa li jêr bixwînin) hem jî di warê newekheviyên navbera mêr û jinan de dewlemend dibe.

Laneta Melkesê

FRANÇOIS-XAVIER DEVETTER Û FRANÇOIS HORN*

Di navbera *Les Femmes du sixième étage (jinên qata şeşan)* ya Philippe Le Guay û *Ma part du gâteau (beşa min a ji pasteyê)*ya Cédric Klapisch de di medya dîtbar (sînema û televîziyon) de sala 2011ê cihekî girîng digirin. Ya rastî kesên di karûbarê navmalê de kar dikin, bûbûn aîdên demên bihurî ji serdema zêrîn a **Eugène Labiche, Georges Feydeau** û şanoyên gelêrî. Sînemayê rastîyeke civakî û statîstîk nîşan dida: Piştî dawîlêhatina Şerê Cîhanê yê Duyemîn, mezinbûna aborî ya "sihên navdar** " hêdî hêdî demên xizmetkaran ên bihurî ji holê rabûn. Ew hindê ku birayên Jacques ev tesbît dikirin "*ne xizmetkar, ne jî burjuwa êdî nînin*", aborîzanê amerîkî **Lewis Alfred Coser** çalakîyên "*kevin û dema bihurî*" tarîf dikir. (1)

Tevî ku "karkerên li malê" demeke dirêj komeke pîşeyî ya girîng pêk dianî, heta bi ji sê paran yekê kedkarên jin ên li welatên cihê ên mîna Dewletên Yekbûyî ji salên 1920ê û pêve yan jî Yewnanîstana ji salên 1950yê û pêve. Li Fransayê bixwe, li destpêka sedsala 20ê nêzî milyonekê karên li malê di nav bîst milyon mirovên xebatkar de hebûn. Di warê hejmarê de girîng bûn, belê xizmetkaran pîşeyekî bi maneya klasîk pêk nedianîn, ew nisbî bêtir şert û mercekî îfade dikin. Bidestxistina mafên sivîl dirêj kişand. (2) Herçî mafên civakî ne, dema ku mirov li ber mûçegirên din bigire, timî di rewşeke xirabtir de bû... Dîsa, ev rewş ne bi tenê li Fransayê wisa ye û pirsgirêka pêkanîna huqûqa kar a ji bo van karên hinekî taybet timî li gelek welatan derdikeve pêş. (3)

Başkirina statuya mûçegirên di karê di nav malê de bêtir zehmet dibû, lewre hejmara wan her kêm dibe. Di destpêkê de qet nebe, ya ku her kêm dibû daxwaz nebû, lê hê bêtir pêşnîyaza kar bû. Destpêka sedsalê, "*xizmetkar weke nanê germ ji destan dihatin revandin*" (4) û "pirsgirêka xizmetkar" bi dijwarî dikeve rojevê: Namzedên ji bo vî karî kêm dibin. Ev pîşe dibe yê jinan û xizmetkar her ji herêmên gundan ên herî dûr tên. Ev serdema Bécassine (5) e... Bi xebitandina jinan a li fabrîkeyan re, Şerê Cîhanê yê Yekemîn şoka pêşî pêk tîne. Û heke krîza sala 1929ê meyildara hejmara mirovên karûbarê malan dikin zêde bike jî, kêmbûna dîrokî êdî dest pê kiriye. Ew piştî sala 1945ê bi lez dibe. Pêşî spanî, paşê portugalî şûna ciwanên ji gundan tên digirin. Nexasim modela xizmetkara li mala karbidestê xwe tê bi cih kirin, bi lez û bez ji holê radibe. Vegotina hestbar a **Maria Arondo** (6) şahidîyê li vê derbasbûna ji cîhanekê ber bi cîhaneke din ve dike: Jina karên malê dike ya ku gelek kes karbidestên wê ne, her diçe bêtir xwe ferz dike. Tevî ku ev veguherîna karên malê li tevahîya welatên Ewropayê jî pêk hat, vejîna îstîxdama li nav malê (*live in domestics*) jî li welatên Derya Spî ji dehsalekê ve rastî ye. Saetên kar ên serê karbidest kêm dibin û têkilîya kar jî di nav peymanên kar ên her diçe bêtir ne fermî de ronî dibe. Kurt û kurmancî her diçe kêmtir kar û her diçe kêmtir kesên hatin karê wan fermî hatiye qeyd kirin.

Sektor di salên 1980yê de dadikeve asta xwe ya herî kêm: Li Fransayê Enstîtûya Neteweyî ya Statîstîk û Lêkolînên Aborî (INSEE) bi zor dusedhezar karkerên karûbarên malê dijimêre.

Krîz û li ser piyan girtina bêkarîyeke girseyî wê di vê demê de "şansekî nû" bidaya sektorê. Bi carekê, ev karên dema wan bihurî, bûne xwedîyê statuya "depozitoyên kar" ku divîya bi awayê herî baş bên bi kar anîn û mêhtin. Ji destpêka salên 1990ê ve tedbîrên teşwîqê li pey hev hatin: Ji bo teşwîqa karûbarên malbatî ji prîma civakî muafkirin, daxistina baca li ser hatinîyê, çeka kar a xizmetê ku wê bibûya "gerdûnî" (CESU), sala 2005ê avakirina Ajansa Neteweyî ya Xizmetên Kesan (ANSP)... Argumana afirandina îstîxdamê ev siyaset têra xwe dikir konsensuel "her kes pê razî". Bi tenê hejmara daxistina baca li ser dahatê bi siyasetên cihê guherî, lê belê prensîp nekete ber lêpirsîn û gengeşîyê: Alîkarîdana kesên ku wê kar bidin jinên karûbarên malê dikin, yê yekê kar û îstîxdam afirand (yan jî fermî û qanûnî kir). Û heke mesref ji kontrolê derdikevin, yan jî heke ev alîkarî bi tenê bi kêra yên herî dewlemend werin jî ne girîng e.

Herçî Komîsyona Ewropayê ye ew berjewendîya mekanîzmayeke weke CESU derdixe pêş û Belçîkayê bixwe navekî mîna "karê xizmetê" afirand ku hê bêtir merd e. Lê belê hinekî bêtir bi zehmet e, lewra pêdivîya vî karî bi strukturên xizmeta alîkarîyê heye. Têra xwe gelek welatên din derfetên teşwîq û destekdayînê lêdikolin û tecrûbe dikin yan jî ... siyaseta xwe ya koçberîyê li gor rewşê diguherin. Weke prensîp welatên Derya Spî herikîna koçberîyê li gora ku bi kêrî "sektorên lipêşgirtî" bê organîze dikin (Spanya, Îtalya) yan jî çavên xwe li zêdebûna karê neqanûnî digirin (Yewnanîstan). Lewra bersiv pir kêm ji hev cihê bibin jî, pirsa navendî her heman pirs e: Karê xizmetkarîyê çawa dikare bê erzan kirin? Subvansîyonên fransî mesrefan nîvî bi nîvî kêm dikin. Li Yewnanîstanê di van sektoran de xebitandina arnawid û ukraynî, li Îtalyayê ukraynî û romen, li Spanyayê mirovên ji başûrê Amerîkayê encameke têra xwe nêzî vê bi dest dixe. Vejîna karê xizmetkarîyê li Ewropayê (çawa berê li Dewletên Yekbûyî jî qewimî) di çarçoveyeke zêdebûn û nexasim jî jinbûna koçberîyê de xwe dide der. Wisa xuya ye ku hin welatên mîna Îndonezya, Filîpînan (*hevpeyvîna Julien Brygo bixwîne*) an jî Ukraynayê di îxrackirina karkerên xwe yên jin de bûne bispor.

Vejîna karê xizmetkarîyê du pirsên sereke derdixe pêş: Sînorê xizmetên ku desthilatdarîyên dewletê teşwîq dikin çi ye? Û divê asta birêxistinkirina xizmetên tê dayîn çi be? Pirsa pêşî berê me dide ser terîfkirina xizmetên dikarin sûdê ji fînansmana dewletê bigirin û bi taybetî cihêkirin yan jî cihênekirina karûbarên lêmiqatebûnê (*care*) û karûbarên paqijîyê (*clean*). Di rastîyê de navê "xizmetên ji kesan re" di nav xwe de heterojenîtîyeke mezin a karûbaran dihewîne ku em dikarin dîsa jî li du birên mezin dabeş bikin: Li alîyekî xizmetên konforê yên bi kêrî malên dixebitin, ên xweşhal tê (teqrîben paqijîya malê) û li alîyê din xizmetên alîkarîyê ji bo kesên hesas û nazikbûyî, ango zarok û pîrûkal (lêmiqatebûn).

Di pratîkê de ev kar dikarin bişibin hev. Di navbera lêmiqatebûna çarçoveya jîyanê û alîkarîya ji bo jîyana rojane de nuqteyên hevpar hene. Lê belê mentiqên ku dikin daxwaza ji bo van herdu xizmetan derkeve holê dijberê hev in: Li alîyekî daxwaza nekirina karûbarên ne bi dil û nexweş heye, li alîyê din nemumkinbûna dewamkirina xweserîya ferdî û muhtacî kesên din bûn. Wekî din, ji bo mirovên hesas û nazik bikaranîna xizmetên karûbarên malê têra xwe kêm girêdayî asta hatinîyan e. Berevajîyê vê, daxwaza xizmetên konforê li gorî hatinîyan diguhere: qederê ji sê paran yekê malên çalak ên ku beşek ji %5ê herî dewlemend e, alîkareke karûbarên malê ya bi mûçe digirin; li hemberî vê bi tenê %2yê wan kesên ku hatinîya wan di bin hatinîya navînî re ye, alîkareke karûbarên malê digirin. (7) Aktorên alîkarîya li malê (mûçegir, komele û hwd.) wekî din bi israr li ser wan cihêtîyan radiwestin ku di xizmetên karûbarê malê de bi wan re rûbirû dibin. Dîsa jî siyaseta li gelek welatan tê kirin, paqijî û lêmiqatebûnê tevlîhev dikin. Li welatên Derya Spî rewş ev e; ev welat gelek alîkarên lêmiqatebûnê, hemşîre û alîkarên dayînan ên ji welatên başûr ber bi xwe ve dikişînin û hewl didin kêmasîya dewletên xwe ya civakî telafî bikin bi teşwîqkirina karên mûçegirên li cem mirovên pîrûkal tên bi cih kirin.

Lê belê ev her weha rewşa li Fransayê ye jî, nexasim ji 2006ê ve ango ji dema ku "plana pêşdebirina xizmetên ji bo kesan", yan jî "plana Borloo" hatiye pêk anîn û vir ve: Karên li malê tên kirin hemû, çi alîyekî û navekî wan ê civakî hebe û çi jî nebe, sûdê ji heman avantajan (daxistina bacê veguhertin kredîya bacê bi tenê ji bo kesên ku dixebitin, ev kes li gorî pîrûkalan jî, bêtir xwedî avantaj in) digirin. ANSPya di vê çarçoveyê de hat damezrandin, di kampanyayên xwe yên reklamê de "berhemekê" bi nirx dike ku di nav gelek tiştan de dike bibe "*dayikeke baldar, hevkareke dilbirehm, jineke bextîyar*! Li hemberî vê hin welatên din nexasim yên Skandînavyayê hewl didin van herdu xizmetan bi awayekî ku ji hev pir zêde cihê ne, ji hev bikin. Ew hewldanên dewletê zêde dikin li ser lêmiqatebûnê û xizmetên li cem kesên hesas û nazik –xizmetên konforê ji lîstika serbest a bazarê re hatine hiştin û heman rêzik û qaîdeyên li ser sektorên din ferz li ser wan jî ferz in. Karên xizmeta navmalê bi pêş nakevin, lewra bûhayê ji bo karûbarên mirov dikare bi xwe jî bike ewqasî zêde ye ku pêşîyê li vê yekê digire.

Pirsa duyem ya ku dikeve ber siyasetên dewletê yên der barê "xizmetên ji bo kesan", li ser şûna karê qaçax e (karê li cem dewletê nehatiye qeyd kirin) yan jî li ser şûna karê yekser (hişke hişk) li gor karê xizmetdayînê ye (kolektîfên dewletê, komele yan jî şirket ên ku dikarin kêmûzêde werin kontrolkirin).

Ji nû ve îxtîlafek di navbera bakur û başûrê Ewropayê de pêk tê. Welatên Derya Spî tercîh kirin ku sektoreke pir kêm fermî bûye û lê karê yekser li her deverî serdesttir e. Heke rêxistin bi pêş kevin jî armanca wan a sereke ew e ku têkilîyê di navbera karbidest û karker de deynin û dema vê dikin hewl nadin bikevin navbera têkilîya kar bixwe.

Berevajîyê vê, li welatên bakurê Ewropayê, ji sala 2005ê ve li Fransayê şirket yan jî komeleyên xizmetdayînê bi pêş dikevin ku ji berê ve reng û ava didin kar. Navbênkarîya wan her car şert û mercên kar û kardarîyê yên mûçegirên di sektorê de baştir nake, lê belê ew rengê têkilîyan diguhere dema ku wan ji dirûvê kesbûnê derdixe. Heke em bi awayekî hêsan bibêjin, ev rêxistin navê karkerên bispor (OS) ên paqijîyê li jinên karûbarên navmalê dikin, dike... Bi vî rengî nexasim li dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê şirketên xwedî gelek bask yên paqijîya navmalê bi pêş ketin, ew kar bi koman organîze dikin ku bi alavên ku yên şirketê bixwe ne, gurçûpêç bûne (weke mînak melkesê bi elektrîkê li pişta wan barkirî ye), li gor mezinbûna devera paqij dikin, pereyan distînin yan jî karê xwe hema hema weke sektora pîşesazîyê dabeş dikin. Modela bazarê ya welatên anglo-sakson û modela çalakîya civakî ya welatên Skandînaviyayê bi modela ji rêûresmê ya karûbarên navmalê ya welatên Derya Spî re bi îxtîlaf in.

Modela çalakîya civakî bi awayekî eşkere red dike ku xizmetên konforê û alîkarîya li malê tevlîhev bike û bi vê jî fikra sektoreke mezin a "xizmetên ji bo kesan" bixwe dixe ber lêpirsînê; herdu sîstemên din bi awayekî zelal û eşkere li ser newekhevîyên civakî mezin dibin. Heke fînansmana dewletê nebe, ev xizmet yekser encama hebûna qelş û newekhevîya hatinîyê ye. Heke em bi awirekî dîrokî ya di qad û asta fransî de lê binihêrin, yan jî ku qadên cihê yên neteweyî li ber hev bigirin, rêjeya malbatên jineke paqijîyê dike dixebitînin, pêwendî newekhevîya hatinîyê dimîne. (8) Analîza aborî ya herî klasîk vî mentiqê "bisporîyê" têra xwe bi comerdîyê mînakan nîşan dide: Heke ku dema min a vala ji dema jinên nekualîfîye biqîmettir be, ji bo

"Weke li otelê"

Dirûşmên promosyonê yên ku ji malperên Înternetê yên firmayên xizmetkariya ferdan hatin derxistin.

O2

Hevkarê jiyana rojane, armanca me ev e ku em beşdarî sazkirina hûnereke jiyanê ya nû bibin, ku dê pişkivîna jiyana pîşeyî û ya ferdî jî bi xwe re bibe.

Êdî li karê paqijiyê hay nebin, eger pirsgirêkek hebe, bizanin ka hûn pişta xwe bidin kê, kêf bikin, bêhtir wext ji hezkiriyên xwe re veqetînin.

Van prensîban bi awayekî xwezayî em ber bi oksîjenê ve birine: hilma oksîjenê ya ku rihat dike, dihêle ku em nefesê bistînin û herweha enerjî û jiyanê tîne hucreyan, azadî û rihatbûyînê temsîl dike.

Armanca me ev e ku em bibin oksîjena jiyana we ya rojane...

Shiva

Di planînga we de, cihê paqijiyê nemaye?

Hûn dixwazin wexta xwe ya azad ji karê paqijiyê yê mal an apartmanê re na, lê ji kêfê re veqetînin?

Ji bo ku jiyana we ya rojane hêsan bike, Shiva xizmeteke paqijiya malê ya li gorî pêwîstî û planînga we pêşkêşî we dike, ku xizmetkarên malê yên jêhatî û bi tecrube çêdikin. Ligel Shiva, zehmetkêşiya karê paqijiyê êdî serbihoriyeke jibîrbûyî ye.

Dem ji min re

Versiyona 2007ê :

"Rîtmeke xebatê ya lebat, êvareke li sînemayê, pêşbirkeke golfê li serê sibeha yekşemî, çûn û hatinên pîşeyî yên bê navber, dawiya hefteyekê li peraxa avê an jî daxwaza danûstandineke rihat... Dem ji Min re jiyana we ya rojane hêsan dike û dema hazir pêşkêşî we dike!"

Versiyona 2011ê

Rîtmeke xebatê ya lebat,

Êvareke li sînemayê,

Çûn û hatinên pîşeyî yên bê navber,

An daxwaza danûstandineke rihat...

Dem ji Min re jiyana we ya rojane hêsan dike û xizmetên xwe yên lêmiqatebûna zarokan a li malê pêşkêşî we dike.

Mal û xizmet, xizmetkarê min ê dema azad.

Joker, aferînerê azadiyê!

ADSP

Li malê weke li otelê!

Wergera ji fransî: Simko Destan

çi ez sûdê ji xizmetên wan negirim? Hesabên herî baş bi vî awayî nîşan didin ku ji bo ku ev "xizmetên ji bo kesan" bi pêş bikevin, divê di hatinîya malbata karbidest 5 caran ji ya karkerê zêdetir be. Şirketên paqijîya navmalan carinan vê newekhevîya pêwîst bi awayekî mirovan matmayî bihêle nîşan didin: "*Your time is precious, ours is affordable*", ev îdîaya şirketeke mezin a paqijîyê ya amerîkî ya xwedî gelek şax û şûbe ye *("Dema we biqîmet e, ya me dikare were kirîn û erzan e")*. Ev newekhevî hê pir dûr e ji wê yekê ku neerênî were dîtin, ev newekhevî weke kozek ji bo afirandina kar û îstîxdamê tên dîtin, di nav vî mentiqê "parzinandinê" de (dewlemendîya hinan li pêşîyê, di dawîyê de ji bo herkesî sûd û xêr e) yê li ber dilê neolîberalan bi nirx û qîmet: Çawa ku ANSP fikra *"pêdivîyên hinan ji bo yên din kar û îstîxdamê diafirîne"* derdixe pêş...

Yek ji kêm pîşeyên ku mirov ji bo wan serî li rêya koçberiyê didin

Û heke dewlemend têra xwe dewlemend nebin, hingê mirov dikare subvansîyonan bide wan. Mentiqa li Fransayê tê pêk anîn ev e. Karên kesên karûbarên navmalê dikirin heta bi salên 1950yê diketin ber bacên taybet, lê belê êdî ew mesrefek in ku divê werin teşwîqkirin: bêtirî 5 milyar euroyan li malbatên dewlemend hatin belavkirin (2.3 milyar li malên tenê yên kar dikin û 2.95 milyar li teqawidên dikevin ber bacê) bi rêya muafkirinên cuda yên ji bacê û civakî yên cihêreng. Ji bo ku em karibin li ber hev bigirin, em dikarin bibêjin ku ev subvansîyon bêtir e ji tevahîya mîqdara Alîkarîya li gorî Kesan a Xweserîyê a ji bo alîkarîya li malê didin pîrûkalan (3.3 milyar euro)...

> *"Jinên ciwan ji bo bimînin nayên cem me. Ev karekî demî ye. Lê belê ji bo jinên 40 salî, ew bixwe xwe di wê rewşê de nabînin ku bikaribin karekî din bikin"*

Lê belê ji bo ku ev kar bi pêş bikevin, ne bi tenê dewlemend pêwîst in: Divê herweha xizanên ku van karan qebûl bikin hebin! Li vir jî siyaseta ku ji sala 2005ê ve tê bi rê ve birin têra xwe hevgirtî ye: Bi avakirina Hatinîya Hevgirtinê ya Çalak (RSA) re mumkinkirina qebûlkirina karên mûçekêm, hêmaneke ku ji xêra vê sektorê re mirovan dike "çalak (karker)". Û heke ev têrê neke, hingê divê qebûlkirina pêşnîyareke kar a "mentiqî" were ferz kirin ... Hin karbidest vê fikrê baş li kurtî îfade dikin: *"Jinên ciwan ji bo bimînin nayên cem me. Ev karekî demî ye. Lê belê ji bo jinên 40 salî, ew bixwe xwe di wê rewşê de nabînin ku bikaribin karekî din bikin"*, sala 2008ê rêvebereke awahîyeke komeleyî ya ku sî kes dixebitandin bi vî rengî ji me re rave kiribû.

Nexwe bipêşketina van xebatan xwe disipêre newekhevîya hatinîyan... ku ew bixwe jî mezintir dikin. Lê belê newekhevîyên din jî –yên bêtir esasî– yên "statuyê" di nav têkilîyên civakî de hêlîna xwe çêdikin yên ku xisleta sektorê dîyar dikin. Dema mirov bi vî awirî li mijarê binihêre, daxwaza ji nû ve biqîmetkirina xizmetkarîyê bi serê xwe di têgehan de nakokîyek e. Karên paqijîya navmalê bi neqr û şopên civakî ve elaqedar in (cins û kokên etnîk); têkilîya xizmetkaran bi çop û pîsîyan re ev di dîrokê de weke pîşeyên "dil xelênek" pêk anîne (ku li Hindistanê ji bo kesên mirov nikare destê xwe bide wan hatine veqetandin), û bi awayekî sembolîk ji pîşeyên din ên nebikualîfîye cihê ne. Ew "qadên dûrxistinê" (9) pêk tînin: Karker dûrî awira giştî dikeve û berhema wî bi tenê dema neke tê hiskirin.

Nedarîçavîya mûçegir heta bi asta xwe ya herî bilind tê birin bi rêya kampanyayên ANSPyê yên ku melkesên bi elektrîk yên ji bo erebeyan û spreyên paqijîyê yên ji bo caman nîşan dide, ew jî weha xuya dikin ku bi kiryara Ruhê-Pîroz hatibin ruhdarkirin...

Karên elaqedarî guhdarîya navmalê (karkerên jin ên navmalê, paqijker, alîkarên li malê û xizmetkara navmalê) ji bo jinên di rewşa kêm û piçûk de bazareke têra xwe mezin pêk tînin, lewra dîplomayên wan, tecrûbeya wan, tevna wan nîne, yan jî bi tenê ne fransî ne. (10) Tevî ku li gor Îtalya û Spanyayê pir girseyî nîne jî, bikaranîna karkerên bîyanî di xizmetên ji bo kesan de bi awayekî eşkere di raporeke fermî de jî bû mijar: "*Di kar û pîşeyên tenduristî û xizmetên ji bo kesan û yên navmalê de koçberîyeke girîng tê bi kar anîn, ev yek ku demkî be jî dikare bi şertê ku kesên nûhatî di wan mercan de bin ku di karên pêdivî bi wan heye de bixebitin.*" (11) Di hezîrana 2008ê de biryara lihevkirinekê di navbera wezareta koçberîyê û wezareta aborîyê de hat dayîn. Ev peyman teahud dike ku berê koçberên bi gihandinahev a malbatê nû hatî ser erdên Franseyê, wê bidin ber bi ANSPyê ve da ku di kar û pîşeyên xizmetên ji bo kesan de werin perwerde kirin. (12)

Siyaseta ku xizmetên ji bo kesan teşwîq dike hem buha ye û hem jî newekhev e. Ew di çarçoveya mentiqekî, kirina bazara karûbarên navmalê de ne û li başkirina xizmetên kalîteya xizmetên dayî jî nafikirin. Bi pêkanîna muafîyetên pêşî yên bacê re li van çerx û mekanîzmayan hat eşkerekirin. Bêtirî bîst salan e ku **André Gorz** rexne li xisleta bi awayekî bingehîn newekhevîparêz ê vê "*dij-aborîya di radeya sêyemîn de*" ya ku li şûna ku xizmetên civakî bi pêş bixe, hewl dide karên mûçeyê wan ji nirxê wan kêmtir biafirîne. (13) Ew weha dinivîse: "*mesele êdî ne civakîkirina erk û wezîfeyên guhdan û navmalê ye, da ku di qada civakî de kêmtir dem lê biçe; beravajîyê vê, mesele ew e ku ev erk û wezîfe heta ku mumkin e zêde mirovan bide xebitandin û heta ku mumkin e zêde dema kar lê biçe, lê belê vê carê bi awayê xizmetên bazarê. Ango, bipêşxistina xizmetên ji bo kesan bi tenê di çarçoveyekê de ku tê de newekhevîya civakî her zêde dibe, mumkin e; di vê çarçoveya navbirî de beşeke şênîyan karûbarên mûçeyên wan baş di dest xwe de digire û li ser beşeke din a şênîyan rola xizmetkarîyê ferz dike*" (14)

* Aborîzan. François-Xavier Devetter bi Sandrine Rousseau re hevnivîskarê vê pirtûkê ye: *Du balai. Essai sur le ménage à domicile et le retour de la domesticité (Malîştin. Ceribandin li ser karûbarên malê û vegera ber bi xizmetkarîyê ve)*, Raisons d'Agir, Ivry-sur-Seine, 2011.

** Têbînîya wergêr: Bi *sihên navdar* îşaret bi dema di navbera 1945 û 1975ê de tê kirin ku li welatên pêşesazîya xwe temamkirî aborî pir mezin bû.

Paqijkirina malê, karekî rojane

"Tevgerên [min], bi demê re, jêhatîyeke bedenê pêk tînin; ev jî dihêle ku ez zû bi zû xwe adapte û organîze bikim. Hereketên rojane yên xwezayî, di cihên hem cuda û hem mîna hev de dubare dibin. Zûkahî jî, windanekirina gavan, organîzasyona tevgeran e da ku ez bi paş de venagerim. *(...)*

Feraset jî armanceke weha li ber xwe deyne ku tiştek nebe şkandin û rêz ji obje û xebitîna materyalê xelkê re bê girtin. Ev şûn ji xelkê re nas e, lewre jî nafikirin ku hin tiştan ji min re bibêjin. Divê haya min ji birînan jî hebe. Di dema hareketê de, ez bala xwe pir nadimê, lê belê ez fêrî xetereyên malê jî bûme (mirov li ser kursîyekê bê denge hilnakişe, ava germ dişewitîne, hwd.). Ev fêrbûn jî bi bedêla hewldan û destgiranîyan çêbû, tevahîya bedenê *ji bo tevgerê şidandî ye. (…)*

Ku mirov bikaribe bi rehetî û bi bêdengî malê paqij bike, digel xerceke kêm a tevger û zemanî, ne tenê hîleke bedenê ye.

Bêdengbûna min li hember tiştên ku ez li mala xelkê dibînim, bêdengbûna min ligel hestên dilxelîn û acizbûna min ji qirêjîyên bedena xelkê, bêdengbûna min li ber karê ku ez dikim; ev hemû *êşeke dualî* li min çêdikin, li alîyekî *êşeke ku ji derve, ji civakê tê ji ber ku rêzê ji karê min re nagire û li alîyekî êşeke din jî ku ji hindûrî tê. (…)*

Obje temsîlên kesên tuneyî ne: Karê paqijîyê jî tê maneya hîskirina bedena kesên din di malekê de, hebûn û tunebûna wan, awayê ku ew di mal û bedena xwe de dijîn. Ev ne asayî û ne jî rihet e, carina nerihetîyê hîs dikim. Lewre ku jî bo paqij bikim, divê ez raxînim, bilivînim, bipelînim; û weke ku min tiştek nedîtibe jî bikim. Ji bo psîkolojîya mirov zehmet e. Ji bo ku karê xwe baş bikim, divê ez beşeke rastîya karê xwe înkar jî bikim. Bi wextê re, ev rastî jî ji bo min rastîtîya xwe winda dike. Ji karê paqijîyê bêhtir, min nedihesiband ka çiqas enerjîya min ji ber vê jî diçe. Ev ne karekî anonîm e. Ev pêrgîhevbûna hestên şexsî yên du ferdan e. *(…)*

Min çiqasî dida, min xwe dikir şûna xelkê, min daxwazên wan pêş de didît, ez timî dibişirîm û heta min digot qey, rojekê, ew ê spasîya min bikin, ku ez ketim çerxeke westiyayî û tansîyonê. Dema ku min di nav malbatê de jî karê xwe diparast û li min weha dihat vegerandin: "Lê tu hez dikî ku xulamtîya xelkê bikî?", ez pir diêşîyam. *(…)*

Li piştî bişirînê, hewldan, dilxelîn û nerihetîya min vêşartî ne. Pirsa ku ez ji xwe dikim jî ev e ka, gelo, di nav van tiştan de, agresîvîteya kontrolkirî jî heye. Tişt hene ku ez helbet di hundirê xwe de digrim; ev jî hestên hêrsbûyinê ne, yên ku ji ber rexneyên F. xanim ên li ser tiştên piçûk ên jibîrkirî derdikevin, tiştên ku min bi serûber dikirin, lê wê wekî ku nedîtîtin. *(…)*

Bedena min di temenekî piçûk de ji ber dirûtin an jî seansên kinclixwekirinê kedî bû, aram bû, bedeneke di xizmeta tevgerê de ku, hêdî hêdî, dikare li berjêra teslîmîyetê jî biçe. Ku mirov di mala wan de xwe bike şûna xelkê û daxwazên wan pêş de bibîne, mirov weke kirdeyê bi daxwazên xwe tune dibe û nasnameya xwe tevlihev dike, bawer dike ku kesekî din e û weha fantazyaya bêhay a patron tîne cih. Ez li gotineke afrîkayî ya pir xweş difikirim, ku di hin stranan de derbas dibe: "Xebatê ez kirim kole".

Esman-Tuccella Sylvie, "Faire le travail domestique chez les autres" ["Karê paqijîya malên xelkê"], *Travailler*, hjm. 8, Parîs, sibat 2002.

Wergera ji fransî: Simko Destan

"Min di odeyeke berfireh [a dibistaneke paqijîyê ya Hannoverê] de, çar keçên ciwan ên 16 û 17 salî dîtin ku, pêşmal li bejnên wan û milên fanîleyên wan hilkişandî, xwe bi paqijkirina pencereyan an bi cîlakirina parkeyê mijûl dikirin; du ji wan keçên karkeran bûn, herçi du keçên din, yek keça generalekî bû, ya din jî keça şêwirmendekî dadgehê bû. Ez weha difikirim ku, li cem hevalên xwe yên karker û di civata karê paqijîyê de, wan kêmkirineke mesafeya civakî ya navbera wan hîs kir û dema ku ew ê jî bibin xanimên malê, ew ê baştir fêm bikin ka çiqas sebra dilovan û rêzgirtina ji rûmeta xelkê re ji bo otorîteya li hember xizmetkaran pêwîst e".

M. Dufourmantelle, *Le Conseiller de la famille et l'Ecole des mères [Şêwirmendê Malbatê û Dibistana Dayikan]*, 1909.

"Bi me, fêrkirina personela malê *(…)* bi tenê çareyeke tiralan e ku paşê ne misoger e; wekî din, ew berovajîyê tevgera civakî diçe ya ku dixwaze li hêlekê hêza xebatê kêm bike û alet û makîneyan bike şûna wê û li hêla din jî bike ku heta mimkin be, her mirovek bibe xwedîyê xwe".

Paulette Bernège, "Les professions ménagères" ["Pîşeyên Paqijîyê"], rapora li hember Kongreya Navneteweyî ya Berêxwedayîna Pîşeyî ya Jinan, Bordeaux, 1926.

Ji ber girtî di Geneviève Fraisse, *Service ou servitude [Xizmet an Xulamtî]*, berhema li jor navbihurî.

Wergera ji fransî: Simko Destan

1 Lewis Alfred Coser, "Servants : the obsolescence of an occupational role" ("Xizmetkar: kevnbûna rolekî pîşeyî), Social Forces, University of North Carolina Press, berg 52, hejmar 1, îlona 1973

2 Qanûna sala 1848ê ya li ser mafê hilbijartinê ya gerdûnî mafê hilbijartinê dida wan (sala 1793yê ev hatibû red kirin), lê belê mafê hatin hilbijartinê û endamtîya jurîyê nedida wan. Binêre li Jacqueline Martin-Huan, La longue marche des domestiques (meşa dirêj a xizmetkaran), weşanên Opera, Nantes, 1997, û Geneviève Fraisse, Service ou servitude (xizmet yan bendetî), weşanên Le Bord de l'Eau, Lormont, 2009

3 Nexasim li Almanyayê û li welatên Derya Spî (binihêre li Helma Lutz, Migration and Domestic Work (Koçberî û karûbarê navmalê), Ashgate, Farnham, 2008)

4 Journal des gens de maison (Bultena sendîkaya mirovên karûbarên navmalê dikin), Parîs, 8ê îlonê 1908ê

5 Qehremana rêza karîkatûran a ku xêzvan Joseph Pinchon û Jacqueline Rivière sala 1905ê çêkir, Jacqueline Rivière seredaktora La Semaine de Suzette bû, û îlham ji xizmetkara xwe ya bretonî girtibû

6 Maria Arondo, Moi la Bonne (ez a xizmetkar), Stock 2, Parîs, 1975

7 Anket Budceya malan 2005

8 François-Xavier Devetter û Sandrine Rousseau, Du Balai. Essai sur le ménage à domicile et le retour de la domesticité (Melkes. Ceribandin li ser paqijîyan navmalê û vegera ber bi xizmetkarîyê ve), Raisons d'agir, Ivry-sur-Seine, 2011. Ji bo liberhevgirtineke metropolên amerîkî, herweha binêre li, Ruth Milkman et al., "The Macro-sociology of Paid Domestic Labor" ("Makrososyolojîya keda bi mûçe ya xizmetkarîyê"), Work and Occupations, 25(4), çirîya paşî ya 1998ê, rûpel 483-510

9 Anderson Bridget (2000), Doing the Dirty Work? The Global Politics of Domestic Labour (Kirina Karên Qirêj? Siyasetên global ên keda xizmetkarîyê), London, ZED Books

10 Li gor anketa kar, ev kar û pîşe % 40ê fasî, cezayîrî û tunisî û % 50ê afrîkîyên li Fransayê kar dikin, dicivînin

11 Rapport du Conseil d'analyse Stratégique (Rapora Konseya Analîza Stratejîk), "Besoin de main-d'œuvre et politique migratoire" ("pêdivîya bi karkeran û siyaseta koçberîyê"), gulana 2006ê

12 François-Xavier Devetter, Florence Jany-Catrice û Thiery Ribault, Les Services à la Personne (xizmetên ji bo kesan), kolleksîyona Repères, weşanên La Découverte, Parîs, 2009

13 Bixwîne André Gorz, "Pourquoi la société salariale a besoin de nouveaux valets" ("ji bo çi ji civaka mûçeyî re xulamên nû divên"), Le Monde diplomatique, hezîrana 1990ê

14 André Gorz, Métamorphoses du travail). Quête du sens (Veguherîna kar. Gera li maneyê), Galilée, Parîs, 1988

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Ferman

- Di rojên xwe yên betlaneyê de, divê hûn herî dereng saet di 18.00ê de vegerin malê. Divê hûn tu caran şevekê li derve derbas nekin.

- Divê hûn pir bixebitin. Di saetên xebatê de, tu tiştî ji bo xwe nekin.

- Bi xebitînerê/a xwe re NEAXIVIN.

- Timî pêşî silavan li endamên malê bikin û "ji kerema xwe re", "spas" û "bibihurin" bibêjin.

- Meaş, rojên betlaneyê, giranîya xebatê, hwd., yên xwe û yên xizmetkarên din nedin ber hev, lewre ku hemû xebitîner eynî tiştan naxwazin û nadin.

- Bi xizmetkarên din re neaxivin.

- Dema ku xebitînerê/a we rexne li we bike, aciz nebin û madê xwe tirş nekin.

- Negirîn. Xebitîner ji vêya hez nakin û weke bextreşîyê dihesibînin.

- Li cem xebitînerê/a xwe, li ser kursîyeke rihet rûnenin.

- Nefspiçûk bin. Carina zehmet e ku em xeletîyên xwe nas bikin, ji ber ku em pirî wextan di wê bawerîyê de ne ku em rast in. Lê, eger xebitînerê/a we ji we gazincan dike, sedema wê heye. Vêya bipejirînin û li şûna ku li hincetan bigerin, hewl bidin ku baş bibin.

- Haydar û berpirs bibin. Karê xwe bikin, bêyî ku ji we bê xwestin. Tembel nebin.

- Tu cara nerevin balyozxaneya Fîlîpînê, ji xeynî di demê ku jîyana we di bin xetereyê de be.

- Bi mêran re neaxivin û numreya xwe ya telefonê nedin wan.

- Bi kesekî weha bawer nekin ku li hember bicihanîna daxwazên xwe soza zewacê dide we.

- Ducanî nebin. Serê şeş mehan carekê, hûn ê di testeke hemîletîyê re derbas bibin.

Ji pirtûka destan a Dibistana Abest (Manîla, Fîlîpîn) a ji bo xebatkarên malê yên siberojê.

Wergera ji fransî: Simko Destan

Hikûmeta fransî û beşek ji çepê, van "xizmetên ji bo şexsan" weke qadeke pir girîng a kardayînê dibînin. Li cîhanê, çend sed milyon xizmetkarên nava malê hene. Li Filîpînan, "îxrackirina" jinên xizmetkar bûye pîşesazîyeke neteweyî û ji bo vê yekê, perwerdeyeke mecbûrî û semînerên amadekirina ji bo jîyana li koçberîyê têne ferz kirin. Zêdetirî sed hezar kes ji van qerwaşan li Hongkongê dixebitin.

MANÎLLE, HONGKONG, PARÎS

Pîşe, xizmeta nava malê

JULIEN BRYGO *

Riyeke bi çerx, daristanên çinarên hêşîn û mêrên bi unîforma. Ji nişka ve, îmajên kartpostal ên korfeza Hongkongê xuya ne, ligel avahîyên bilind û fîloyeke keştîyan. Li pişt dîreksîyona otomobîla xwe ya servekirî, **Charlotte** bi hejandina serê xwe, îşaretekê dide karkerê ewlekarîyê; û derîyê gundekî ferdî yê bi navê keşifkarê brîtanî yê bi navûdeng **Tertre Stanley** vedibe.

Ji 2005ê û pê ve, ev hevwelatîya fransî-belçîkayî ya li derveyî welêt dijî, li gel mêrê xwe yê fransî, di vî xanîyê bi şaneşîn de ku ji navenda "aborîya herî vekirî ya dinyayê" sî deqîqe dûr e, rojên xweş û geş derbas dike. (1) Mêrê wê di bankeyeke fransî ya mezin de xwedî pozîsyona stratejîk a dîrektorê fînansî ye. Herçi Charlotte e, ew naxebite û kêf kêfa wê ye; di korfeza Stanleyê de melevanîyê dike, tenîsê dileyize û ji bo rêxistineke ne hikumî (RNH) ya fransî ya mezin xebata alîkarîya însanî dimeşîne. Ji bo xanîyê mezin û çar zarokên wan, Charlotte û Paul muhtacî *"dayîn"ekê* ne. Ne, hevpîşeya ewropî ya *"xizmetkarîyê"*. *"Lennie*, patrona wê bi heyranî dibêje, *çiqas dilsoz e"*. **Leonora Santos Tores** li zarokan miqate dibe, xwarinê çêdike û paqijîyê dike. Ew yek ji 290 600 xizmetkarên bîyanî ye, yên ku 2011ê li Hongkongê tên xebitandin. Li ba Charlotte û Paul, weke piranîya hevpîşeyên xwe, ew li odeyeke ji 5 metrekareyan piçûktir dijî û bi şev û roj ji bo rehetîya patronên xwe, xwe diwestîne.

Charlotte a ku *"çar sal in neçûye supermarketekê"* û ku vê rizgarîya ji karê malê weke *"rizgarîyeke rasteqîn"* dihesibîne, hîn bi matmayî dibêje ku xizmetkara wê *"piştî ku ji ber behrê vedigere, mayoya wê ya şil, bêyî ku destûrê jê bixwaze, ziwa dike"*. Ji bo vê servîsa 24 saetî ya 6 rojên hefteyê, cot (jin û mêr) 5 000 dolarên HK (450 euro) dide Leonora Tores, yanî bihayeke çar qat kêmtir a fiyeta eynî servîsê li Fransayê. *"Ev ji meaşê asgarî yê xizmetkaran li Hongkongê 100 euro bilindtir e, ji bo bi kêmanî rojê deh saetên xebatê"*, Charlotte derdibire. Ji ber ku ew û mêrê wê nahêlin ku xizmetkar xwarina xwe ji sarincoka (bûzdolabî) wan bixwe, ew serê mehê 55 euroyên zêde didin wê. *" Qanûna Hongkongê wisa ye"*, ew şirove dike. (2) Û dibêje ku *"450 euro, meaşekî baş e. Hin malbatên welatîyên derve serê mehê heta 600 an 700 euroyan didin. Ew bazara me xira dikin"*.

Ji bo vê dayika malê ya adetparêz, xebitandina xebatkareke ku saetên xwe hesab nake, dîsa jî dibe sedema hin nerindîyan. *"Wek mînak, mutbex bi rastî împeratorîya wê ya piçûk e"*. Ew weha vedibêje: *"Havîna bihurî, min li Fransayê makîneyeke muthîş a ji bo jinên bi ecele ji xwe re standibû: Thermomix. Ev robot ne ji rêzê ye û hertiştî dike: Ew dikelîne, hûr dike... Min ji xwe re gotibû ku ez ê bi xêra wê bi xweşikî vegerim mutbexa xwe. Lê binihêrin, min çileyê ev anî vir û min bi tenê çar caran bi kar anî, ji ber ku Lennie timî ji bo me nan dipêje!"*

Charlotte diçe odeya xwe û Tores ji mutbexa "xwe" derdikeve. Ev jina 47 salî westiyayî xuya dike, ji pênc zarokên xwe sisê li gundê Catalagana eyaleta turîstkêş a Luzonê, li bakurê Fîlîpînê, hiştine. Mezûna nivîsandina telegraman, ew ji 1999ê û vir ve li Hongkongê dixebite da ku debara malbata xwe bike. *"Her mehê, ez ji dehan heşt parên meaşê xwe, bi buhayê kêm yê veguhastina Western Union* [yanî 28 dolar HK bi serê veguhastinê -3 euro-, têbinîya redaksîyonê], *dişînim da ku pereyê zanîngeha zarokên xwe bidim. Min ew di dehsalîya wan de hiştin. Li Fîlîpînê, perwerdehî welê biha ye ku em mecbûr in ji bo perwerdeya wan xwe feda bikin"*.

"Fedakarî": Ev peyv timî li ser zimanê karkerên malê yên fîlîpînî ye. *"Pirî caran,* Tores vedibêje, *azadîya tevgerên me nîne li cem patronan. Xwarina me hindik e û em tevahîya jîyana xwe ji bo malbatê terxan dikin. Pir hevwelatîyên min di şert û mercên jîyanê yên rezîl de dimînin"*. Tadeyên gotinî an fîzîkî, bindestîya herdemî ya li hember hemû daxwazên patronan, meaşên kêm û heqxwarina rojane... Li gor wezareta kar a Hong Kongê, her salê, % 10 xebatkarên malê ji ber heqnedayîn, ihlalên peymana kar, muameleyên xirab an êrîşên cinsî gilîya patronên xwe dikin (yanî serê salê bîst û pênc hezar doz). Tecrubeyên Tores a bi vî rengî jî hene; ew pêşî şeş mehan di malbateke hongkongî de ma û revîya (*"Wan dixwest ku ez dev ji roja xwe ya betlaneyê berdim"*), paşê jî, wê şeş sal di malbateke Çînîyan de derbas kirin ku, ew dibêje, pîra malê *"lê dixist"* û *"dijûn didanê"*. Ji ber vê yekê, ew li gor teorîya relatîvîteyê tev digere û patronên xwe yên niha ji xwe re *"baş"* dihesibîne. Di qanûnê de, piştî dawîya peymanekê divê xebatkarên malê heta çardeh rojan ji Hongkongê derkevin, lewre piranîya wan newêrin gilî bikin.

"Di xwîna wan de ye". Charlotte *"dilsozîya"* xebatkara xwe weha şirove dike. *"Jinên fîlîpînî bixwe têkilîyên wan bi derdorên wan re baş in. Di çanda wan de wisa ye, ew bi temamî dilsoz in. Ew ji zarokan pir hez dikin! Ev yek weke tahtîla wan e, hûn dizanin, ji ber ku jîyana wan ne pir hêsan e. Lennie pir girêdayî ol û dêra xwe ye, loma dikare barê vê jîyanê hilgire..."*. Tores evanjelîst û endama tevgera "Born again" e. Ew *"hêza xwe ji têkilîya xwe ya bi Xwedê re distîne"*. Weke piranîya fîlîpînîyan, ew xristîyaneke dîndar e û qaîdeyên xwedêyî bi cih tîne, yên ku bi qaîdeyên patronan re jî li hev tên: *"Ez guhdarîya Xwedê dikim û ferqa zengîn û feqîran li ba Wî tuneye"*. Di odeya wê ya piçûk de, komputereke girêdayî Skype, Facebook û Yahoo!, lampeya şevê ya zarokên patronê û wêneyên zarokên xwe li ser hev dibin. Li serê komputerê, tabloyeke mezin jî weha dibêje: *"Timî spasdarên Xwedê bin û herdem cefayê bikişînin"*.

Gelo meyla xebata malê *"di xwînê de"* ye? Her salê, ji sed hezar fîlîpînîyan zêdetir bi ser riya sirgûnê dikevin da ku di beşa xizmetkarîyê de bixebitin. Di vî welatê aborîya wî têkçûyî de, siyaseta îxracatkirina hêza xebatê bi rê û resmî 1974ê, di bin hikumdarîya **Ferdinand Marcos** (1965-1986) de, hat dest pê kirin. Wî di mezinbûna welatên Kendavê ya piştî qeyrana petrolê ya yekem a 1973ê de, fersendeke şandina karkerên fîlîpînî *"bi awayekî demkî"* dîtibû. 1974ê, sî û pênc hezar ji wan li derveyî welêt dixebitîn. Sî û pênc sal bi şûn de, ev pêla yekem veguheriya tevgereke bi piranî jinanî û li gor hejmarên fermî, ji heşt mîlyon fîlîpîniyan zêdetir -yanî % 10ê nifûsê û % 22yê nifûsa di temenê xebatê de – bi vê helwêsta koçberîyê li derveyî welêt in. Li gor Bankeya Dinyayê, 2010ê, xebatkarên derve, bi xêra nêzîkî 21.3 mîlyar dolarên veguhastina fonan, % 12ê Hatinên Brut ên Hindûrîn (HBH) a Fîlîpînê misoger dikirin. (3) Ev yek, li pey Çîn, Hindistan û Meksîkayê, vê komgirava 95 mîlyon niştecihan di rêza çaran a veguhastinên pereyê ji sirgunê de bi cih dike.

Piranîya dîyasporaya mayînde an demkî (ku ji çaran yek ji xwe bê kaxiz e) li DYA an Kanadayê dimîne; 1.8 mîlyon kes li Rojhilata Navîn jî hene (1 mîlyon ji wan li Erebistana Suûdîyê ne, tevî ku vî welatî tîrmeha bihurî ambargoyek li ser xebatkarên malê yên fîlîpînî û endonezyayî îlan kir). Bi gotina Gloria Aroyo ya kevneserokkomara fîlîpînî (2001-2010), ew *"qehremanên hevdem"* in. Piştî êrişa Îsraîlê ya li ser Lubnanê ya 2006ê -sî hezar xebatkarên fîlîpînî wê demê di bin bombebaranê de dijîyan-, wê programa *"super-xulam"* da dest pê kirin. (4) Li gor îfadeyên wê, armanca programê *"şandina super-xebatkarên malê"* bû, ku xebatkarên malê bi "zimanê patronên xwe" perwerde dikir, dîplomayeke "bikaranîna makîneyên malê" û ya "dermankirina pêşî" amade dikir. Armanc jî ev bûn: *"Betalkirina fiyatên ajansê"*, misogerkirina *"meaşekî herî kêm ê 400 dolaran"* ji hemû xebatkarên malê re û kêmkirina alozîya tevnî (çi aborî û çi fîzîkî jî) ya ku ev jin li tevahîya cîhanê rastî wê tên. Pênc sal bi şûn de, ev dibistana hanê li hemû komgiravê belav bû, lê belê daxwazên heqên asgarî yên ji bo welatîyên fîlîpînî yên li derveyî welêt dijîn, bi piranî li ser kaxizê man.

Berendama hejmar pênc a bi her du destan rahiştiye tasika porselen a şorbê, di nava xwêdanê de maye

Manîla, gulana 2011ê. *"Hûn bi xêr hatin Hongkonga piçûk!"*, Michelle Ventenilla, yek ji çar profesorên dibistana Abest bang dike. Ev dibistan jî, ji 364 dibistanên ferdî yên pejirandî û bisporên *"xizmetên malê"* yên komgirava fîlîpînî yek e. Li pişt dîwarên acûrê yên vî xanîyê piçûk, texlîdeke maleke tîpîk a malbatên qada jorîn a Honkongê amade kiribûn: Otomobîla ku di hewşa malê de li bin tavê dibiriqe, akwaryuma masîyên taybet, banyoyên rengê rojavayî, odeya zarokan û ya dê û bavan, perdeyên tam pembe li pencereyên wan û dîwarên bi rengekî keskê vekirî boyaxkirî. Ji 2007ê ve, dibistana Abest hezar û pênc sed xebatkarên malê yên fîlîpînî ji bo Hongkongê, du seetên balafirê dûrî Manîla labîrentî, *"ixracat kirine"*. Dibistana ku fiyetê qeydê lê 9 000 peso (130 euro) ye, ser bi ajanseke xebitandinê ve ye.

Roja înî ya 13ê gulanê, azmûna dawîn e. Namzeta hejmar pênc, jineke ziravokî ye, pir xwêdanê dide. Ew şorbedankeke porselen tîne, nêzîkî maseyê dibe ku qumaşekî pembe yê lastîkî li ser hatîye danîn, û teqlîda dana taseke şorbeyê dike. Lea Talabis a 41 salî yek ji nêzî sed hezar namzedên her salekê yên ji bo hazirkirina dîplomaya xizmetên malê tên, National Certificate II (NC II) ya ku piştî 216 seetên perwerdeyê tê dayîn. Çavdêrê fermî yê Dezgeha Perwerdekarîya Profesyonel, *Technical Education and Skills Development Authority* (Tesda), Rommel Ventenilla (5), bi baldarî li namzedê dinihêre; ew niha derbasî îmtihana *"xizmeta li ber maseyê"* dibe. Gavek li kêlekê, nigên wê tîk ev mamosteya dibistana seretayî, ku ji mecbûrî qebûl kir ku bibe xebatkara malê, da ku debara malbata xwe bike, nêzîkî patronê xeyalî dibe û dipirse: *"Hûn şorbeyê dixwazin, beg efendî?"* Ventenilla serê xwe dihejîne û dengek ji devê wî dertê. Talabis dudil e. Piştî ku wê çoçikek şorbe berda tasa spî ya li milê çepê patron, gelo divê ew gavekê xwe bide kêlekê û şorbedankê bibe mutbexê, an jî wê deyne ber kesê ku dixwe? Xuya ye ku ev azmûn wê nerihat dike; ew li erdê dinihêre û zû bi zû hertiştî li ser dolabê datîne.

Çavdêr şansekî din dide wê: Ev azmûna pirsan e. *"Hûn çiqas avê dixin qedehê?"* Ew awirên vedigerîne ser raxistina maseyê, ku weke li cem malbatên burjuwa yên Hongkongê hatiye danîn: Sê qedeh, sê binik, kêrên goşt û masîyan, sîmetrî û mesafeyên minasib. Talabis diçe milê rastê patron, wek zarokekê surehîyê digire destên xwe û ji çaran sê beşê qedeha wî dadigire. Ventenilla, bê liv û tevger, dê dawîyê azmûna *"xizmeta li ber maseyê"* erê bike. Namzed vedigere mutbexê. Ew ê nota xwe ya dawî li gel îmtihanên raxistina nivînan, paqijkirina fayansê an akwaryumê, utîkirina cilan an şûştina erebeyê temam bike.

"Filîpîne: 1. Jina ji Filîpînan. 2. Kedkara nava malê"

"Nota dawîyê, % 20 qabilîyet , % 20 zanyariyên teorîk û % 60 helwesta çê ye", Ventenilla rave dike. Ev tê wê maneyê ku ji jêhatîbûna xizmetkarên siberojê ya tedawîyê, lojîstîkîya karê malê, an jî ji nanpêjîyê bêhtir, asta wan a îteatê û rêzgirtina ji emran re tê nirxandin. *"Em êdî nabêjin "xizmetkar"*, Susan de la Ramaya seroka bernameyê li Tesdayê serrast dike. *Em êdî dibêjin "alîkara malê". Em naxwazin ku Fîlîpîn weke "welatê ixracatkirina xizmetkaran" bê nîşan dan, weke hin salên berê çêbûbû... "* 2005ê, ferhenga brîtanî Meriam-Wesbter di weşana xwe ya cîhanî de weha nivîsandibû: *"Fîlîpînî: 1.) Jina ji Fîlîpînê; 2.) Xebatkara malê"*. Ev yek jî bûbû sedema hêrsa hikûmeta fîlîpînî û tevgera profesyonelbûna sektorê rakiribû.

"Piranîya patronan alîkarên malê yên kubar, bi sebr û bi taybetî bêdeng dixwazin. Li vir, em hewl didin ku wan ji bo sergermîya patronên hongkongî amade bikin. Divê mirov bi sebr be û berî hertiştî, ji dil bixebite", Michel Ventenillaya profesor dişêwire û weha kilîteke bernameya *"super xulaman"* jî dîyar dike. Li raser akwaryumekê, nîşana serfirazîya civakî ya malbatên asyayî, herfên li pey hev kirî yek ji dirûşmên sazîyê didin xuyakirin: *"Paqijî nêzîkî dilpaqijîyê ye"*. Di odeya dersê de, tabloyeke kesên *"serkevtî"* (yên ku *"li çareyan digerin"* û ji patronên xwe re dibêjin: *"Bihêlin ez ji we re bikim"*) û kesên *"neserkevtî"* (yên ku li *"sûcdarekî/ê"* digerin û timî *"hincêtan ji xwe re dibînin"* da ku rêzê ji emran re negirin) ji hev derdixîne. Herçi Qanûna Disîplînê ye, ew fermanên weha dide: *"LI DIJÎ PATRONÊN XWE DERNEKEVIN"*; *"Bi xizmetkarên din re neaxivin"*; *"Dema ku patron we serrast dike, rûyê xwe mad û miroz nekin"* ; *"Eger pirsgirêkên we çêbûn, bi ajansa xwe re bikevin têkilîyê û bawerîya xwe bi hevalên xwe neyînin"*.

Dîyar e ku tovên sosyalîzmê li vir nayên çandin. Ne sendîka û ne jî grev hene, her weha civînên bi armancên sosyal û derketina li hemberî bingehên xulamtîyê jî tunene: *"Timî di wextê de amade bin"* li beşê şeşan a pirtûka destan a dibistanê tê nivîsandin, û *"qaîdeyeke alîkarên malê yên baş"* jî li gor wê weha ye ku divê mirov *"tu cara saetên xebata xwe hesab neke"* (di beşa *"Tiştên ku nayên kirin"* de).

"Ev dibistanên perwerdeyê ji welatê me re şerm in", Gary Martinezê serokê rêzê yê Rêxistina ne hikûmetî (RNH) Migrante International, li Manîlayê, dinirxîne. *"Her roj, di navbera şeş û deh cesedên koçberên fîlîpînî yên di dema xebatê de mirî, tên vegerandin. Ev şermeke mezin e, welatekî weha ku xebatkarên xwe bi xwe dişîne derve, hem jî rojê 4 500 kes! Fîlîpîn bi rastî bûye şirketeke afirandina xizmetkaran"*.

Seet 14 e. Talabis aniha ji bo azmûna paqijkirina fayansê xwe amade dike -ew ê bi ser bikeve. Mamosteya dibistana seretayî ya Montenlopa, li Manîlayê, deh sal berî niha wê jixwe ji bo malbateke burjuwa ya Hongkong karê malê kiribû. *"Lê belê*, ew dibêje, *diviya ez vegeriyama asta xwe ya berê"*. Jê bêhtir, dîplomaya pêwîst, National Certificate II, jê re lazim bû da ku bi riya hiqûqî ji welatê xwe derkeve. Wê biryar da ku vegere bîyanistanê û li wir kar bike, û wê mêr û herdu zarokên xwe li du xwe hiştin. *"Ez ji bo wan diçim. Li Hongkongê, ez ê ji meaşê xwe yê mamostetiyê pareyekî du qet pirtir bistînim"*. Ew qebûl dike ku navenda perwerdeya wê berî hertiştî *"îteat û teslimîyeta li ber emrên patronan"* fêrî wan dike. Lê ew jê matmayî namîne: *"Ew ê bihêle ku em bigihîjin dawîya peymana xwe, ji ber ku em hemû deyndar dibin da ku bibin xizmetkarên malê"*.

Da ku 78 000 pesoyên ajansê bide -şeş mehên meaşê wê yên profesoriyê-, wê pereyê xwe yê hilanîbû, kişand. *"Min pereyê nakît dayê û meqbûzek jî nestand. Rast e ku îdareya berpirsa Fîlîpînîyên derve ajans pejirand, lê wan bi awayekî dîyar ji min re got: Yan qebûl bike, yan here. Ez neçar mam ku vî pareyî bidim ji bo ku herim Hongkongê"*. Ew ê pêşî here û mêrê wê yê şofêrê taksîyê, her weha zarokên wê, hêvî dikin ku piştre bên cem wê. Armanca wê jî Ewropa ye, weke % 10 hevwelatîyên wê yên li derveyî welêt dişuxilin. (6) *"Ez naxwazim hemû jîyana xwe xizmetkar bim"*, ew bi axînan dibêje. Sê hefte bi şûn de, ew hat cihê xwe û got ku ew *"pir dilşad"* e, ji ber ku patronên wê jê xwestin ku *"[wan] weke malbata xwe ya duyem bibîne"*. Lê tiştê ku bi rastî dilê wê aş dike jî ev e ku li mala patronên wê, toreke ***WîFî***yê heye. *"Her şev, ez bi xêra Webcamê dikarim bi zarok û mêrê xwe re biaxivim. Heta niha, ez pir baş im"*.

Li qata sêzdehê a Elegant Terace, avahîyeke dewlemend a bi nêrevan û hewzekê re, li nava Midlevels a taxa zengîn a navenda Hongkongê, derî vedibe û sîyek xuya dike. *"Elena Julien rojnamevanekî fransî ye. Ew nivîsarekê li ser jîyana rojane ya xizmetkarên fîlîpînî yên li Hongkongê dinivîsîne. De here çayeke bi şîr ji me re çêke"*. Xwedîyê malê, Joseph Lawê 65 salî, fanîleya xwe şanî dike:

RÊDÎ SEÎD TOPRAK: **Xanîjahr**, li ser tuwalê teknîka tevlîhev, 100 x 140 cm

"Bi xwe, ez dixwazim ku ew timî weha xweşik utîkirî bin û xetek li navê hebe, hûn dibînin?" -û ew xwe diavêje ser qanepeyeke çermîn. *"Gelo ez hez dikim ku xelk xizmeta min bikin? Hûn pirseke pir baş ji min dikin. Divê ez li xwe mikûr bêm ku min tim bêhtir xwestiye ku xelk xizmeta min bikin, li şûna ku ez bixwe tiştan bikim. Ev sî û pênc sal in ku ez xizmetkarên bîyanî dixebitînim û ji hemûyan ez ji fîlîpînîyan pirtir hez dikim. Ingîlîzîya wan baştir e, ew kêmtir bi rîsk in û bi piranî di karê xwe de bêhtir dilsoz in".* Apartmaneke paqij, cilên paqij, asta jîyanê ya paqij... Bihayê van hemû tiştan heye: Ev jî bihayê hêza xebatê ya Elenayê. *"Ez meaşê asgarî didimê, 3 580 dolarên HK* [327 euro] (7)*"*, Lawê kevneserokê alîkar ê itfaiyeya Hongkongê veguherîya ser berdevkê pir cidî yê Komeleya Xebitînerên Xizmetkarên Bîyanî ên li Hongkongê, dibêje. Bi gotineke din, komeleya patronan a beşa xebata malê - û ji ber vê yekê, dijminê her şeş sendîkayên xizmetkarên malê yên Hongkongê.

"Qerwaşên weke Elena ne kalîfiyekirî ne û pir ne jêhatî ne. Newisa, Elena?"

Elena A. Meredores a 51 salî tê. Ew dayika keçeke 18 salî ye, ku li Fîlîpînê maye û ew şanzdeh sal in xizmetkarîya malê dike. Pantoreke kin û tîşorteke şil ji ber fîraqşûştinê lê ne, ew tepsîyekê ji ber patronê xwe radike ku du tas û çaydankek li serê hatine danîn. Di ber re, Law rexne lê dike (*Careke din ku mêvanekî min hebe, tu yê tepsîyeke mezintir bînî"*) û Meredores bi nigekî li ser qanepeya çermîn ya patronê xwe rûdine. *"Meaş çima evqas nizm in?"*, Law dîsa dibêje. *Lewre ku fîlîpînîyên weke Elene ne jêhatî û ne kalîfiye ne, ne kalîfiye ne* ew israr dike. *Ne weha, Elena?"* Elena awirên xwe bera erdê dide û serê xwe dihejîne. *"Hûn rast dibêjin, ezbenî".*

Ji ber ku ew hîs dike ku (xizmetkara wî) amade ye tim ji gotinên wî razî be, patronê wê jê dixwaze ku *"azad"* biaxive. Xebatkar pir dikene, porê xwe yê dirêj rast dike û dibêje: *"Ne, ezbenî, hûn nikarin bibêjin ku em ne kalîfiye ne û ne jêhatî ne û meaşên nizm weha şîrove bikin. Pir ji hevwelatîyên min doktor, mamoste, mezûnên zanîngehê ne û neçar dimînin ku bibin xizmetkar da ku debara malbata xwe bikin. Jê bêhtir, hikûmetê dibistan ava kirin da ku wan perwerdeyî vî karî bike".* Law dibistanên *"xizmetên malê"* red dike (*"Ev mezintirîn henek û mezintirîn sedema pevçûnên navbera patron û xebatkaran e!"*) û dîsa dest pê dike: *"Elena, ez di vê bawerîyê de me ku % 50 xizmetkarên Hongkongê bi patronên xwe re di nav têkilîyeke aşt û bi aheng de ne, wekî min û we. Hûn çi difikirin?"* Elena li ser qenepeyê rast rûdine: *"Min ê % 10 heta 15ê wan ezbenî".*

Lê efendî aciz xuya dike:

- Ne, bi rastî, % 15... Ne. Divê tu adîl bî, Elena.
- Pir patron xwedêgiravî têkilîya wan baş e, lê di rastîyê de, derew e. Ew tenê weha dibêjin da ku 'eyb nebe ji wan re. Ne wekî we, Law efendî...
Patronê wê gotina wê dibire:
- Hongkong bihuşta xizmetkarên bîyanî ye. Bihuşt e!"

Lê miqayeseya hatinên mala wî (mehê ji 10 000 euroyan bêhtir) û meaşê xulamê wî hêrs dike. *"Hongkong cihekî xeyalî ye ji bo wan! Peyama wan a xebatê heye, meaşekî asgarî û jê bêhtir, pereyê lojman, xwarin, biletên balafirê, sîgortaya bijîşkî û piştî pênc salan, pereyê kevinbûnê jî tê dayîn. Ji bo patronan, paketa tevaya meaşê bi navincî mehê digihîje 5 500 dolarên HK* [li derdora 500 euroyan]. *Ev pereyekî pir e! "* Rast e, ew qebûl dike, *"piranîya patronan endamên sinifa jorîn in"*, wekî wî; lê, bi dîtina wî, dîyarîyên piçûk newekhevîyê radikin: *"Her sal, ez dîyarîyan didimê. Ji bo sersalê, ji bo sersala çînî... Ne wisa, Elena?"* Meredores jixwe zerfeke piçûk ji bo sersalê stand: *"Erê, 40 euro"*, ew bi bîr dixe.

Li ser siyaseta hikûmeta Fîlîpînê, ku 400 dolar (278 euro) meaşê asgarî li her derê dinyayê û dawîya 2010ê, sîgortayeke nû ya 200 dolarên HK (17 euro) ya pêwîst ji bo deh mîlyon xebatkarên xwe yên li derveyî welêt îlan kir, Law dengê xwe bilind dike: *"Ez dixwazim bi dijwarî vê hikûmetê û ya Endonezyayê jî hişyar bikim: Eger ew siyasetên weha bêaqilane bidomin û hertim bilindbûna meaşan bixwazin, ez ê ji bo rabûna ambargoya li ser xizmetkarên çînî bang bikim!"* (8) Law dikare meraq bike: Fîlîpîn û Endonezya, her du welatên xwedîyên siyasetên herî agresîv di warê ihracatkirina xizmetkaran de, di xezîrana bihurî da zanîn ku ew ê Hevpeymanîya Rêxistina Navneteweyî ya Kar (RNK) ya li ser karekî bi rûmet ji bo hemû xizmetkaran pesend bikin. *"Em patron, bi xurtî li dijî vê peymanê ne ji ber ku, di vî karî de, mirov nikare saetên xebatê bihesibîne".*

"Em li vê derê li hev kom dibin, lewre, ji bo roja me ya bêhnvedanê ti cihekî din ê em biçinê tune."

Sê roj bi şûn de, serê sibeha roja yekşemê, Meredores sîwana xwe ya sor vedike û dikeve ser riya Immaculee Conception (Dêra Çêbûna Paqij). *"Ez ê ji bo malbata xwe û ji bo malbata Law efendî jî dua bikim. Divê mirov di bawerîya xwe de, ne ezperest be".* Saet dibe dozdeh, wexta *"civîna mezin a xizmetkarên fîlîpînî".* Em ber bi Sentralê ve herin, taxa ku navendên bankeyên îş yên mezin lê ne, weke Hongkong & Shanghai Banking Corporation (HSBC), di navbera Bank of China û zêringer Van Cleef & Arpels cih girtî. Di bin vê stûna giran a pola û cam de, her yekşemê, xizmetkarên weke Meredores bi deh hezaran kom dibin. *"Em li vir tên cem hev, lewre ku, ji ber tenha roja me ya tahtîlê, cihekî din tuneye ku em herinê. Hemû hefteyê, em bi tenê ne, em toza wan, apartmanên wan paqij dikin û hefteyê carekê, em dikarin hinekî ji destê patronên xwe bifilitin. Ev rûmeta me ye"*, ew dibêje.

Li derve, baran kêm dibe û defîleya modayê dest pê dike. Temaya vê roja taybet, pirozkirina *"jinan weke keç, hevser û dayikan"* e: Ev roja dayikan e, ku Federasyona Fîlîpînîyên herêma Benguet (eyaleteke li bakurê Fîlîpînê) ên li Hongkongê li dar dixe. Pîrozbahîya rola jinan a weke *"keç, hevser û dayikan"* tam li gor ferqa zayendî ya ku dibe sedema xebitandina bi mîlyonan jinan weke xizmetkarên malê. Li ser podyuma sor a mezin, li binya Bank of Americayê, jinên di çil û pêncî salîyên xwe de li pey hev dimeşin, xemilî û serbilind; ew ji bo xelata "sekretera" herî bedew, "mankena" herî bedew reqabetê dikin... Hemû namzed xebatkarên derveyî welêt yên fîlîpînî ne, *Overseas Filipino Workers* (hemşîre, xizmetkar...); û vê roja yekşemê, ya herî bedew tê hilbijartin. Çend deh metreyan dûrî podyumê, xizmetkar bi hezaran alayên piçûk ên Western Union dihejînin. Fîrmaya ku piranîya 21 mîlyar dolarên di 2010ê de transferkirî, wê rojê stêrkên strana fîlîpînî pêşkêşî muşterîyên xwe dike, ji bo festîvala "Fiesta at Saya".

Li her alîyî stûna HSBCê, du şêrên bronzî herdu damezirînerên navdar ên fîrmayê, bankevanên A. G. Stephen û G. H. Stitt temsîl dikin. Li milê rastê, şêrekî devgirtî, "Stitt", bi mahd miroz û çav bi hêrs e. Şêrê li milê çepê, "Stephen" devvekirî ye, weke ku ji kêfê bang bike. Ev şêrê devliken bi derbasbûna salan re ji bo fîlîpînîyên li Hongkongê sirgûnbûyî, bûye cihekî civînê ya meşhûr. *"Ez hez dikim ku li ber vî şêrê ku dibişire fotografê min bikişînin, ji ber ku ew sembola keda me ye*, Gorgonaya Fîlîpînî dibêje. Bîst û du sal piştî hatina wê, ew bixwe heyirî dimîne ku ew *"hê jî xizmetkareke bi meaşekî kêm"* e. Şêrê metafora patron û serfirazîya wan, li ser stûna HSBCê bang dike. Li jêr, bi hezaran destên piçûk kêfa îzina xwe ya roja yekşemê dikin. *"Ji bo çînîyan, ew şêr nîşana pereyê wan e*, Gorgona dibêje. *Bêyî me, ew ê ev qas têr nebûya".*

*Rojnamevan

1 Rapora 2011ê li ser îndeksa azadîya aborî, ji nîvê duyem a 2009ê ve, li ser 183 welatan hatiye kirin û 179 ji wan li gor deh faktorên taybet yên azadîya aborî bi rêz dike (bazirganî, bazirganîya navneteweyî, bac, mezinîya sektora gelemperî, pere, pererazandin, fînans, heqên xwedîtîyê, bertîlxurîyê û azadîya xebatê) Hongkong 2011ê di rêza yekem de ye

2 Di rastîyê de, heqê xwarinê yê li ser patronên ku xwarinê nadin xizmetkarên xwe tê ferz kirin, digihîje 750 dolarên HK, yanî 67 euro

3 "Remittances to PH ranked 4th biggest in world", www.ofwngayon.com, Manîla, 11 mijdar 2010

4 "Housemaids to Supermaids Soon!", www.ofwguide.com, Manîla, 24 tebax 2006

5 Ew bi hevnavê xwe yê perwerdekar ve ne girêdayî ye

6 2006ê, % 43,4ê fîlîpînîyên li derveyî welêt li parzemîna amerîka dixebitîn (% 5,3 li Kanadayê û % 33,1 li DYAyê), % 32 li ser parzemîna asyayê (% 14,9 li Asyaya başûr-rojhilat û % 22,3 li Rojhilata Nêz), % 10,8 li Ewropayê. Çavkanî: Komîsyona Fîlîpînîyên li Derveyî Welêt

7 Meaşê asgarî yê pêwîst, di navbera 2009 û 2011ê de di 3 580 dolarên HK (327 euro) de hatibû qefilandin, hezîrana 2011ê, ew bi 3 740 dolarên HK (340 euro) ji nû ve hat hesibandin, lê hê jî li bin miqdara 1999ê (3 860 dolarên HK berî qeyrana fînansî ya 1999ê) ye

8 Ambargoya li ser xebatkarên çînî, di salên 1970yê de ji hêla dagîrkerên brîtanî ve hatibû îlan kirin

Wergera ji fransî: Simko Destan

Îzolekirina mûçegiran, nebûna rêûresmê sendîkayî, jêbirina têkilîyên hêzê yên ji rêûresmê: Li pêşîya seferberîya kesên di sektora Alîkarîya li Malê de pir in. Mînakên li Ardeşê, li Berî û Somê.

"Sendîkayîkirina xizmetkarên nava malê, karekî pir hesas"

PIERRE SOUCHON *

Dumas xanim, te cil û bergên xwe li xwe kirine? Ez ê odeya te bidim hev. Di vê navê de taştê bixwe." **Pauline Dumas** (1) xanim hêdîka berê xwe dide metbexa xwe, di vê sibeha adarê de. Ev xanim bi zehmetî dimeşe: Temenê wê ji 80 salan bihuriye û bi awayekî birêkûpêk pêdivîya wê bi alîkarîya piştgirêka jîyana civakî heye. Danhev û paqijîya malê, ger, xwarina dermanan –û xwendina rojnameya başûrê Ardeşê *Dauphiné Libéré*: Dumas rojnameyê baş nabîne. Ew çend sernûçeyan dineqîne û zêde dem nakeve navê **Galou** xanim bi hewara wê ve tê û jê re gotarên neqandî dixwîne. Va ye ev bûn neh sal ku ev kadroya kevin a sektora bazirganîyê ya li cem *Air Liquide*ê dixebitî, mûçegira *Komeleya Xizmeta Alîkarî û Refaqeta li Malê* ya li Başûrê Ardeşê (Saadam) ye. Weke nêzî sîh mûçegirên vê rêkxistinê, wê karîyera xwe ya pîşeyî guherand û pê mûçeyê xwe sê caran ji berê kêmtir kir. Seroka Saadamê **Ginette Landelle** vê rewşê weha rave dike: "*kuafor, sekreterên birêveberîyê, mekanîsyen, aşpêj: Hemû neçar bûn dev ji karê xwe yê eslî berdin. Ji bilî tûrîzm û sektora pîrûkalan li herêma me kar û îstîxdam nîne.*"

Galou xanim berê dema ku li *Air Liquide*ê dixebitî, endama *Konfederasyona Fransî ya Demokratîk a Kar bû (CFDT)*. Wê tecrûbeya xwe ya sendîkavanîyê anîye nav sektora alîkarîya li malê jî: Ew delegeya *Konfederasyona Giştî a Kar (CGT)* e û herweha delegeya xebatkaran e jî. Ev yek bi serê xwe erk û wezîfeyeke pir mezin e di sektorekê de ku milîtantî lê pir kêm e. Zehmetîya pêşî: Mîqdara mehaneya endametîyê ye. "*Dema ku ez ji hevkarên xwe re rave dikim ku ev bi tenê % 1ê mûçeyê wan e, ew weha li min vedigerînin 'te mûçeyê em dîstînin dît?' Piranîya wan nîv danî kar dikin û di dawîya mehê de di destê wan de tiştek namîne. Ew tercîh dikin heşt euroyan li xwedîkirina malbata xwe xerc bikin û nedin bi pûleke sendîkayê...*" Bi xêra dildarîya **Galou** û alîkarîya veşartî ya **Landelle**, ku bixwe kadroyeke kevin a CGTya sektora tenduristîyê bû, li Saadamê nêzî deh hebên *Destekvanên li Malê* endamên sendîkayê ne. *Louise Leyvastre* dibêje: "*ev karekî morîyan e ku em ji panzdeh salan ve dikin*". Êvarê bixwe ev karkera posteyê ya teqawîtbûyî, stûna karkerîya sendîkayî ya di sektora *Alîkarîya li Malê* de cîvîneke li lokala CGTya Obenasê li dar dixe.

Li dora çend pîzzayan, mûçegirên amade, behsa westana xwe dikin. Kêmbûna mûçeyan, nebûna zanyarîyan, neewlebûna kar, nîv-dan kar kirin, peymanên giştî yên kar ên tên bin pê kirin, serokatîyên dildar ên komeleyan ên ku haya wan ji mafê kar tune: Erê daxwaz pir in, lê belê hêz kêm e. Teknîsyena *Destwerdana Civakî û Malbatî (TISF)* **Christine Martin** dibêje "*mûçegireke Vallon-Pont-d'Arc haya me pê xist. Bi mehan dewam kir heta ku me xwe gihand keçikan, heta ku me civîna agahdarkirinê organîze kir... Encam, tu kes nehat: Em û mûçegir bi tena serê xwe li wê derê man.*" Zehmetî û astengî gelek in: Pir bi serê xwe û îzole ne, di sektorên fireh de pir ferdî kar tê kirin û bi tenê pir kêm caran tên cem hev. Wekî din **Leyvastre** bi poşmanî dibêje "*ev cîhaneke ku lê çandeke sendîkayî nîne, heta bi qirikê noqî nav fikrê karê alîkarîyê bûye. Em dibihîsin ku dibêjin divê mirov xwedî "bawerî", "dilrehmîya dayikî" be da ku karibe van karan bike –ev ê bi giştî bibe destnîşankirineke xwedayî. Ev yek jî têkilîyên hêzan bi tevahî jê dibe.*"

"Eger hempîşeyên jin daxwaza xebata heşt saetî bikin, ji bo pêşketina wan ti feydeya etîketa (konfederasyona gelemperî ya kar) CGTê tine."

Razîkirina mûçegiran ji bo ku bikevin grevê hema hema ne mumkin e; **Sylvie Francheteau** a ji TISFê weha bi bîr dixe: "*Ez dibihîzim ku weha li min tê vegerandin: 'wê çi were serê mirovên ez bi wan re elaqedar dibim?' Ev alîyê din ê vê bîrewerîya pîşeyî ya neasayî ye*". Destekvana jîyana civakî **Isabelle Giron** behsa "*tirseke ji zextan*" dike, heke ew bibin endamên sendîkayan: "*Piranîya xwişkên me yên hevkarên me nîv-danî kar dikin. Heke ew dixwazin tam-wextî kar bikin, berjewendîya wan nîne ku bi deq û nîşana CGTê dewam bikin* –nîşaneke ku piranîya mûçegiran jê dibizdin, lewre *bi komûnîzm û şoreşê ve tê têkildar kirin*". Leyvastre bixwe xweşbîn e: Alîkarên li malê ên endamê CGTê berîya demeke kurt li *Konseya Giştî* [meclîsa herêmê] hatin qebûl kirin û hejmara endamên sendîkayan ku sala 2008ê bîst û çar bû îsal bûye şêst.

Laurence Bonnetere li Beriyê alîkarîya li malê dike, ji sala 2004ê ve li komeleyeke ku tê de 180 mûçegir hene "*bi awayê nûnertîyê*" kar dike. Mirovên ku alîkarîya wan tê kirin, karbidestên wê ne. "*Ez dilê xwe dibijînim hevkarên xwe yên ji Ardeşê, hefteyê rojekê ew bêhna xwe vedidin, ew mehê dawîyeke hefteyê kar dikin û sûdê ji betlaneya bi meaş jî digirin...*" Ev ji bo mûçegirên komeleyên xizmetê, hema hema îmtiyaz in. Heqê benzînê ya ku pereyê Bonnetere lê diçin, lê nayê vegerandin, carinan neçar dimîne panzdeh rojan li ser hev bixebite, yan jî mirovekî ku bi nexweşîya Alzheimer ketiye kar bidiyê... "*halê hazir, mûçeyekî min a têra xwe gelek, li noterê hatiye bloke kirin: Kesa ku kar daye min emrê xwedê kir û li ser werasetê zarok li hev nakin.*" Ew ji dil û bi dil bi vî pîşeyî ve girêdayî ye ku "*maneyekê li jîyanê* [jîyana wê]" zêde dike, ew hewl dide hin daxwazên xwe derêxe pêş. CGTya ku ew endama wê ye, destekê dide vê dayikê û wê jî kolektîfek damezrandîye: "*behsa muameleya xirab a bi kalûpîran re tê kirin, ez bi xwe, ez ê behsa muameleya xirab a bi alîkarên li malê bikim.*"

Radyo û rojnameyên herêmî piştgirî dan însîyatîf û hewldana wê, ya ku bi çalakîyeke mezin a belavokên li ser erebeyên ferdî û di qutîyên posteyê de hatibû dest pê kirin. Di dema civîna agahdarîya giştî ya pêşî ya wê organîze kirî de, **Bonnetere** bi tena serê xwe bû, tevî ku li Îndrê bi hezaran mûçegirên sektora alîkarîya li malê hene. "*Ez hevkarên xwe qet nabînim, em bi awayekî ji hev belav dixebitin. Neewlebûna em tê de ne hevrikîyan dijwar dike. Dildarî û daxwaza min şikest xwariye... Û ev pir rewşeke xirab e, dema ku em belavokan belav dikin, em dikin ku muameleya 'qeşmeran' bi me re bikin.*" Westiya û ketiye ji ber ku "*karê wê zêde giran e*", ji ber ku bang lê dikin ji bo ku were "*çaryekekê, nîv saetekê*" kar bike, yan jî ji bo ku "*erda baxçê bikole*". Bonnetere "*hindik maye kevirê xwe deyne*". Ew bi awayekî bi rêkûpêk diçe buroya dewamî vekirî ya parlemanter û şaredarê ji Partîya Sosyalîst ê Arjenton-sur-Krozê: "*ew mirovekî qenc e, guh dide min, lê belê ne xema wî ye: Ez ji bilî xwe nûnerîya tu kesê din nakim.*"

Di dema hilbijartinên dawî yên pîşeyî yên alîkarên dayinîyê ên li Somê de Catherine Matos jî civîneke agahdarkirinê li dar xist. Ew endama sendîkaya CFDTyê ye, bi tenê du kes hatin civîna wê, ew jî "*bi şaşî hatibûn*": "*ji wan we bû, wan ê deng bidayana*"... Jihevxistina pîşesazîyê bi tevahîya hêz û hêrsa xwe, derb li vê herêmê xistiye, veguhertin û berê xwe guhertina ser sektora alîkarîya li malê bi komî ye. Lê belê alîkarên dayinîyê mûçeyên xwe –di navbera 2.18 û 5 euroyan de diguhere– (2) li ber yên karkerên fabrîkeyan digirin: "*ji bo wan ev ne pîşeyekî bi rastî ye. Ev karekî piçûk ê temamker e*". Di van şert û mercan de zehmet e mirovan li ser peymanên kar ên giştî, yan jî li ser mafan agahdar bikin: Mûçegir nafikirin ku ev mafên wan hene. Wekî din, Matosê bixwe peymana xwe ya kar a pêşî sala 2002yê mohr kir ku li derveyî tevahîya çarçoveya qanûnî ye: Heta nuha jî wê pê nizanîbû. Kevne karkera şirketa *Parisot-Sièges de France* weha dipeyive: "*Li fabrîkeyê hêsan e: Lokala sendîkayê heye. Li vir dema ku mirov bixwaze here cem kesekî, tu kes nîne ku em karibin berê xwe bidinê, herin cem.*" **Matos** gilî û gazinên xwe dike û dibêje, erê perwerdeya alîkarên dayinîyê li ser mijarên alîkarîya lezgîn û ewlekarîya zarokan pir têne pêşniyar kirin, lê belê li ser mafê kar tu tişt nîne.

"Bêewlekariya em giş di navê de ne, reqabetê sor û tûj dike"

Dumas xanim xwarina **Galou**yê jê re çêkiribû, xilas kir. "*Heke ez biçim neweşxaneyê, tu wê bêyî min bimînî Patricia!*" Dumas demeke dirêj li fabrîkeya tekstîlê karker bû ku piştî şer hate girtin. Ew paşê bû alîkara karên nav-malê: "*Min duwanzdeh salan ev kar kir, heta ku sala 1984ê teqawid bûm. Hingê em li tevahîya komunê sê kes bûn û me tam-wextî kar nedikir. Îroj sih kes in! Ji bo temamkirina mûçeyên xwe me salname û bilêtên lotoyê difirotin. Em xizan jîyan. Demên cihê, adetên guhertî...*" Gelo bi rastî wisa ye?

*Rojnamevan

1 Nav hatiye guhertin.
2 Heqdestê saetî yê bi pîvana bernameyeke tezmînatê hatiye diyarkirin, li gorî qadên jeografîk û hejmara zarokên li wan tê mêzekirin, diguhere.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

RÊDÎ SEÎD TOPRAK: **Xaniyên qutî**, li ser tuwalê teknîka tevlîhev, 120 x 140 cm

NEDÎTÎYÊN BÊDAWÎ

Xizmeta nav malê: Pirseke aloz a civakî

GENEVIÈVE FRAISSE *

Karûbarên wisa nexweş lê herwiha mecbûrî, yên ku piraniya wan, bi dilxwazî an jî bi karmendî li ser milên jinan tên meşandin: xizmeta ji bo şexsan di nava civakê de pirsên hesas bigewde dike.

RÊDÎ SEÎD TOPRAK: **Komwêneyên ba-jahrê IV**, li ser kaxizê teknîka tevlîhev, 27 x 43 cm

Xizmeta li malê, paqijî û karên malê yên ‘edetî an jî sexbêrîya li kesên muhtac di nav mal û malbatê de, mijareke îronîk e, îronîya pirseke civakî ya aloz (xizmet kirin?), pirseke acizker (wekhevîya cinsîyetan…) û bi alîyê xwe yê polîtîk pîjker. Rexneya wê bêfayde ye. Karên malê pareke esasî ye di çerxa jîyana rojane ya benî-ademan de û piranîya xelkê dinyayê renc û çewsandina jinan, çi xizmetkarên xwedanmûçe bin, çi bermalî bin, her nabînin. Lewma îronî hem di xumamîya kêşeyê de û hem jî di peydanebûna çareserîyê de ye. "Pirsa" xizmeta navmalê xwe bi bersivên sade nade û analîza wê mecbûr e nakokîyên tê de hene li ber çavan bigire. Îro li rojevê du duriyanên berbiçav hene, du rêyên ku tê de pirsa demokrasîyê tevli jiyana taybetî dibe: Li alîyekî bûyerek –serhildana xebatkareke hotêleke mezin– (1) û li alîyê din, munaqeşeyek, utopyaya xizmeta şexsî.

Daketina kolanan a jinên ku paqijîya odeyên hotelan dikin, îmajeke pir xurt e. Gulana 2011ê, xwepêşandana wan a li ser cadeyên New Yorkê li ber sîya danişîneke dadgehî ya doza Strauss-Kahn, wek manîpulasyonekê hate nirxandin, lewre ev jinên xebatkar, ku karê wan paqijkirin û serûberkirina odeyan e, bêguman wek jinên bê piştgirtî ku hebûna wan di jiyana hotelan de biqasî neyê dîtinê ye . [Bi vê kiryara xwe ya xwepêşandanê] wan sînorek bezand, berbendek rûxand: Sînorê dîwarên jîyana taybet û mehrem, yê dîwarên xanîyê şexsî û yên hotêlekê. Têperkirina xeta di navbera "taybet" û "giştî"yê de kiryareke radîkal e. Gotineke kolektîf an jî dirûşmek e dikeve para meydana giştî –li vir, "Shame on you", "şermê ji xwe bike", ji mirovê xwedanhêz ê gumanbarê tacîzê re digotin.

Meydana giştî, gotina giştî: Derîyên wê qadê ji xizmetkarên navmalê re girtî ne, ji jinên xizmetên paqijîyê re; lê belê, ev sedeyek e, ango ji dema peydabûna sendîkagerîyê ve, doz û gotina wan her ew e bê qebûl kirin ku ew jî "xebatkar in mîna yên din". Ji "sendîkaya xebatkarên karên navmalê" ya dawîya sedsala 19ê, heta digihe beşê "karkerên malê" di nav refên *Konfederasyona Fransî ya Kar* (Confédération française du travail (CFDT)) de, ber bi salên 1970yê, paşê heta *Manîfestoya Brezîlî* ya xebatkarên navmalê ku di hezîrana 2011ê de hatibû pêşkêş kirin bo *Rêxistina Navneteweyî ya Kar* (Organisation internationale du travail (OIT)), doz û dawekarîya siyasî û mirovî ya van mûçegiran ew e ku wek beşek ji çîna karker û xebatkaran bêne qebûl kirin. Divê neyê ji bîr kirin ku karkerên salên 1900ê, qewî hez ji vê telebê nedikirin, lewre bi ya wan ev teleb ji layê kesinan dihat ku pir nêzîkî patronan dijîn…

Derveyî dîwarên malê: Berê gava ku di nav xizmeta wan de rolên wek dergevanî û şoferî jî hebûn, li derveyî malê jî dihatine dîtin; lê dîtina wan li derve kêmtir bû gava ber bi dawîya sedsala 19ê "krîza xizmetkarîya navmalê" gur bû û bi şerê cîhanî yê yekê re du beramber zêdetir lêhat û ku êdî pêwîst bû vegerin ser (statuya wan a) "qerwaşên ku her karî dikin". Wê hingê hûrde fîlmê Lépine, yê bi navê *La grève des bonnes* (1905) pir seyr e, ku di vî fîlmî de komek xwe rêk dixe û ji malê ber bi bazarê ve diçin û xwe digihînin bazara kar û komîserîyê! Xeyala greva xizmetkaran a di fîlm de îro bû xwepêşandana rastî ya jinên paqijker: Derbirîneke polîtîk ku bi îmaja em diparêzin ya xizmetkaran ku bi tenê li deverên taybet wek ode, apartman, yan jî li xanîyên şexsî hene, qet li hev nake. Sebaret bi vê yekê divê em grevên vê dawîyê bi bîr bixin, yên wek greva jinên paqijker ên Arcadeê, taşerona Accorê (2002) (2) û greva Crowne Plazaya li Parîsê (2010). Ev derperîna siyasî –daketina ser kolanan, jîyana sendîkagerîyê, grev– nîşaneya nakokîyeke hevçerx e. Gelo çawa xizmet û demokrasî, hîyerarşîya navmalê û yeksanîya civakî bi hev re bêne dabîn kirin? Heyra rojnameger û bînerên wêneyên jinên paqijker li ber dadgeheke New Yorkê ji ber wê hindê ye ku derbirîna demokratîk a modern, bi nezera wan, girêdayî kevnarîya xizmetê bû, ango girêdayî nerîteke bi qasî dinyaya qedîm: Xizmetkar û qerwaş cûreke benî-ademan in ku qet xilas nabin. Ji bilî dîyalektîka Hegel ya xudan û êxsîr, ku şiklê pêwendî û têkoşîna mumkîn dîyar dike, herwiha ji bilî yarîya dramatûrgên sadsala Ronakbûnê ku ji Marivaux heta Beaumarchais hez ji bi-hev-guherîna rolên xizmetkar û xudanan dikirin, xizmetkar kategorîyeke civakî ya dureh e: Li nav û li derveyî mal û malbatê, nasyar û bîyanî, feqîr lê li cem dewlemendan dijî… Herwiha rola xizmetkaran digel jinan û zarokan bi cih bûye (binêrin Arîsto).

Ev bîst û pênc sedsal in ku "qerwaşa Trakyayê" ya fîlozofan hê jî bênav e

Herwiha tê zanîn ku di desthilata Şoreşa Fransî de xizmetkarên mêr bi hemwelatî nayên hisêb kirin. Çunku girêdayî yekî din e, xweserîya wî ya siyasî û takekesî aşkera ye ku kêşesaz e. Lewma cihê heyirînê nîne ku xizmetkara paqijîya navmalê berî her tiştî bê nasname be: Ji bîst û pênc sedsalan ve "xizmetkara Thraceê", ku fîlozof behs lê dikin, ne xwedîyê navekî xwe ye. Dibêjin gava Thalesê zana, ku zêde mijûlî stêrkan e, dikeve nav bîrekê, xizmetkara Thraceê her dikene. Wê nav nîne, lewma bi erkên cuda dikare were guhertin: Ew fonksîyoneke civakî ye, pêdivîyeke navmalî ye. Divê navê wê "Marie" be, "Marie ya qerwaş", dibêje Léon Frapié di romaneke serê sedsala bîstê de, ku navê wê *La Figurante* (1908) e. Lê, gelo çima mirovê xwedanhêz, siyasî û zana, wî bixwe nav, an jî nasname heye?

Di demekê de ku derperîna siyasî kevnarîya îmaja xizmetkara jin bi bîra me dixe, munaqeşeyek li ser pêdivîya "xizmeta li şexsan" vedibe, li ser sexbêrî, *care*, xem û li ser pêwendîya ku divê di navbera neslan de û di navbera takekesên yek-yek kirî yên civaka hevçerx de were ava kirin û jinûve ava kirin. Êdî mesele nema "xizmet kirin"a li kesekî xwedanê îmtîyazên zêdetirî xwe ye, belkî mesele "bicihanîna xizmetekê ye" ku ji kesekî din re pêwîst e. Xizmeta li şexsan, berê nihêrînê bi rengekî qet’î diguhere û ronîyê dixe ser wî kesê an wê kesa ku xizmet lê tê kirin. Rê-û-resma cemawerî, wî kesê di halê xizmetkirinê de wek "mûçegirê karderê şexsî" bi nav dike. Ev awayê derbirîna alternatîv cihê teqdîr kirinê ye.

Arezûya nehêlana têrma "xizmet" xwe dispêre rabirdûyeke kevin a têrmînolojîk. Berê "xebatkara malê" hatibû pêşnîyaz kirin, paşê "karê malbatî" ji bo xwe xelas kirina ji demxeya "qerwaş"ê an jî ji bo dûrketina ji gotina"jina paqijker" ku heta dereceyekê helgira xwe wek bêsineet nîşan dide. Mesele careke din ew bû ku kesê "di xizmetê de" li cîhana kar bê zêde kirin. Dimîne bi rengekî karîger bê dîyar kirin ku jina paqijkera odeyan li hotêleke mezin cuda ye ji jina paqijker a ku bes bi nîvdemî dixebite, ango wek karekî duyemîn vî karî dike. Herwiha hêj jî dimîne bê dîyar kirin ku sexbêrîya li mirovekî pîr û karê paqijkerîyê, ne wekhev in, herçend gelek caran ew herdu kar li hev tên têkel kirin.

Hiyerarşiya navbera efendî û xulaman derbasî nava pergalên siyasî bûye

Mirov dikare karên xizmetê ji yên herî rihet (mirovî) heta yên herî nexweş (qirêjî) rêz bike, herwiha mirov dikare hevgirtina pêdivî ya mirovan û zexta wazjênehên a civakî ji hev cuda bike. Tevî vê yekê em nikarin înkar bikin ku cinsiyetgerîyek (sexuation) di dîroka xizmetkariyê de heye.

Mirov dikare vê fikrê jî pêş bixe ku tu carî xizmet bi qasî vê serdema me jinane/mê nebûbû. Gelo hewce ye mirov dîsa û jinûve bibêje ku xizmeta navmalê rehên xwe ji karê jinan ê navmalê yê "belaş" digire? Hewce ye bête bi bîr xistin ku hinek jin mûçeyî ji bo karekî werdigirin ku kesine din heman karî bi belaşî dikin (paqijî an sexbêrî)? Gelo çawa em li pêş naheyirin ku ev para jîyana me ya hevçerx her wekî tabûyeke siyasî dimîne? "Tabûyeke siyasî" ye, lewre di serdema hevçerx de cudabendî û berhelistîya di navbera belaşî û mûçegirîyê de pir aşkeratir lêhatiye, serdema ku xweserîya aborî kiriye xaleke esasî ya takekesan.

Seyr e, jinanekirina her zêdetir a vî karî vedigere ser dîroka sedsala 20ê, li alîyekî ji ber berbelavbûna mûçegirîyê û li alîyê din ji ber hewla pîşeyîkirina karê jina navmalê. Gelo ma ne cihê heyirînê ye ku mûçegira "kardera şexsî" wek keseke nêtar, bêcinsiyet tê pêşkêş kirin di demekê de ku îro bi duristî % 98ê wan jin in?

Tevî her tiştî, ev perspektîfa taze dihêle ku mesele bi rengên cuda were nirxandin: Gelo ma gotûbêjên li ser sexbêrî û xema [kesên din], li ser *care* û fikara beramber kesên hesas û muhtac, nakin ku statu, rol û fonksîyona kesa ku xwe dixe "di xizmeta … de" bi rengekî esasî were veguhertin? Em dizanin ku hîyerarşîya civakî, ku bi pêwendîya di navbera xudan û xizmetkarî (an jî xudana jin û xizmetkara jin) de tê dasepandin, rejîmên siyasî derbas kirin, lewre reng û zahirê wê hîyerarşîyê di civaka monarşîk de aşkera bû; lê gelo kî dikare bêje ku her ew hîyerarşî kêmrengtir bûye di vê civaka demokratîk a xemxura yeksanîyê de? Xal û xemên teorîk û siyasî yên rojeva me li vir in: Dê çawa rêkxistineke civakî ya wisa bê berqirar kirin ku bi dirêjbûna maweya jîyanê re û bi pêdivîya her zêdetir a sexbêrîya zarokan re lihevkirî be, lê rê nede jinûve avakirina jêrdestîyeke kevnare, belku wê jêrdestîya kevnare [jêrdestîya jinê di xizmetên navmal û paqijkerîyê de] veguherîne faydeyeke cemawerî? An jî, berevajî vê –ku terefdarên *care*ê jidil dixwazin em wisa bifikirin–, çawa hêvîya demokratîk dê were vejandin bi rêya dîtina xizmetê, ne wek îtaet û xizmetkarî, belku wek bexş û pêwendî? Di vê rewşê de, nebûna sîmetrîyê, ango yeksanîya neyî di navbera xizmetker û xizmetgir de bêmena ye, û nabe kêşeyeke polîtîk. Herwiha, ji me re dibêjin, "xizmeta li şexsan" cextê lê dike ku lawaz ew e yê/ya ku xizmetê digire, ne ku yê/ya xizmetkar. Wê çaxê, faydeya cemawerî û hevgirtina di navbera takekesên veder de bi hev re asoya veguherîna civakê pêk tînin. Cihê behskirinê ye ku yê/ya xizmetê dike bixwe jî di rewşeke hesas de ye. Xizmeta li şexsan, bi vî rengî, têkilîyek e di navbera du terefên lawaz de.

Alîyên polîtîk ên meseleyê li ber çavan in: Jinûve avakirina pêwendîya civakî, jinûve terîfkirina menaya vê pêwendîyê, ji cihê karê kevnare, ango ji xizmetê bixwe dest pê dike. Di encamê de guherîneke tekmîl a rewşê: Xizmeta ku sedsala bûrî girîngîya xwe ji dest dabû, dê niha careke din bibe devera navendî ya civaka siberojê, ku vê carê bi xêra hilweşîn û veguhorîneke siyasî, ber û rengê wê ronî ye. Lewre her ji destpêkê dê dîyardeyekê ku ji pêdivîyeke taybetî dizê li navenda qada giştî bi cih bike. Di vê çarçoveyê de, tê heye ku "hidûd"ên di navbera herdu qadên giştî û taybetî de careke din bêne terîf kirin. Mijareke duyem lê zêde dibe: Xemxurîya beramber kesên din weke însanên hesas, muhtac û nesax û pîr û zarokên sawa, dê bihêle ku xislet û ‘emelên baş ên mirovatîyê yên meşhûr bêne navberê, ku ew xislet ji dîrokê ve jinane ne, navmalî û dayikane ne. Gava ku ev xislet li qada giştî berçav û berbelav bûn, ango hatine veder kirin, bi rengê ku li derveyî cîhana navmalî ew xisletên jinane hatine bi nirx kirin, hingê îhtimal heye ku her ew xislet ji cinsiyeta xwe rizgar bibin û nema bi tenê bi cinsiyeta jinê ve bêne girêdan.

Jeanne Deroina femînîsta radîkal a şoreşa 1848ê, her hingê behsa wê "xaneya mezin a xerab rêvebirî, ango dewletê" dikir ku ew bixwe jî li hêvîyê bû di siberojê de tê de bixebite. Wê pêşnîyaz dikir ku nirxê navmalê bi awayekî siyasî li derveyî male bê bi kar anîn: projeya wê wek stratejiyeke milîtanî ya qanihkirinê dihat nirxandin, ku ev nakokî îro jî di çendîn derdorên siyasî de karîger e; lê em baş bi îzafîbûna wê hetta heta bi tunebûna bingeheke wê ya dîrokî dizanin. Li alîyê din, wekhevîya jin û mêran di vî karî de bes di bîreke sehrî ya civakeke wisa de dikare bê tetbîq kirin ku tê de hîyerarşî di navbera cinsiyetan de nebe û ku tê de serdestiya mêrane tunebe.

Du qutib hene ku êdî qada têgeha xizmetê dest nîşan dikin: Kevnare û siberoj. Li alîyekî, dîroka kevin a xizmetkara ku dûrî qada giştî, dûrî mafê gilîkirina li dadgehê, dûrî derbirîna hêrsa xwe û dûrî kenê desthilatdaran tê ragirtin. Li alîyê din, dîroka nûjenkirî ya xisletên bêdawî yên cinsiyeta jinane, ku ji bo hertiştî berdest û berçav in, cinsiyet û paqijî, sexbêrî û xurekan, bi hevîya ku bêyî zêde tawîz û zehmetîyên yeksanîyê, jîyana taybet û jîyana giştî bi hev ve bêne girêdan. Bes tiştek misoger e: Xizmeta li şexsan nabe paşeroja wekhevîya jin û mêran di karê xizmetkarîyê de.

* Fîlozof, nivîsera *Service ou servitude. Essai sur les femmes toutes mains*, Le Bord de l’eau, Lormont, 2009 (çapa yekê: *Femmes toutes mains*, Seuil, Paris, 1979). Berhema wê ya dawî: *A côté du genre. Sexe et philosophie de l’égalité*, Le Bord de l’eau, 2010.

1 Bnr. Rachel Sherman, "Grands hôtels, maîtres et valets", (Hotelên mezin, efendî û xizmetkar) Le Monde diplomatique, hezîran 2011

2 Herwiha bnr. fîlmê Ivora Cusack, Remue-ménage dans la sous-traitance, 2008

Wergera ji fransî: Ergîn Opengîn

Masîgirîya tonan di bin zêrevanîya paramîlîteran de

EDOUARD SILL *

9ê nîsana 2010ê, li ser balafirgeheke Seychellesê, jumbo-jeteke leşkerî ya spanî birek mîtralyoz û tifengên êrîşan danîn ku ji embarên artêşê dihatin. Ji bo kê bûn? Ji bo xebatkarên şirketên spanî yên parastina taybet, ku van heyamên dawîyê girêbestên parastina gemîyên ku li peravên Somalîyê masîyên ton digirin bi dest xistibûn. Ev hinardeya/neqliyeya diduyê ye ji sala 2009ê ve: piştî ku hindek gemî ketine ber êrîşên nû, di sala 2010ê de bi mîtralyozên zêdeyî hatine bihêzkirin. Digel van hinardeyan **María Teresa Fernández de la Vega**, ku hingê cîgira serokwezîr bû, xweşhalîya xwe derdibirî ku masîgirîya spanî xwedana "çekên birêkûpêk" e ku keleşên deryayê [keleş: korsan] bitirsînin û paşkez bikin.

Çirîya pêşî ya 2009ê, zevtbûna gemîya tonan a bisarinc û mezin *Alakrana*yê û girtîmana sî û şeş endamên murettebata wê (ku şanzdeh ji wan spanî bûn) bo maweyê çil û heft rojan, li welatê nîvcezîreyê pêla şok û riberizan rakir. Herwiha, kir ku kêşeyên tongirên li wê herêmê kar dikirin bêne ber çavan û guftûgo li ser bê kirin. Herçend heta niha di van êrîşên li ser gemîyan de kes nehatibe kuştin jî **(1)**, mesref û nerihetîya ji vê tehdîdê diqewimin êdî gihiştiye asteke pir cidî. Bi ser de jî ji bo rizgarkirina gemîyan divê fîdye bê dan. Berevajî beyan û gotinên bêtir dilniyaker ên Rêxistina Navneteweyî bo Deryavanîyê (RND) û leşkerên ewropayî yên operasyona Atalantayê ku li herêmê diçerixin, xwedanên gemîyan ên spanî ji zêdeyîya êrîşan gilîdar in. *"Em hatine qewirandin ji herêma xwe ya masîgirîyê"* dibêje kaptanê gemîyeke tongir û pê de diçe: *"Êdî zêdetir ji nîvê vê herêmê di nav çepera devera çalakvanîya keleşan de ye"*. Û ev hemû rûdan *"bêyî tu siza û cezagirtinekê* diqewimin*"*. (2) Eylûla 2009ê, serokê Rêxistina Çêkerên Gewregemîyên Tongir ên Bisarinc (Opagac) acizîya xwe derdibirî ku di nav du hefteyan de du êrişên mezin qewimîbûn. Gelek caran di dema êrişan de masîgir bi gemîyeke biçûk a şikber dihesin û di cî de protokola asayîşê tetbîq dikin: Anku torên xwe û girtîyên xwe bi cî dihêlin (3) û bilez direvin. Rayedarên leşkerê spanî dîyar dikin ku carinan xwedanên gemîyan tehdîda keleşan bi qestî gelek mezin dikin da ku di guftûgoyên digel wezîran, giranîya xwe daynin.

Hindek ji masîgiran û xwedanên gemîyan qebûl dikin ku riayetê li şertên ewlehîyê yên adetî nakin. Bo nimûne, vê dawîyê kaptanekî spanî digot qey *"henek"* e ku divê du bi du derkevine masîgirîyê û birên tonan par bikin. *Artza*ya ku meha gulana 2010ê bû qurbanîya êrîşeke biserneketî, tevî çendîn îxtarên rêguhertinê, qederê 210 mîlên deryayî (389 kîlometre) ji peravên Somalîyê dûr bû, anku nêzîkî devera ekonomîk a taybet bi welatî ku qedexe ye bo îstifadekirina biyanîyan. Lê belê, patronên masîgirîyê ji bo teqezkirina parastina xwe hawara xwe dibine ber dewletê. *"Ez bacên xwe didim da ku dewleta min min biparêze"* dibêje **Moisés Pérezê** berpirsê şirketa ewropayî ya tonîdeyan (4) [navê giştî bo masîyên wek ton, marlin, espadonan]. Sendîkaya bihêz a Konfederasyona Spanî ya Masîgirîyê (Cepesca) û her du konsorsîyomên *Opagac* û Yekîtîya Neteweyî ya Armatorên gemîyên bisarinc ên tonan (Anabac) doz li hikûmeta spanî kirin ku leşkeran bide ser gemîyên tongir, çawa ku Fransa û Belçîka jî wisa dikin.

Çirîya pêşîn a 2009ê, Partîya Nasyonalîst a Baskî (PNV), bi piştgirîya Partîya Gel (PP), pêşniyazek da Meclisê bi armanca ku çeperê xizmeta parastina leşkerê spanî bê berfireh kirin û parastina gemîyên masîgirîyê jî bikevine ber, da ku bi vî rengî kar û damezirana di sektora masîyên ton de bê muhafize kirin. Partîya Sosyalîst û Karkeran a Spanî (PSOE), bi piştgirîya *Izquierda Unida*, astengên yasayî danî pêş li dijî cîbicîkirina pêşniyazê: Wek, çawa gemîyên tonan û xwedîyên wan li jêr qanûn û dadgeha spanî dibin bêyî ku li ser erdê Spanyayê bin. Herwiha, veguherandina gemîyeke tongir bo *"gemîyeke şerî"* û dana *"çar çekdarên deryayî bin fermana kaptanekî masîgir"*, dê biba *"dînatî"*. Li ser vê yekê, wezîra bergîrîyê **Carme Chaconê** diyar kiribû ku rêya asayîşa taybet dê erzantir be ji beşdarîkirina Spanyayê di Atalantayê de û ku Spanyayê li cîhanê bi qasî Fransayê zêde esker nîne.

Bi vî rengî, pêşniyaza PNVê hate paşkez kirin, lê belê guftûgo heta dawîya salê berdewam bûn, bi taybetî li ser guhorîna te'lîmatnameya der barê çekan de, da ku rê bidine şirketên deryayî bi operatorên taybet ên ewleyîyê re kar bikin. Li gor şertên nû awarteyek destûrê dide ku li ser *"wan gemîyên ticarî û masîgirîyê ku li jêr perçemê spanî li wan deveran kar dikin ku xetereke micid lê ye bo jîyana mirovan û silametîya mal û heyîyan"* (5) çekên şerî (heta kalîbreyeke 20 mîlîmetreyan) bêne ragirtin û bi kar anîn. Parlamentoyên xweser ên *bask* û *galîsyanî* pêdagirîyeke bêtir kirin û çaryeka mesrefan girtine ser xwe, û bi vî rengî pesend kirin ku *"divê ewleyî xizmeteke giştî be"*. Dewleta Spanyayê bi xwe jî eynî wisa kir, çaryeka mesrefan girt ser xwe, bi vî rengî, bi tenê nîvê fatûreya îstifadekirina ji ewleyîya taybet ji kîsî armatoran e.

Ev bazara ku heta dereceyeke mezin bi subvansîyona fonên giştî dihate bi rê ve birin zû bi zû bala şirketên spanî kêşa ser xwe, ku hindek ji wan şirketan di warê ewleyîya deryayî de bi temamî xeşim bûn. Parastina taybet a gemîyên masîgirîyê berê jî hebû. Çendîn armatorên *baskî* û *galîsyanî* her ji sala 2008ê ve bi şirketên ewleyîyê yên taybet ên îngilîzan re girêbestên xwe girêdabûn. *(Minimal Risk, Corporate Risk International û Secure West)*. Lê belê, ev girêbest bi tenê ji bo wan gemîyan lê ne ku di bin perçemê *Seychelles*ê de kar dikin, ku qanûnên wê dewleta navbuhirî îcazeyê didine xizmetên wisa.

RÊDÎ SEÎD TOPRAK: **Gundjahr**, li ser tuwalê teknîka tevlîhev, 150 x 200 cm

Şirketên spanî yên ewleyîyê, ku heta niha bes temaşevan bûn, karîn bal û dêna raya giştî ya li ser meseleya *Alakrana*yê bo berjewendîya xwe bi kar bînin. Gelek bi şarezayane sûdê ji têgeha "nehêminîya deryayî" werdigirin. Ji xwe yên ku pênaseya têgehê diyar kirî û yên ku bo berjewendîya xwe bi kar tînin, her ew in. Bi helkefta vê êrîşê, karsazên piçûk şirketên ewleyîyê di medyayê de wek bisporên mezin ên jeostratejîyê dihatine pêşkêş kirin û patronan, dîsa ji bo qehîmkirina pozîsyona xwe, pêşniyaz û pêşbînîyên gelek xerab derdibirîn, ku di heman demê de şan û navbanga xerab a leşkerên profesyonel li pêş çavên raya giştî xerabtir lê dihat. Ev şirketên ku heta niha dest û desthilata wan hatibû bi sînor kirin bi parastina mal û kesan (nemaze li welatê Baskê û li Amerîkaya Latîn), niha dil dikin reqabeta reqîbên xwe yên biyanî bikin. Ji bo vê yekê, dixwazin îstifadeyê ji "tercîha spanî" bikin, ku jixwe hikûmet piştgirîyê lê dike û ji bo hindek organên medyayê ew rê "garantî" ye, lewre ji bo wan, ev parastina taybet a spanî awayekî korserên [korser: Gemîya keleşan a ji bo hikûmetê kar dike; *fr.* corsaire] nûjen e.

Vicente de la Cruzê serokê şirketa ewleyîyê *Asociación Española de Escoltas* (ASES), pêşniyazê li armatorên spanî dike ku ji bo xizmeta parastinê bi şirketên bîyanî re kar nekin, û wek sebeb, nimûneyên lihevhatinên di navbera keleş, mafya û "eskerên mûçegir" de didane pêş. Karsazên spanî yên di qada ewleyîya deryayî de herwiha kampanyayeke berfireh a promosyona xwe xistine nav organên medyayê. Jixwe ew organên medyayê jî gelek meraqdarên amadekirina roportajan in li ser stajên emelî û rahênanên leşkerî yên van *akademî*yên taybet ku ev şirketên navbihurî ji bo hilbijartina personelê xwedan şîyana xweragirtina li ser gemîyên tongir bi rêk dixin.

Bo nimûne, *GM Formacióna li Alicanteyê*, derseke "parastina deryayî" vekiriye ku tê de, bo maweyê hefteyekê şagird dersên xweparastinê, nîşangirîyê (bi ser kemerbendên parastinê de) û seferkirina li bendera bajarî werdigirin. Ji beşdaran, ku her yek 600 euroyan dide ji bo vê hefteya perwerdeyê, bi tenê çendek dê bêne qebûl kirin bo ekîba parastinê. Heçî akademîya diduyê ye ku reqîbê wê **Eulen Seguridad** li Valenceyê vekiriye, di du rojan de du sed namzed darijiyane akademîyê da ku bibin yek ji wan sî kesên ku dê di çarçoveya girêbesta bi xwedanê gemîyeke tonan re bihatana wergirtin. Li cem ASESê, şagird dersên xwe di nav xelkî de dikin, li gundekî biçûk ê masîgiran li Katalonyayê, li *Ametla de Marê*. Axirîn roja rahênana wan, şirketê kanalên televîzyonî dawet kiribûn ji bo bernameyeke zindî. Şirketa Levantina de Seguridadê erdekî 24.000 hektarî li Ciudad Realê, kirî ku tê de hejmareke polîgonên nîşanê hene û şagirdên wê şirketê ji bo rahênanên xwe bi tenê roj û şevekê deryaya nêzî Alicanteyê dibînin...

Ekîbên ewleyîyê yên li ser gemîyan di navbera çar û heşt kesan de ne ji bo girêbestên serê gemîyê 24 000 û 55 000 euroyan di navbera çar û heşt kesan de ne û herwiha di bihayê girêbestê de xizmetên daxwazkirî jî diyarker in. Bi pêy hisaba şirketa ASESê, divê mehane 72 000 euro bêne terxan kirin ji bo ekîbeke parastinê ya li ser gemîyê, lewre 12 000 euro mûçeyê mehane yê her yek ji nobedaran e, herwiha mesrefên nerastexo hene wek amrazên ferdî yên şerî, veguhastina amraz û melzemeyan û mesrefên mana li hotêlê bo hefteyekê piştî karê mehekê li deryayê. Hindek şirketên spanî êdî fikra kirîna gemîyên "korser" ên taybet dikin, da ku bikarin reqabeta şirketa ewleyîyê ya îngilîz ***Sea Marshalê*** bikin, ku şirketa navbihurî li herêma ***Seychellesê*** xwedîya gemîyên şerî yên taybet e. Yên din, wek *Andalouse UC Global*, nema xisleta xwe ya şirketa leşkerî ya taybet vedişêrin, ku jixwe bi rengekî asayîtir navê "leşkerên mûçegir" hildigirin.

Meydana spanî bi vî rengî li ser werar û guhorîna kar û çalakîyên şirketên taybet ên ewleyîyê munaqeşeyê vedike. Êdî di destê van şirketan de bazarek heye ku li gor daxwaz û pêdivîyan durist bûye, lê belê tê heye ku di dawîyê de xwezaya çalakîyên wan xwe bi parastina gemîyên masîgiran ve bisînor neke. Êdî dikarin bi rengekî qanûnî çekên leşkerî hilgirin, ku ev yek dibe sebebê vebûna valahîyekê di kontrolkirina kiryar û çalakîyên eskerên mûçegir û paramîlîteran de. Herwiha, cihê endîşekirinê ye ku di tundûtîjîyê de jî zêdebûneke berbiçav bê dîtin: Herçend êrişên li ser gemîyan heta niha nebûne sebebê kuştina tu deryavanan, hejmara somalîyîyên bi guleyan hatî kuştin an jî xeniqî hê jî nayê zanîn. Lê belê, aşkera ye ku bilindkirina bihayê hêza zordestîyê û bêhed zêdetirkirina rê û îmkanên têkoşînê dawîya keleşîyê nayne.

Munaqeşeya li ser ewleyîyê herwiha pirsa hebûna gemîyên endûstrîyel ên hûtane bi yekcarî xef kiriye, lewre ew gemîyên ku li deryayên din qedexekirî ne, dikarin bi lez û bikêrîyeke pir berz karê masîgirîyê encam bidin. Lê belê, bi ya raporteke 2005ê ya rêxistina Neteweyên Yekgirtî bo Xurek û Çandinê (FAO), nêzîkî heft sed gemîyên biyanî bi rengekî neqanûnî li ser avên Somalîyê masîgirî dikirin. (6) Ev yek tê wateya masîgirîyeke qaçax ya berfireh ku salane 300 milyon dolaran bi yek ji feqîrtirîn welatên dinyayê dide zerer kirin. Herçend keleş tenê êrişî gemîyên masîgirîyê nekin jî, di halê heyî de gelek zehmet e ku dawî li wan were. Berevajî, ihtîmal e ku tevdîr û rêbazên xweser bidin ber xwe ji bo xweragirtina li hember rêbazên şerî ku li dijî wan têne bi kar anîn, û bêguman bi vî rengî ji bo şirketên ewleyîyê yên bi wezîfeya eskerên mûçegir radibin, bazareke paşerojê teqez dikin.

Çarçove: Masîgirên spanî li okyanûsa Hindê

Gemîyên tongir ên spanî ji sala 1984ê ve li okyanûsa Hindê çalak in, li deverekê di navbera Seychelles û peravên Somalîyê de ku salane % 21ê tonên serekî *(nemaze albacore, listao û putado)* yên dinyayê li wê deverê têne girtin. Spanya xwedana sî û sê gemîyên tongir û toravêj e li herêmê (hijdeh li jêr perçemê spanî û yên dî li ser navê Seychellesê qeydkirî ne). Masîgirîya spanî % 65ê tonên Ewropayê dabîn dike û dahata ji pêncan yekê 4 milyar euroyên masîgirîya civata Ewropayê dikeve destên wê. (7) Sala 2007ê, li nîvgiravê [Spanya] 35.075 kar li ser masîgirîyê bûn, ku ji wê hejmarê qederê du hezaran li ser gemîyan û danzdeh hezar di karxaneyên konserveyan de ne. Digel vê hindê jî, di rêjeyên berhemanîna gemîyên tongir ên spanî de daketineke aşkera tê ber çavan, her wekî yên fransî ku ew jî bi rexê xwe ve li herêmê xwedana giranîyekê ne (8), ku bi ya wan sebebê vê daketinê tehdîda keleşan e.

* Dîroknas.

1 Lê belê, sala 2008ê sê deryavanên taylandî ji ber şertên xerab ên girtinê li Somalîyê jîyana xwe ji dest dan

2 "Un thonier français attaqué par des pirates somaliens (Tongirekî fransî yê rastî êrişa korsanên somalî hatî)", Le Monde, 14 eylûl 2008

3 Senne: Toreke pan û dirêj ku ji bo zevtkirina komên masîyan, li ser beyavê tê avêtin

4 Agence EFE, 15 eylûl 2009

5 Biryar 1628/2009, ya 30ê çirîya pêşîn 2009ê

6 "Fishery Country Profile: Somalia (Profîla Masîgirîyê ya Welatan: Somalî)", FAO, www.fao.org, 2005

7 Hejmarên 2005 û 2007ê: "Facts and figures on the Common Fisheries Policy (Bûyer û Daneyên der barê Siyaseta Hevpar a Masîgirîyê)", Komîsyona Ewropayê bo Karûbarên Ewropî û Masîgirîyê, çapa 2010ê, û "La filière thonière européenne. Bilan économique, perspective et analyse des impacts de la libéralisation des échanges – Rapport final (Beşa Tongirîya Ewropî. Bîlançoya aborîş perspektîf û analîza bandora serbestkirina pevguherînan – Rapora dawî)", Oceanic developpement Poseidon Aquatic Resource Management Ltd et Megapesca Lda, 2005

8 Bnr: Edouard Sill, "Le thon, le pirate et le mercenaire (Ton, Korsan û Eskerên Mûçegir)", Mouvements, www.mouvements.info, 21ê çirîya pêşîn 2010

Wergera ji fransî: Ergîn Opengîn

Pêşpêşkirina ji bo temaşevan dîmenên herî zelal û berbiçav, dikare wisa xuya bike ku ev hindiktirîn tişt e ku mirov weke maf ji sînemavanekî hêvî bike. Hem bi kalîteya xwe hem jî bi hev-girêdanên xwe, divê dîmen paqij, zelal, bawerîdêr û ne şîlo bin. Lê belê gelo mirov dikare piştrast be ku ev helwest ya herî baş e ji bo radestkirina heqîqeta cîhana reel ?

Pesindana zelûlîyê

GÉRARD MORDILLAT *

Tiştê ku di sînemayê de dibêje sînema, yê ku ji ber dramayê, makîneyê filitîye; yê nehatiye pêşbînî kirin, nezelalî, nedîyarî ango zelûlî ye. Tiştê hunermendê sînemayî lê negerîyaye ku nîşan bide; yê ku çarçoveyê xalî dike, dibuhêre, wê di ser re diqulipîne ye. Ew xaka nehatiye bi kar anîn ya wêneyê ye, tiştê ku kamerayê bi şaşî girtiye. Yê ku ne di plana yekem, ne jî di ya duwem de ye, lê ji wan jî dûrtir e: Fon, ezman, fîgurê ji derveyî îrada mirov, xweza, valayî ye. Ev madeyê reş, ku nayê destê mirov, lê alîyê nalet ê fîlman, goştê wan ê kûr, stûrîya wan diparêze. Ev *"ew perdeya mijê ya sor* (1)*"* e, ku tiştên çav nikarin bibînin, bi dil nîşanî mirov dide. Tevî vê jî, zelûlî weke yek ji tabûyên herî bihêz ên sînemayê dimîne.

Di pratîkê de, ew tam mînaka şaşîya pîşeyî ya girîng e. Ew plana ku divê ji nû ve bê çêkirin e, ku li ser derhênerîyê biha dibe mal û aktoran jî aciz dike. Bi taybetî jî, plan e, ya ku şaşnebûna teknolojîyê, ya ku pîşe îdia dike, derew derdixe. Zelûlî tê wateya lawaz xuya kirinê. Zelûlî di sînemayê de weke ji dîn derketinê ye. Qebûlkirina wê, înkara her tiştî ye. Şik û gumanbirina ser her tiştî ye.

Tevî vê jî li hemberî wêneyekî nedîyar ê keça xwe, ez kelecanî bûm. Weke ku, bi serçavên wê ji hev dernexistinê, min tiştekî hîn samîmitir, hîn bisirtir didît. Belkî jî ev "tevger" digîhişt sansasyoneke saf a bîvelerzeke rasteqîn a jîyanê. Zelûlî derfetê dide me *"ku em bi hemî kûrahîya wê xwe bighînin rastîyê, wê vegerînin nav şideta wê",* wênesaz Francis Bacon, di hevpeyvînên xwe yên bi Hans Sylvester re de dibêje.

Portreyeke jirêzê ya Rimbaud heye, di 1883yê de, li Hebeşistanê, li Herarê hatiye çêkirin. Mirov xetên serûçavên mêrik bizorê ji hev derdixe. Gelo ew ne Rimbaud e? Ne mimkun e ku mirov pê bawer be. Tiştê ku bedewîya vî wêneyî ya nîgeranker pêk tîne jî ev e. Zelûlî pesnê şikê dide. Ew ji xeynî ji xwe pirsîna tiştê ku mirov dibîne çi ye, pê ve tiştekî din pêşnîyaz nake, îcar tu dixwazî bila Rimbaud be, yan kesekî din, an tiştekî din be. Jixwe pirsîna rastîyê, ya wêneyî, ya civata ku ew afirandiye, ya cîhana ku wî pêşan dide. Zelûlî pirs e, gîyanê fîlozofîyê bixwe ye, ji ber ku zelal berevajîya wê ye û hatiye pîroz kirin.

Zelûlî nesafîtîya di wêneyê de ye. Di heman demê de, kêmasî ye ku divê ji senaryoyê bi tedbîqkirina bêtawîz a qanûna sedem û encamê bê derxistin. **Georges Feydeau**, di dema xwe de bi vê qaîdeyê bixwe motora pêkenî ya pîyesên xwe çêkir. Li Hollywoodê, navê ku mirov bikene, divê planek her dem li ser bingeha têgihiştina ya piştî xwe vebe û ya berîya xwe jî ronî bike. Divê tu tişt zelûl nemîne, divê her tişt karibe bê fam kirin, divê ku senaryo "serkevtî" be.

Sînema –û sînemaya amerîkî ji hemîyên din bêtir– heman mesajê ku ji bingeha xwe ve siyasî ye, ber bi alîyê xelkê ku weke nezan û kavarî tê hesibandin ve radigihîne û dibêje: Metirsin, her tişt di bin kontrolê de ye, em dizanin. Di macerayên xwe yên herî bibahoz de, di daweyên herî erjeng ên cezayî de, di şerê herî xwînavî de, her tişt zelal e, tê kontrol kirin û şirove kirin. Tevî ku jîyan bixwe tenê ji nedîyarîyan, zelûlîyan, ji şikan, ji diltengîyan pêk tê, li ser ekranê ne sî, ne jî zelûlî heye. Bîner xercê şûna xwe dide ji bo ku piştrast derkeve. Sînema bi vî awayî weke dermanekî baş ê xemxwarîyê û herwiha jî navgîneke pir baş a kontrolkirina girseyan tevdigere.

Zelalîya teknîkî dixwaze bibe misogerkera zelalîya exlaqî ya berheman. Û ji vê jî bêtir sînema li qahwexaneyan, di warê dezgeyên fuaran de, di kerxaneyan de, ji destpêkê de li her cîyekî ku pêdivîya wê ya xwe pê bankirinê hebû ji diya xwe bû. Zelûlî gemar e, ango şêlû ye, nerewa ye, pîç e; xal, pak û paqij e. Weke ku siwîsrîyan jî di cîyê wê de gotine, tişt "bi nîzam paqij" e.

Zelûlî derfetê dide me "ku em bi hemî kûrahîya wê xwe bighînin rastîyê, wê di şideta xwe de tarîf bikin", wênesaz Francis Bacon, di hevpeyvînên xwe yên bi Hans Sylvester re de dibêje.

Wêneyê net dizane di civatê de cîyê xwe bigire. Ew piyên xwe li ser xalîçeyên xeyalî paqij nake. Di warê nûnerayetîyê de, ew her dem di navbera "tama xweş" a burjuwayî û etîketa serayeke qralîyetê de derdikeve holê. Wêneya net –carina bijîrîtî– bi tenê tiştan serveyî dibîne û bêyî ku li riya naskirina wan bigere bi wan dikeve. Ew wêneyekî bêhis e. Birastî, hisên wî jî alî zelalbûna wî ve tên veşartin. Di cotmaneya gotinê de: Kalîteya wêne û "paqijîya" serçavan, kostum, dekor, hemî bi ava kezabê ya mesafeya birêz – ku dê bi carekê re bîner bi rêzdarî bigre, tên şuştin. Ev hilbijartina xapînok, alîkarîya parastina nîzamê di cîyê wê de dikin: "Fokus" heqê xwe jê derdixe... Ji alîyekî din ve, gava ku sê aktor di planekê de hene û ku operator li ser yê ku divê wî derxe pêş dudil be, formuleke amerîkîyan heye ku ji bo hemî sahneyên dinyayê derbas dibe: "focus on money" –aktorê ku bêtir pere tîne derxe pêş...

Hunermendên sînemayî baş hîs dikin ku li dinyayê tiştekî "mukemel" tuneye û tu bûyer bi tevayî bi dozekê nayê rave kirin. Û fokus her çiqas bilêvkirina vê peyvê weke dengê "faux cul" (derewîn, şelaf) derbixe holê jî, ne eynî tişt e. (Ew rastîya ku dibîne, nîşanî mirovan dike). Televizyon jî qîmetê dide zelalîyê û wê derdixe pêş. Lê ew bitemamî di vî warî de heman rolê weke sînemayê nalîze. Li tevayîya dinyayê, bernameyên nûçeyan ên televizyonan bi ronahîyeke tam, bi kûrahîyeke pir mezin a meydanê û zelalîyeke mikemel tên kişandin.

Ev tercîhên teknîkî bi nisbet gevezetîya pêşkêşker, derfetê didin xitabeke pir bihêztir. Mesaja alet vekirî ye: Tiştê ku li vir li ber ronahîya mezin tê pêşkêş kirin peyva rastîyê ye. Di hemî rejîmên dinyayê de, bernameya nûçeyên televîzyonan dengê desthilatê radigihîne, rastîya desthilatê dibêje.

Lê televîzyon, dîsa jî, bi tevayî nikare dîmenên zelûlîyê piştguh bike. Bi taybetî jî wêneyê "zelûlkirî", ku li ser navê mahremîyetê, adetên baş, parastina piçûkan an kesên ku polîs li wan digere bi awayekî qismî ji alî bîner ve neyê dîtin. Zelûlkirin, pêşî bi mebesta veşartina tazîtîyê derket holê, niha jî bi kêrî nîşandana tiştê ku divê neyê nîşan dan, lê ku disa jî, ji bo agahdarîyê, azadîya fikrî, gotûbêjên demokratîk û hwd. divê hebe. Lê ev yek jî bi rêzgirtina parastina jêderî/ê, hesasîyeta bîneran û hwd pek tê. Durûtîyeke ku nayê heş û aqilan! Ew bi piranî kesên herî mahrûm, marjînal, vederkirî ne ku rûyê wan tê zelûl kirin, televizyon berî bi dîskalîfîyekirina axavtina wan ji ber xîtaba wan "zelûl" e, dest pê dike. Çima em zelûlîyê naxin ser mirovên siyasî, ku her mudaxeleyeke wan hêja ye têkeve bin şik û gumanan?

Her weke di sînemayê de di televizyonê de jî, wêne û dîmen dîwarekî ji rewrewkê pêk tînin, ku li paş wî ezabê jîndaran û şideta dîrokê tê veşartin. Ew rastîyê dikurisînin, înkar dikin û di encamê de ji holê radikin. Di dinyayeke xeyalî de ku êdî lê hertişt mubah e, fîlm masûm dimînin. Tiştê ku wêneyî di zelalbûnê de kar kiriye, weke serçavê ji alî cerahîya estetîk ve ji nû ve çêkirî ku ji xeynî *"kunên sîyê yên di şiklêkî mirovî çêkirî"* (2) pê ve ne tiştekî din in, ew wî di kûrahî û tahrîkê de wenda dike.

Dîmenên ku îro di sînemayê de serdest in yên bermayên hunera klasîk ên sedsala XIXê ne ku Ernst Gombrich di vî warî de wiha dibêje: *"Dîmen hêsanbûna xwendinekê didin ku mirov aciz dike û mirovan dixe şûna ehmeqan. Em vê yekê weke heqareteke ne di cîh de dibînin ku mirov li bendê ne ku em bi şaşîyeke ewinde weset bên xapandin, belkî tiştekî wiha birastî dikare bala qebetîyê bikşîne ser xwe, lê qet nikare ya hevalên bijartî yên sirên hunermendî ku em dixwazin bibin, bixapînin. Belê ez di wê bawerîyê de me ku ev his psîkolojîyeke xerab a hîn kurtir serpûş dike.* Ger me nikarîbûya nerazîbûna xwe li hember van teknîkên xapandinê ku di warê pisporiya me de tên bikaranîn, nîşan bidin, me yê xwe ewqasî xirab hîs nekira*".* (3)

Hunermendên sînemayî wê gavê dikarin berxwedaneke çawa li hemberî vê zelalkirina hîyenî, di warê vê peymana giştî ya çavî de nîşan bidin?

Dê helbet ehmeqî be ku mirov bifikire dê tenê di nav destên xwe de pelixandina fîlmê, birîna wê, gemarîkirina wê têrê bike, ku berevajîya wê ev dê wî bi awayekî neditî bihêztir bike ku xwe bigihîne rastîyê. Ew yek berîya her tiştî, weke empresîyonîstan dikir, tiştên hov û yên nedîyar çêdikirin ku mirov ji xwe pirsê bike bê çi ne. Ji bo ku mirov xwe ji alîyê dînî, exlaqî yê "net"bûnê (portreya zelûl ya Îsa tuneye) û îdeolojîya ku wê hildigire, biqetîne. Ji bo ku mirov têbigihe bê bi kîjan riyê sînema dikare xwe ji tiştên derewîn û sexte yên ku wê difetisînin pak bike.
Sextebûna netbûna xalê.
Sextekarîya mantiqê ku dibêje: Sedemeke her encamê heye, ev qanûna mecbûrî ji xapandineke komîk pê ve ne tiştekî din e, derew e.
Jîyan ne net e.
Jîyan ne zincîreke bi hev ve girêdayî ye.
Çima divê ku sînema wiha be?
Jestê rastî yê hunermendî ne jestê mukemel e, lê jestê bitenê ye. Ev tiştekî ji binî ve cuda ye. Jestekî bi xeter e. Xebateke bê fîl e, bê misogerîya bankeyan pîşeyî ye. Xwe çengkirina nav valahîyê ye. *"Antonin Artaud dibêje, ez dikevim, lê ez natirsim. Ez tirsa xwe di qîrîna harbûnê de, di barînekê (qerîna fîlan) cidî de dihêlim".* (4) Xwe avêtina nav zelûlîyê, nav tarîtîyê, tirsa di dilê mirov de, wêrekî ye. Ev firarkirina ji nav sefên karbidestên piçûk ên salonên tarî ye. Li hemberî xwerexnekirineke sînemayî, rexnekirina kesê din, li welatê nîşanderên sîyan ên mezin divê.
Wêneyekî bitemamî hesas.
Bitevayî bi jan û êş.
Mirov pê diêşe.

* Nivîskar û hunermendê sînemayê. Berhema wî ya dawîn: *Sor di nav qehweyî de*, Calmann-Lévy, Parîs, 2011.

1 Roger Gilbert-Lecomte, *Testament (Wesiyet)*, Gallimard, Paris, 1955

2 *Berhema nav borî (Bnb)*

3 Ernst Gombrich, *L'Ecologie des images (Ekolojîya wêneyan)*, Flammarion, Paris, 1983

4 Antonin Artaud, *Le Théâtre et son double / Le Théâtre de Séraphin (Têyatro û cêwîya xwe / Teatra Séraphin)*, Folio Essais, Gallimard, Paris, 1985

Wergera ji fransî: Yaqûb Karademîr

Demokrasîya Taloqkirî?

ANDRÉ BELLON

Meraqa rîskên ku li ser demokrasîyê giran dibin wekî derketina dijûnê xuya dikir. Kesên ku demokrasî dixistin ber lêpirsînê, weke ku dîn bûne dihatin dîtin, bi taybetî kesên ku der heqê avakirina Ewropayê pirs dikirin. Îro berevajîya vê mitalekirina tiştê ku em bi şermokî dikarin weke "kêmasîyeke demokratîk" binirxînin, bûye tiştekî normal. Ev gotina zeftkirî, vê pirsgirêkê kêmtir girîng dide xuya kirin: "Tu tişt ne bêqisûr e, helbet, lê bi xebatê divê em bigihîjin başkirinekê"…

Tiştekî baş e ku êdî mirov dest bi rabûna li hember serwerîya "lîlotan" kirîye. Ji bo hin nivîskaran ku her diçe zêde dibin, daxwazkirina reformên biçûk êdî ne mijara axaftinê ye: Divê tiştê ku êdî ne tenê daherizînek e bi awayekî eşkere bê şermezar kirin, ev bêhtir ji alîyê çînên rêveber ên çepgir û rastgir dev jê berdana „heta redkirina" demokrasîyê weke sîstemeke siyasî ye. Bi vî awayî, **Salome Zourabichvili** bi tecrûbeya xwe ya dîplomasîyê rastîya demokrasîyê rave dike ku li Dewletên Yekbûyî û li Ewrûpa û herweha li dewletên kevn ên Sovyetê tê dîtin.

Di nav dewletên kevn ên Sovyetê de, rejîmên parodîk ku ji mafya û dewlemendên ku dibirîqin pêk tên, piranî bi piştgirtîya wezaretên ewropî û amerîkî ve hatin bi cîh kirin. (1) Demokrasîya ku welatên rojavayî ji Kosova heta Libyayê bi ser navê wê şer didin destpêkirin, pirî caran tenê tiyatroyeke sîberî ye.

Rewş pir xirab e û pirsgirêkên giştî nîşana pêvajoyeke dîrokî ne.

Bi vî awayî dîrokzan **Antonio Gibeli** pêşandana karîkatûrî û bikêrhatî ku **M. Silvio Berlusconi** tarîf dike li alîyekî dihêle û nîşan dide ka serokê Meclîsa Italîyanî civakeke ku aşiqê modelên olîgarşîk e, çawa afirand. Ev yek jî bi rêya manîpulasîyonekê li ser pêdivîya bi guherînê re ya italyanan pêk anî. (2) Bi vî rengî girêhişkek xwe bi cih dike: Reşe/batirsokê ku Berlusconi temsîl dike nîqaşên siyasî di çarçoveyeke teng de hildigire (ji bo an li dijî Berlusconî). Ev yek jî dibe sedema çêkirina koalîsîyonên demkî ku her îhtimala ji nû ve avakirina demokrasîyê asteng dikin.

Tehlukeyeke bi vî rengî li Fransayê jî heye. Li wir gazineke birêz **Nicolas Sarkozy** ku bi kêr tê, tiralîya entelektuelên muxalif û taktîkên wan yên bêdawî, rave dike.

Dema ku hilbijartinên bi raya gerdûnî marjînal dibe û serwerîya civakî tê bin pê kirin.

– wekî ku piştî hilbijartinên 29ê gulana 2005ê ya li ser projeya Avakirina Ewropayî ya li Fransayê derket holê, mirov çawa dikare ji vî halê ku wekî bêçare dixuyê derkeve. **Alain Delcamp, Anne Marie Le Pourhiet, Bertrand Mathieu** û **Dominique Rousseau** (3) li seradê dixin, di nav beşên biçûk ên sentetîk re, pirsgirêkên li pêşîya demorasîyê ku nikarin bi dengavêtina hundirê sindoqa hilbijartinê bi kurtî werin rave kirin: Rêzgirtina ji bo mafên bingehîn, bilindbûna payeya dadgerî, dengdana elektronîk, Înternet, hwd. Gewdeya civakî çawa xwe ji nû ve derdixe holê û encama wê kîjan cureya civaka polîtîk e? Rexne giran e, tevî ku hin nivîskar der barê reforma makeqanûnî ya kozmetîk de a ku sala 2008ê ji alîyê hikûmetê ve hatiye qebûl kirin, kêmtir wekî ronakbîr bên xuyakirin jî.

Herçî **Georges Ferebœuf** ew "demokrasîya beşdar" dixe ber lêpirsînê, ango dide nîşan ku ev demokrasî tim û tim karker, mûçegir, jinûmêrên xwedî zarok ên kar dikin, yan jî ciwanan dide alîyekî. (4) Pêşnîyazan formule dike ji bo xilasbûna ji tiştê ku ew weke "***apartheida*** [cudakarîya civakî]" diwesifîne.

Lê ev belkî ji parzemîna Ewropayê wêdetir e ku divê mirov biçe li îlhama demokratîk bigere. Serûbinîhevbûnên li Tunusê ji alîyê **Olivier Piotî** (5) ve li gor metodên roportajê bi awayekî tirûşdar tên pêşkêş kirin: Nîqaşên wî yên bi şahidan re, hevdîtina wî ya bi malbata **Mohamed Bouazizîyê** ciwan re, rê, hêrsdarîyên wî yên bi polîs re ku li karta hafize ya wênegira wî digerin: Ew qas bûyerên ku bi serê mirovan de hatine. Ji anekdotan û wê de, em bi civakeke bicoşî tê digihîjin ku li afirandina demokrasîya xwe digere û di dawîya vê payîzê de, dê mecliseke damezirîner hilbijêre. Usûla ji nû ve avakirina qaydeyên lîstikê yên ku di dawîyê de wê rêzê ji îradeya gel re bigirin.

Ev refleksîyonên ku em his dikin ew hê li destpêka xwe ne, gelo ew ê bibin xwedî rol ku rasteke bêrûmet û çepeke di nav pratîkên sazîyî de bist bûye ku wesiyeta François Mitterand in, biguherin? Em wisa difikirîn ku demokrasî her tim qezenc dike. Dîsa jî, di hilpekînên cîhana me de, divê bê şik demorasî ji nû ve bê îcat kirin, bêyî ku xiyanet pê re were kirin.

1 Salomé Zourabichvili, *L'exigence démocratique. Pour un nouvel idéal politique*, [Pêwîstîya Demokratîk. Ji bo îdealeke nû], Bourin, Paris, 2011, 134 rûpel, 19 euro

2 Antonio Gibeli, *Berlusconi ou la démocratie autoritaire* [Berlusconi an jî demorasîya otorîter], Berlin, Paris, 2011, 160 rûpel, 15 euro

3 Alain Delcamp, Anne-Marie Le Pourhiet, Bertrand Mathieu û Dominique Rousseau, *Nouvelles questions sur la démocratie* [Li ser demokrasîyê pirsên nû], Dalloz, kolleksîyona "mijaran", Paris, 2011, 162 rûpel, 35 euro

4 Geores Fereboeuf, *Participation citoyenne et ville* [Bêşdarbûna bajarî û bajar], L'Harmattan, Paris, 2011, 152 rûpel, 13,30 euro

5 Olivier Piot, *La Révolution tunisienne. Dix jours qui ébranlèrent le monde arabe* [Şoreşa Tûnisî. 10 rojên ku cîhana ereb hejandin], Les Petits Matins, 2011, 150 rûpel, 14 euro

Wergera ji fransî: Sevda Orak

Ji mobîlyayên li hev tên siwar kirin, heta bi gîşeyên otomatîk

Serfkarê dixebite

Laurent Cordonnier *

Biserxwevehatin ne tu bêhnvedan e. Me ji berê ve dizanî, dema ku karker -bi taybetî karkera jin- ne "li ser kar" e, hê jî dixebite, ji ber ku dema karê malê ji dema xebata bi meaş pirtir e. (1) Wekî din, ev karker jî mesrefê dike, lê em zêde bala xwe nadin mesrefkarîya wî, tevî ku ew pirî caran bi awayekî belaş ji bo şirket an îdareyan jî dixebite da ku, ji xwe, kar bi dawî bike. Ew kovarên serfkaran dixwîne, li ser Înternetê li berheman digere, projeyên xwe li dar dixe, biletên xwe yên trenê siparîş dike; ew diçe supermarketê, ereboka xwe tijî dike, li kaseyê dikeve dorê; parçeyên mobîlyeyê li hev siwar dike, dekodera televîzyonê dixebitîne, girêdana Înternetê jî aktîf dike; ew li rehbernameya girêdana kanîya banyoyê dinihêre; xwe fêrî şixulandina nivîsbarîyên kompûterê dike, awayên xebitandina makîneyan dixwîne... û çend roj piştre jî, vedigere cihê xizmeta piştî firotinê, heta carina berê xwe dide dezgeha nakokîyan jî.

Hûn ê bibêjin ku serfkar bi vîna xwe dixebite. Tevlîbûna hilberandina berhemên serfkarîyê carina wek seetên zêde yên kar ên xweş tê hesibandin; serfkar ji bo van seetên zêde yekser pereyan nastîne, lê ew li alîyê din meaşên xwe jî diparêze *(ji ber ku bi xêra wan, ew dikare malên ne tevakirî bi erzanî bikire)*. Ji bo mirovên dilawêr ku *"xwe bi xwe kirinê"* diecibînin, feydeyeke din a vê xebata bê pere jî ev e ku rîska bêkarîyê qet tuneye. Digel rewşa **Robînson** li ser giravê, ev mînakeke taybet e ku îrade tenê têra îş peydakirinê dike. Heta hin kes jî dibêjin ku ev xebata belaş pareke xweserîyê ya ji me re veqetandî ye, fersenda ku em nebin serfkarên pasîf e. Îmaja avakerê jêhatî, amatorê dildar, tamîrkerê serkeftî, ya "serfkara/ê çalak", li ber çavên me ye.

Dibe ku serkara/ê karker nikaribe lê mikur were -ji ber ku *"xweşbînîya"* li ser van kêlîyan herweha parçeyeke xebata wî/wê ye-, lê belê di nav vê para xweserîyê de jî, cih ji bijarteya wî re nayê hiştin. Weke cîranê xwe, ew solên xwe dibe ser koşkar, ew li restorana bi lez sênîya xwe radike, di ber bazarên xwe yên li ser Înternetê re, ew rûpelên agahîyên ferdî dadigire, ew ji muxatabê servîsa telefonî ya ji bo alîkarîya mişteriyan re rave dike ka ew ji bo tamîrkirina girêdana xwe ya înternetê şîretên bi çi rengî dixwaze, ew li postexaneyê nameyên xwe diwezinîne û pereyê wan dide *(dema ku tê ji bo nameyên bi taahhutê bi xwe re bibe)*, ew roja şemîyê serê sibehê li mexzena malzemeyên avakirinê ye da ku çerxeke dolabê ya êdî nayê çêkirin, bibîne. Belkî carina tahma *"azadîyê"* bike jî –hingê bi tenê peyvê dikin devê wî-, dema ku li ser cihê xwe rehet, pîceme lê ne û li ser Înternetê bileta trenê ya ji bo sefera xebatê ya siberojê dikire, di hundirê xwe de, ew baş dizane ku ew wexta xwe ya kêfê ji bo hilkişîna çemekî Bakûrê Mezin ê Kanadayê û masîgirîya bi mêşan derbas nake. Hin caran jî, dibe ku ew nebûna tercihê îfade bike: Dora gîşeyên garê ewqasî dirêj e... Jixwe, bi pêşkêşkirina alternatîvên ne xweş li ber serfkar jî, ew ê di dawîyê de minasib bibîne ku xizmeta xwe bike. Hebûna dorê li postaxaneyê, li garê, li sîgortaya civakî, li supermarketê, beşeke hûnera hesabkirî ya rêvebirina nûlîberal e, ku helwesta xwejêvedanê ya serfkar weke meşeke qehremanî ber bi azadîya hilbijartinê ve îlan dike.

Serfkarê karkerbûyî, fêrî berhemdarîyê jî dibe. Eyb e ji wî kesî re ku ji ber destgiranîyê, jê nayê bibe hosteyê kaseya otomatîk. Ew ê nerihetîya bêdeng a muşterîyên li pişt xwe hîs bike. Pêwîstîya berhemdarîyê heta di çûyîna wî ya tahtîlan de jî xwe dide der, dema ku ew bi dîqet guhdarîya gotinên hostesa ***Busy Jet*** dike, ku pêvajoya xweqeydkirinê fêrî wî dike ya ku dê rojekê wê ji karê wê bike. Dîsa jî, piştî demeke dirêj, şadî û serfirazîya gihîştina yekrengîyê tê: Ew êdî ji kaseyên otomatîk natirse; berî ku benzînê têxe erebeyê, ew ji bîr nake ku lepikan têxe destê xwe; ew bi jîrî makînayên otomatîk ên fîrmaya trenê bi kar tîne *(ew fermanan jî dide wan û bersivên wan pêş de dibîne)*; êdî ew dizane lîsansa programa antîvîrûs kompûtera xwe nû bike. Qabiliyetên serfkar zêde dibin. Lê belê, li hemberî vê bîlançoya erênî, divê neyê gotin ku qabiliyetên bi vî rengî -yên rasteqîn û pêwîst in jî, ji ber ku bêyî wan, mirov dikare di warê aborî û civakî de, li paş bimîne- mîna kilîtekê ne ku hemî derîyên girtîgehekê vedikin û digrin... bêyî ku tu caran rohnîya rojê bibînin.

Di dawîyê de, serfkar -weke karker, her ku diçe- bi çi mijûl dibe? Ew hewl dide ku bi kevçîyekî, okyanûsa xirbeyên xebata civakeke ku divê em weke *"civaka xirabebûnê"* bi nav bikin, vala bike. Her tiştê ku dixebite, bêyî pirsgirêkan diçe serî, her tiştê bi ser û ber *(normal, asayî, dubare)*, her tiştê ku ***"baş derbas dibe"***, ku ***"rind diçe"***, bi kurtasî, hemû tiştên ku dikarin bi rihetî bi ser kevin, me ev tişt spartin otomatan *(teknolojîk an prosedurî)*. Lê belê, di cihaneke weha de ku zemîna kiryarên mirovan bi giranî li operasyonên teknîkî yên xiraker bi sînor bû, veqetandina beşa herî serkeftî ya van operasyonan ji bo makîneyan, mîna mirineke pêşwext e.

Gelo civaka xizmetan bi xwe nebûye beroşa pir caran karhêner (2), lê her demî xembar, a vê aborîya xirabebûnê, ku fersendên hevdîtin û hevpeyivînê li dora tekçûnê girêdide: Li gîşeyên xizmeta piştî firotinê, li dezgeha gazincan, li qata nakokîyan, li servîsa lezgîn a nexweşxaneyê, li qereqolê, li dezgeha pêşwazîyê ya fîrmaya trenê..., li hemî derên ku çareyên ji bo vegerandina li ser riya protokola otomatîkî ya rewşeke ne ji rêzê, mînakeke zehmet, tênegihaştineyek, tiştekî ku ji bo bîstekê ji dest filitîbû? Karkerên ku tevahîya dawîya hefteyê xebitîn, roja duşemê van qurbanên protokolê dibînin: Yên ku feydeya dermanên doktor ji wan re nehat *(nexweşên saxbûyî kêm caran vedigerin ba doktor)*, yên ku ji ber *"pirsgirêkên trênê"*, ji trêna xwe ya veguhestinê man, xwendekarê ku qeyda xwe ya zanîngehê dereng dide, rêwîyê ku valîzên xwe li balafirgehê winda kirin an jî bileta xwe ya elektronîk a balafirê li mala yara xwe ji bîr kir, yê ne xwenda ku di tarîfeyên peyama peydayîya serfkarîyê *"baş tê negihîşt"*, kirêdarê sê mehan e kirê nade...

Xirabe, sernekeftin, tekçûn, pêşnedîtin, bêbextî hemû mohra xwe li fersendên *"vegerandina mirovan li meseleyê"* dixin û ev fersend dibin cihê tahlî, nakokî, protesto û hêrsê. Piştî van hemû nerihetîyan, weke şarja xezebê ya me di xeta telefonê ya operatorê Înternetê de rijand, em rihet dibin dema ku baraneke hîjyenîk a kubarîyan bi ser me de tê, her tiştî rizgar dike: *"Spas ji bo dilsozîya we, Robinson beg; fîrma **Îşêxwezane** - xebatkarên wê û servîsa wê ya mişterîyan– dawîyeke xweş a rojê ji we re dixwaze!"*

Belkî meyla bixweberkirina nerindîyên pergalê wê bibe armanca me ya nû. Em hêdî hêdî xewna tiştên ku *"bi rastî"* baş dixebitin, dibînin. Ji ber ku em gav bi gav bi serfirazîya narsîsîk a xwenaskirina di vê gerdûna çimayîyên sert, dihesin û em êdî her diçe kêmtir heyranîya bi derewan nîşanî teknolojîyên nû didin. Mîna André Gorz digot, *"bîra ku êdî dikare weke makîneyan bixebite, xwe di makîneya ku weke wî dixebite de nas dike -lê ew nabîne ku di rastîyê de, makîne ne mîna bîra mirovan, lê mîna bîra ku hîn bûye weke makîneyan bixebite, dixebite"*. (3)

*Aborînas. Nivîskarê L'économie des Tombapiks. Une fable qui n'a rien d'une fiction [Aborîya Tombapîkan. Fableke ku ne fîksîyon e], Raisons d'agir, Parîs, 2010.

1 Xweberhemdêrîya xizmetên malê li nav çarek û sê çarekên Hilberîna Hundir a Nesafî tê texmîn kirin; ew di muhasebeya neteweyî de nayê hesibandin, yek ji sedeman jî ev e ku herî pir jin pê mijûl dibin

2 *Bnr.* Tahar Ben Jelloun, "34 centimes d'euro la minute" *["serê deqîqeyê 34 santîmên euroyê"], Le Monde*, 10-11 cotmeh 2010

3 André Gorz, *Métamorphoses du travail. Quête du sens [Guherînên xebatê. Lêgerîna maneyê]*, Galilée, Parîs, 1988

Wergera ji fransî: Simko Destan



Rêdî Seîd Toprak: **Xaniyên pang**, li ser kaxizê qelemrejî, 40 x 80cm

Rêdî Seîd Toprak: **Xwezeya mişemir I**, li ser kaxizê qelemrejî, 40 x 80 cm

Zilamê fikreke bitenê

Christophe Baconin

Ger mezinîya berhemekê li gor şana wê ya medyatîk bihata pîvan, bê şik ya **Rene Girard** dê hêjayî derbasbûna nifşên siberojê bûya. **René Pommier** tenê dixuye ku wisa difikire *"dikare bi awayekî pir rewa pesnê xwe bide ku wî hemû reko-rên pozbilindîyê şkandine û bêguman ji bo demeke dirêj."* (1) Bi awayekî aşkere, bi xwedîbûna *"keşfkirina hîpo-teza herî berhemdar a sedsalê"* ew wekî ***"Darwînê Çandê"*** tê pîroz kirin. (2) Bi kurtasî, wisa dixuye ku *"piştî mirov baş li ser bihizire, berhema wî ya teorîk qada fikrê tim serûbinî hev kir"* hatiye qebûl kirin, wekî ku **Jean-Claude Guillebaud** li van rojan di *Nouvel Observateur* (5 Tebax 2010) de wisa nîşan dide.

Berhema **René Girard**î vê avantajê pêşkêşî mirovî dike ku li ser fikreke bi tenê kûr dibe, di cîh de dikare ji alîyê herkesî ve bê fêm kirin û bi ser de jî destûrê dide ku fenomenên civakî bi giştî bidin xuya kirin: *"Tenê daxwaza ya/yê din daxwazê derdixe holê."* (3) Bi gotinên din, bi tenê daxwazeke teqlîdkar heye, ango daxwaz ji alîyê daxwaza ku yekî/yeka din aşkere dike, tê şîyar kirin: Bivê nevê devê xwe li ser reqabetê ku çavkanîya şidetê ye vedike. *"Tevahîya teorîya çanda mirovatîyê"* (4), usa xuya ye ku daxwaza teqlîdkar çavkanîya qedexe û toreyan e, bi taybetî ji alîyê *"mekanîzmaya qurbana taybet"* bi temamî ji bo astengkirina şidetê ku derdixe holê tê amade kirin . Mirov bi awayekî xwezayî barkêşê xerabîyê ye , xirîstîyanîzma ku bi derxistina rastîya daxwaza teqlîdkar şideta wekî qurbankirinê bi dawî kir, nexwe ji sitemkaran tevahîya rewabûnê distîne û qurbanan mafdar dike û bi vê jî ji binî ve hilweşînerê nîzamê ye: Di ewlebûna dînê xirîstîyanî de, nexwe rola rêberê li ser bawerîya gerdûnî rewa ye.

Qiyamet bidawîbûna dinyayê ranagihîne

Bi vî halî tu tişt mirovî matmayî nahêle ku **Girard** xwedîyê ramaneke eskatolojî (axîretzanî) ya dîrokê bûye: *"Qiyamet bidawîbûna dinyayê ranagihîne; hêvîyekê dihewîne. Kî ji nişka ve dibîne ku rastî ne di nav bêhêvîtîya teqez a nûjen ku li ser nayê fikirîn e, lê cîhaneke dibîne ku her tişt di nav de bi wate ye."* (5) Bûyera ku pesnê bêalîtîya zanistîyê dide, belkî zêde mirovî matmayî dihêle. (6) Bi her halî, qezencên sembolîk ên di her rewşê de ji hêla teorîyên xwe ve têne hilberandin, bi ti awayî bêalî nînin.

Lewre ew ne tenê wekî teza ku dibêje bawerîyên ferdî û nirxên exlaqî li gor çanda ew tê de pêk hatine nisbî ne, betal bike dixuye, lê belê ew destekê dide nesiyasîkirina cîhanê. Bi rastî di vê ramana "xwezayî" ya şidetê de tu tişt destûrê nade em li biwara polîtîk a şertên me yên mirovî bifikirin.

Ev valahîya ku berhema xwe beş bi beş derbas dike, pêwendî nebûna elaqeya ji bo cot bûyera qethî ya dîroka me ye: Zayîna felsefeyê û keşfa polîtîkayê. Gelo mirov dikare bi wan re di kevîya domdarîya ayînên qurbanî de wekî epîfenomenên xwerû muamele bike? *"Ji ber ku me dînê bi felsefeyê fêm nekir, divê mirov rêbazê berevajî bike û di ronîya dînî de felsefeyê bixwîne."* (7) Ev yek jî destûrê dide wî îdîa bike ku *"mirov di hevrikîyên ku wan tîne hember hev de serhişkîyê dikin, çanda wan a sembolîk bêguman ji peymana civakî ya pir medenî ku ji alîyê teorîsyenên sedsala XVIIIê ve hatine tesewir kirin, peyda nebûye..."* (8) Tevahîya referansa têgînî ya li ser pirsa demokrasîyê jî di berhema **Girard**î de bi tunebûna xwe, xwe dide der û beloq e. Ew wekî qebûla azad a bêpergalîyê tê sêwirandin ku dest bi adeteke din û cureyeke mimkun a ramanê dike ku çandê pêk tîne. Redkirina bilêvkirin û heta xistina ber lêpirsînê –bi awayekî cihê ji kirina gunehê pêşî- ya şertên jîyana civakî bi xwe, bixurtî girêdanên îdeolojîk ên ceribandinên "**Girard**"î nîşan dide. Berê me careke din kete alîyê wê mijara pîroz a daxwazê, bi vî awayî em bi ber bayê awayên demî yên meyil û fikrên amade nakevin.

1 René Pommier, *René Girard, un allumé qui se prend pour un phare (René Girard, derbikeke ku xwe weke farekê dibîne)*, Kimé, Parîs, 2010

2 Michel Serres, Li Akademîya Frensî Bersiva Gotara Peywirdarkirinê ya René Girardî, 15 Berfanbar 2005

3 René Girard, *Mensonge romantique et vérité romanesque* (Derewa Romantîk û Rastîya Romanesk), Hachette (Pluriel), Parîs, 1999

4 *Des choses cachées depuis la fondation du monde* (Ji avakirina cîhanê û vir de tiştên veşartî), Livre de Poche (Biblio essais), Parîs, 1983

5 *Achever Clausewitz* (Qedandina Clausewitzî), Carnets Nord, Parîs, 2007

6 *Sanglantes Origines* (Rehên Bi Xwîn), Flammarion (GF), Parîs, 2011

7 Ji avakirina cîhanê û vir de tiştên veşartî, berhema li jor behsa wê hatî kirin

8 Rehên Bi Xwîn, berhema li jor behsa wê hatî kirin

Wergera ji fransî: Sevda Orak

ÇAND Û HUNER

NAPOLYON & SELAHEDDÎN

KEJO BAJÂR



Dibe ku mirov navê Osman Sebrî li ser pirtûkeke weha dirokî bibîne û mirov lê ecêbmayî bimîne. Ji ber ku Osman Sebrî bêtir weke helbestkar, şervan û nivîskar tê nasîn. Lê heke mirov li kovara *Ronahîyê* binêre, mirov ê bibîne ku weke rêzenivîsên jînenîgarîyê li ser **Napolyon** û **Siltan Selaheddîn** nivîsiye. Ev rêzenivîs ji alîyê weşanxaneya ***Belkî***yê ve weke pirtûk hate çap kirin.

Di jîyana herkesê ku hikmê xwe li dîroka dinyê kiriye de tiştekî dişibe mûcizeyan xwe der dide. Bi taybetî jî mûcîze di destpêka jîyana wan de xwe nîşan dide. Weke mînak berî bûyîna Selaheddîn mamê wî **Şêrguh-Şêrko** *(baş bala xwe bidin vî navî: Şêrgûh di wateya şêrê koyê (çîya) de ye ku ev tê wateya şêrê çîyan, ev tenê delîlekî etîmolojîk e ku kurdbûna Selaheddîn dipeyitîne)* li keleha ***Tikrîtê*** zabîtekî dikuje û li ser vê yekê Micahededîn Beyrûz, Necmeddin Eyûb tevî birayê Şêrguh ji kelehê derdixîne û wan cêlî dike." Selaheddînê yekrojî di rê de her digirî. Lewre bavê wî gelekî jê aciz dibe. Heya carekê dixwaze wî bikuje da ko jê bifilite. Lê peyayê wî yê ko bi navê Katibê Nesranî hatiye nasîn û heya Baelbek, Şam û Misrê bi malbatê re çûye, nahêle û dibêje: *"Bihêle heya ko xwedê wî bike mirovekî mezin. Ew biçûk û bêguneh e, ma çi dizane ko tu derdemend bûyî."* Ev girî wê bibê nîşaneya Siltanbûn û mirovbûna Selahaddîn. Ji ber ku em ê vî girîyê Siltanê Kurd di deqên Amîn Maoluf de jî bibînin. Amîn Maoluf wê di pirtûka xwe ya bi navê ***"Bi Çavên Rojhilatîyan Seferên Xaçperest"*** de bibêje:*"Her ku Selaheddîn bajarek fetih dikir, digirîya."*

Di çepresta din de nîşaneya mûcizeya Napolyon derdikeve. Gava bavê Napolyon **Karlo Bonapart** dimire, jina wî **Lêtsiya** ji bo debara zarokên xwe, xwe dispêre tîyê xwe **Lûsyan**. Lê pir wext tê naçe ku tîyê wê Lûsyan jî dimire. Napolyon li sirgûnê li ser vê rewşê weha dinivîsîne:*"Mamê min î li ser nivîna mirinê û li ber hilma dawîyê bû ko gazî me kir. Em xuşk û bira, tevî diya xwe li dor nivîna wî rûniştin. Piştî ko dua ji me re kirin, ji birayê min **Josef** re gote tu mezintir û bîrbirê birayên xwe yî; lê divê ji bîr nekî ku Napolyon serekê malê ye."* **Napolyon Bonapart** ne ku wê bibe serokê malê bi tenê, ew ê bibe yê hemû Ewropayê.

Dibe ku Osman Sebrî di şer (ku ew tevî şerê Şêx Seîd û yê Agirîyê bûye) de têk çûbe û xwestibe şikestina dilê xwe bi van lehengan bicebirîne. Lê ev rêzenivîsên bîyografîk wê derfetê bidin me ku em siltanekî rojhilatî û împeretorekî rojavayî bidin ber hev. Erê Napolyon çûye dibistanên herbê, lê Selahaddîn jî li ber destên edîban mezin bûye, hînî Quran û ilmê bûye. Napolyon planên xwe yên şer li dibistanan bi çêkirina kelehên ji berfê ava kirine. Lê Selaheddîn jî di nava şer de, li tengala apê xwe Şêrguh hînî şer bûye. Di bûyerên mezin de miqayesekirina her du lehengan hêsan e, lê çawa ku dor tê ser hûrgilîyên jîyanê dîroknûsên rojhilatî, ereb û kurd Selahaddîn sêwî dihêlin. Ser meselê em dizanin ku rojnivîskek Napolyon heye, lê Selaheddîn sêwî dimîne, em dizanin ku rojekê Napolyon ji birçînan saeta xwe firotiye, lê Selahedîn sêwî dimîne, em dizanin ku di şerê Tûlonê de du sê hesp di bin Napolyon de mirine û dîsa şer domandiye, lê Selaheddîn sêwî dimîne. Em dizanin ku Napolyon bi nexweşîya kêmxwînîyê (anemî) ketiye, lê Selaheddîn sêwî dimîne.

Osman Sebrî nexwetiye kurdekî li hember xaçperestan şer kiriye û çûye heya di Qudsê re derketiye sêwî bihêle. Divê kurd li Selaheddînê kurd xwedî derkevin.

Navê Pirtûkê: Napolyon & Selaheddîn
Nivîskar: Osman Sebrî
Weşanxane: Belkî
Çeşn: Dîrok
Amadekar: Rênas Jiyan
Buha: 10 TL
ISBN:978-605-62114-1-6

"Nara" ya Mehmet Dîcle

SALIHÊ KEVIRBIRÎ

Otorîteyên edebiyatê, xasma yên di warê kurteçîrokên modern de şareza ne, dîyar dikin ku ji bo dîtina mijarên baş, pêdivî bi çavdêrîyeke baş heye. Li gor van "gurên edebiyatê", parîyeke fikir û ponijîna li ser tiştên ji hêla herkesî ve têne dîtin, ji bo afirandina kurteçîrokeke "qewîn" bes e û zêde ye jî. **Mehmet Dîcle** jî bi berhema xwe ya bi navê ***Nara***yê, bi me dide selmandin ku ew çavdêrekî baş e. Bi heşt kurteçîrokên di berhema xwe de, bi hostatîyeke edebî, kitekitên kurteçîrokan tevî heyecan û balkişandinê, pêşkêşî dêhn û bala me dike.

Mehmet Dîcle, ji *Leylan*ê bigire heta *Nara*yê, *Havîna Evînê*, *Çivîkên Şîn* û *Serkîsof*, *Agirê Zuleyxayê*, *Kuça Filan*, *Şekirê Eydê û Beysûs*, di tevahîya çîrokên xwe de jî çavdêrîyên navxweyî û derveyî sûdê werdigire, baldarîyeke mezin dide teswîrên cih, dem û kesayetîyan. **Dîcle**, bi şarezayî xwendevan amadeyî encama kurteçîrokê dike. Lê belê dîsa jî gelek caran çîrok bi awayê ku xwendevan ne li bendê ye diqede. Dîyar e ji surprîzan hez dike. Di *Çivîkên Şîn û Serkîsof* û *Beysûs* de, encamên wisa derdikevin holê ku piştî qedandina xwendinê bi maweyeke dirêj jî, pirs xwe ji serê xwînerên kurteçîrokan nadin alî. Tevî ku dawî li bûyerê jî hatiye, xwendevan difikire bê çi bi serê kesayetî û lehengên kurteçîrokê de hatiye.

Şayanê gotinê ye ku nivîskar di serpêhatî û kurteçîrokên xwe de bi tu awayî xwe dubare nake. Destpêka her kurteçîrokê ji hev cuda ye. Carinan bi teswîra cih/dever, carinan bi nasandina lehengan, carinan jî bi têkilîyên di navbera kesan de dest bi hevokên xwe kiriye. **Mehmet Dîcle**, tevahîya kitêbê dîyarî gorbihuşt **Mehmed Uzun**; çîroka ***Nara***yê jî ku navê xwe daye kitêbê, dîyarî şahê dengbêjan **Şakiro** kirîye. Dîcle, di kurteçîroka ***Leylan***ê de behsa *Pîra Hacerê* dike ku av û hewayê axa li ser dijî, bûye mar û dûpişk, bi dûv zarokên wê ketiye, ew li çar alîyên dinyayê belav kirine, bi ser de jî ew der ewqas bi wan şîrîn kirîye. Pîra ku bi salan li dûv mirina mêrê xwe jî pê dipesine: *"Dewran e! Dema ku Hecî Resûl ji Çîn û Maçînê fincanên ferfûrî didan anîn, di tasên elemîyonan de şerbeta sar bi destê xelkê nediket. Çi bikim!"*

Nara, serpêhatîya *Naraya Qîza Bavfileh, Arifê Dengbêj û Kejoyê Berxê Mala Kolos*, bi vegotin û kurmancîyeke gewr a dengbêjên bav û bapîran di hinav û mejîyê me de dide neqişandin. Ew *Nara*ya ku hîn hivdeh salî bû gava cara pêşîn dengê **Arifê Dengbêj** bihîstibû. ***Nara***ya bedew, bedeweke kafirbav. Ji dê û pîrên xwe ve, xwedîya çil û çar keziyan. Bedeweke kihêl, çaqên dirêj û zirav, navqendîl, qorikpehn, memikbiçûk, stûdirêj.

Arifê Dengbêj, di bîst û çar salîya xwe de nav û dengê wî li seranserê welêt belav bûye. Hevaldostê **Xelîl Beg**. Her ku bi Xelîl Beg re diçe, kilamên nû tîne ku bi wan dibihîse. Kilamên nû li hev tîne. Çawa ku ji bilbilan miqam hil dike, wisa jî deng dide baranê. Dengê wî di qala şeran de, bayê sibatê ye. Ew bayê ku li *Dîyartopanê* guran diqefilîne, dibe rêbirê karwanên qaçaxçîyan. Ew ***Arifê*** ku di kilamên wî de, mêrkuj û qesasên gelek serîyan, didan ser milan, mîratên modolî û eynelîyan û bêhn diçikandin di kozikan de sê şev û sê rojan. Gotinên wî dibûn dendikên li ser sêlan, li ser sêlan yek bi yek diteqiyan. Bi hevokên wî, di pêsîrtengîyan de, li eywana mîr dibû vingîna guleyan, şingîna şûran, kehîna hespan, nalenala mêrxasan.

Herçî **Kejoyê Berxê Mala Kolos** e, gava derketiye serê çîyan, hivdeh salî ye. Mehkûmê sê eşîr û çar dewletan. Lingek li ser xetê, yek li binî. Piştî kuştina bavê û du apan, ew jî ji eşîra **Mala Mihê** çar bira û du pismaman dikuje. Terkeserîya çîyan, dostanîya mîran, neyartîya began dibe nav û nasnavê wî. Zabitek jî li *Gelîyê Qulpê* qelibandibû ji ser pişta hespê, jina wî bî, hespê wî bê xwedî hiştibû.

Arif, hem li ser ***Nara***yê, *"Porê reş dirêj, şeva tarîya zilûmat e/ dixapîne egîd û mêrxasan / çavên kesk, cota bîrên dev bikevz in / ên xwe bibîne di wan de / namîne hiş û aqil di serî de / bêhna singa te gerdengazê, awirbazê / bayê sibê ye, tê ji bihuştê..."* Hem jî li ser **Kejo** kilam çêkirine; *"Mehkûmo hivdeh salîyo / qesasê serê çardeh mêrano / diya Kejo dibê serê min bi qurbano / bejindirêjo, navmilpehno / çûçika belayê daniye vê sibê / li ser taya simbêlên sor ên kejê mino / berxê min îro nanê xwe hûr kiriye / bi xwîna bavê de / de lêxe kejê min, de lêxe / şîrê diya te îro li te xweş helal e..."*

Dîyarîya Kejo, bi darê zorê revandina Narayê ye. Ew revan-dina ku dibe sedema lalbûna **Arifê Dengbêj**. Ew dengbêjê ku bi destê xwe zimanê xwe jê kiribû! Encam? **Nara** ji **Kejo** re nebû jin, nebû xwişk, nebû dê, nebû qîz. Lê qesasê serê çardeh mêran, nehiştibû ku ew careke din bibe jina Arif jî...

Li gor **Mehmet Dîcle**, çîroka Narayê dilbijandin e. Dilbijandina bi navgînîya kilamên dengbêjan. Her wiha bersivek e jî. Bersiva pirsa; *"Gelo di avakirina çîroka nûjen de mirov dikare çiqas sûd ji wêjeya devkî werbigire?"* Nara jê re bûye bersiva pirsê û wî jî qîma xwe pê anîye. Wî xwestiye bêhna gotinên dengbêjekî ji gotinên wî werin. Herwiha merema wî bi vê çîrokê ew bûye ku avakirina hevokan, hêmayan û honandinan bajo ser çîroka nûjen da ku têkilî hev bibin. Camêr bi ser jî ketiye.

Nara, Efsaneya Çîyayê Agirî ya **Yaşar Kemal**; ***Agirê Zuleyxayê***, mîna serpêhatî û vegotineke **Azîz Nesîn**, dergehê cîhanên edebiyateke qerase ji me re vedikin. ***Havîna Evînê***, li hêlekê evîna keçeke nûbalixbûyî ya pak û veşarî ji me re vedibêje, li hêla din bi me dide nîşan dan bê kesê jê hez dike, di şevên nixamtî de çawa dikeve paşila dayîka wê.

Di ***Çivîkên Şîn*** û ***Serkîsof*** de, vebêj ji riyeke dirêj, ji demeke bîyanî, ji bêrîkirinên dirêj û sar ber bi malê ve tê. Hemû kesên li riya dûr in, çavên wan li vegerê ne. Dûrî bixwe trajedî ye. Herçî veger e, tevî ku şahî ye, bi xemgînîyeke tenik jî hatiye pêçan. Refên çivîkên şîn, rêwîtîya otobosê. Şoferê ku dibêje; *"Bê Şivan şev naçe!"* Saeta li destan. Serkîsof. Piştî ku bavê wî, ji karê şeftrênîyê teqawid bibû, dabûnê. Bav jî dîyarîyê wî kiribû. Li ser çarê sibê sekinîbû, cama wê jî derizîbû. Bi dehan vegotin, dîyarde û xeyalên di rêwîtîya ber bi malê ve. Va ye li malê bû. Li hewşa wan mirîyek hebû. Ne dê bû, ne bav bû, ne xwişk û bira bû yê mirî. Lê cama saeta Serkîsofa di destê mirî de, derizîbû, saet li ser çaran sekinîbû...

Dîcle, hêmaya rengan baş zeft kirîye. Ev hêma di hibra wî de nafetise û naxeniqe. Beloq xuya nake. Bêyî ku xerab bike bi rengan dilize. Li gor wî carcaran *"hêmayek dikeve dewsa çend rûpel nivîsê"* û berdewam dike*: "Dema ku tu bi dilsozî li çavekî kesk binêrî, wê berf kesk bibare! Her hêsrek ku ji çavekî şîn dikeve, li erdê dibe termê çivîkekî şîn. Tenê divê mirov bibîne. Jîyan ji rengan pêk tê."*

Ji bo ku hûn di çîroka ***Şekirê Eydê*** de, êvareke eydê li *Emînonuya Stenbolê* di bin baranê de bibin guhdar û çavdêrê **Yaşo** û di çîroka ***Beysûsê*** de jî bibin mêvanê qesir û dîwana **Behram Begê** Mîrê dawî yê Asûsê û Mehbûbe Xanima jina wî ku tenê zarokek jî nedabû wî, lê jin jî nehatibû ser, di zûtirîn demî de divê ***Nara*** li ber destên we be.

Hevoksazîyên dirêj ên ku carcaran xwendevan diêşîne û nexasim gelek caran nebika-ranîna tewangan, biçûk be jî kêmasîyên berhemê ne. Bo nimûne, li tu deverê, ***Nara*** nehatîye tewandin.

Nivîskar berê jî bi navê ***Asûs*** berhemek dîyarî me kiribû. Ew dibêje; *"Asûs ji ber ku destpêk bû bêtir naşî ango ecemî xuya dikir, dema ku ez ber bi Narayê ve hatim, li gor min gotin piçek din kedî bû."*

Mehmet Dîcle di sala 1977ê de li Hezroya Dîyarbekirê hatiye dinyayê. Ji Beşê Erdnîgarîyê yê Zanîngeha Stenbolê mezûn bûye. Li Stenbolê dijî.

Weşanxaneya ***Avesta***yê di berga dawî ya kitêbê de li ser nivîskarê ***Nara***yê wiha dibêje: *"Mehmet Dicle, ji gotina kilamekê dastaneke nûdem çêdike. Hay ji vî navî hebin. Stêrkeke geş li asîmanê Kurdistanê, li edebiyata kurdî zêde dibe!.."*

Nara, Mehmet Dîcle,
Weşanxaneya Avesta,
Kurdî,
104 Rûpel

Çend dîmenên welatekî bextewar

JAN BADA

Dîmenên welatan gelek beş in; dîrokî ne, xwezayî-xweşikayî ne, dîmenên mirovan (jin-mêr-zarok) hene. Dîmenên dîtbar lê yên nedîtbar jî hene; nedîtbar bi giranî afirandina çand, ziman, raman; rewş û tevlivîna kevneşopî, helwest û perwerde, rêwişt û giyan. Dîmen bi rengdêrên erênî lê bi yên nerênî jî dîmen in, mîna hejarî-dewlemendî, xemgînî-dilşahî, mirin-jiyan, ken û girîn ûwd.

Em dixwazin li vê derê pêşangeha çend dîmenên dîrokî û xweşikayî rave bikin. Gava xweşikayî tê gotin gelek dîmenên cuda tên serê mirov, fantazî derdikeve pêş û raman dikare bê dawî dîmenan biafirîne; em xwe bi çend wêneyên xweşik bi sînor dikin. Wêneyên av û xweza, hêşinahî û giranî didin dîmenên dîrokî.

Dîroka Kurdistanê dîsa gelek beş û awayên jiyanê tîne bîra mirov. Li Kurdistanê dîmenên dîrokî nexşeyeke çand û gelan e: ermenî, asûrî-suryanî-kildanî, ereb, faris, tirk, tirkmen, yûnan, kurd ûwd. Ev gel bi rengên xwe yên dîn, ziman, raman, dîrok û giyan erdnîgarîya Kurdistanê dinexşînin. Erênî û nerênî di nexşeya gelan de jî heye. Hin civakên ji van gelan gava derfet ketine destên wan, rê nedane yên din û xwastine ku hin gelan ji holê rakin yan jî bixin bin desthilatîya xwe û dewlemendîyên wan jî, ji xwe re bigirin. Lê emê li vê derê behsa van dîmenên nerênî nekin.

Dîmenên dîrokî yên li Kurdistanê nexşeya çanda gelan diyar dikin. Li tenişta Kurdan gelek gelên din jî avahîyên xweşik afirandine ku em dikarin îro bi heyranî ew biecibînin. Ji alîyê avadanî di demên berê de ku teknîka alîkar ne wek îro pêşketî bû mîmarîya wan, ji alîyê afrandêrîya hunerî fantazîya wan, ji alîyê raman xemilandina bi mantiq, ji alîyê mayîna wan zexmîya wan hin beşên ecibandina dema me ne.

Ji pireha Malabadî, Cendere heta pireha dehderî ku gelek av ji bin û gelek kes ji ser wan derbas bûne, lê ji çelengîya xwe tiştek winda nekirine. Şerê hawirdora wan jî nebûye sedema bê aramîya wan. Bi heman awayî Seraya Îshak Paşa û Peykerên Nemrûdê li Kexteya Semsûrê. Seraya Îshak Paşa bi şanazî li çiyayê Agirîyê temaşe dike û roj û ciwanîyên dîroka dema berê dadiwerîne. Peykerên Nemrûd şanî me didin ku jiyana mirovan, desthilatîyên wan çiqas zû derbas dibin, lê kirinên wan ên çê-xirab dimînin. Ji Dêra Zahferan heta Gola Masîyan hevjiyana aştîyane ya dîn û ayînên li Kurdistanê radixîne ber çavan; mirov herçiqas sedeman zanibe jî, dîsa ji xwe carna dipirse, gelo ev rewşa îro çima wisa ye!

Axtamar gola Wanê û gola Wanê Axtamarê dixemilîne. Bermayîyên Birca Belek, Zanîngeha Heranê, Keleha Xarpêtê dem û bîranînên berê di fantazîya mirov de diberiqînin. Lê Heskîf, lê Sûrên Amedê…

Em li vê derê tenê çend wêneyan ji deryaya bermayîyên dîroka Kurdistanê û çend dîmenan ji xwezaya wê pêşeçav dikin. Em dîmenan bi beşekî biçûk ê Kurdistanê bi sînor dikin; nikarin wê deryaya mezin bi rûpelekê nêzîkê We bikin.

Li hember her zehmetî û zordestîyê welatê Kurdistan dîsa jî bextewar e, mirovên li Kurdistanê jiyane û dijîn, hertim bi xweşikayîya xwezaya wê serbilind bûne hîn jî wisa ne. Çiyayên berz, newalên kûr, çemên ji dîroka hezaran sal herikî, nişteciyên dilgerm û dilên azad, ev e welatê bextewar.

Hunera ku dîrokek afirandîye, dikare berhemên siberojê jî bixemilîne. Hêvîya hebûna siberojê di dîroka mirovan de hunandîye, mirov dikarin bi hêvîyên xwe siberojê biafirînin û bixemilînin. Hebûn û xwedîbûn dikarin nifşên nû bijînin, lê ew bi tena serê xwe têrî bextewariya welatekî nakin, bextewarî di aramîya rûmetê de veşartî ye. Rûmeta nirxdarîya xwe û ya dervayê xwe, nirxdarîya dîroka xwe û ya dervayê xwe, nirxdariya raman, jiyan û azadîya xwe û ya dervayê xwe. Dîmenên welatekî bextewar li ser vê bingehê xurt derdikevin holê.

Jîyan bi kurdî xweş e!

Sûrên Amedê


Kela Xarpûtê

Antiochos û Herakles

Pira Malabadê


Kela Rihayê

Dêra Axtamarê

Gola Wanê

Pira Dehderî

Qesra Îshaq Paşa

Pira Gendere

Kela Xoşapê

Zanîngeha Heranê

Xirabeyên Nemrûd

Heskîf

Gola Masîyan

Kevnemalên Heranê


Birca Belek

NAVEROK
ÎLON 2011

Vegera dema bihurî
BIRGIT CERHA
R. 1

Di bin sîya çekan de li aştîyê gerîn
KURTULUŞ TAYIZ
R. 1

Li mirêkan bifikirin
XAVIER MONTHÉARD
R. 2

JI ÇAPEMENÎYÊ
R. 2

Piştî şoreşan, taybetîkirin?
AKRAM BELKAÏD
R. 5

Gava ku leşker qanûna bêdengîyê dişkînin
MERON RAPOPORT
R. 6

Îsraîl xwe vedikişîne pişt mertalekî dij-fuzeyan
LAURENT CHECOLA Û EDOUARD PFLIMLIN
R. 7

Li welatê sermayedarîya reel
TONY WOOD
R. 8

Lêgerîna li polîteîzman
MARCEL DETIENNE
R. 9

Kubayî bi vî awayî dijîn
RENAUD LAMBERT
R. 10

Berî pêncî salan, Tengava Berazan
HERNANDO CALVO OSPINA
R. 11

Lêgerîna kurdan ji bo stratejîyeke nû
CHRISTIANE MORE
R. 12

Laneta Melkesê
FRANÇOIS-XAVIER DEVETTER
Û FRANÇOIS HORN
R. 14

Pîşe, xizmeta nava malê
JULIEN BRYGO
R. 16

"Sendîkayîkirina xizmetkarên nava malê, karekî pir hesas"
PIERRE SOUCHON
R. 18

Nedîtîyên bêdawî
GENEVIÈVE FRAISSE
R. 19

Masîgirîya di bin zêrevanîya paramîlîteran de
EDOUARD SILL
R. 20

Pesindana zelûlîyê
GÉRARD MORDILLAT
R. 21

Demokrasîya Taloqkirî?
ANDRÉ BELLON
R. 21

Serfkarê dixebite
LAURENT CORDONNIER
R. 22

Zilamê fikreke bitenê
CHRISTOPHE BACONIN
R. 22

ÇAND Û HUNER
R. 23

Forma Abonetiyê

Nav:
Name

Navnîşan:
Address

Koda Postayê:
Postcode

Bajar:
City

Telefon:

E-Mail:

Abonetiya salane (12 hejmar!)

☐ Almanya (50 €) ☐ Derveyî Almanyayê (60 €)

☐ Abonetiya dîjîtal (20 €)

Independent Kurdish Media Group GmbH (IKMG)
Carnotstr. 4 - D-10587 Berlin

Berliner Volksbank - Hesab/Account/Konto: 2284 1230 10 - BLZ: 100 900 00
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 10 - BIC/SWIFT: BEVODEBB